



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Hejmar - 26
Gulan - Pûşper 2009

Xwedî û Bepirsîyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtor

Azad ZAL - Elixan LORAN

Sererstakirin

Semra OZBEY - Serwet DENİZ

Mizanpaj û Berg

Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Wêneyê Berga Pêşîn

Berga pirtûka "Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda" (Rêziman û ferhenga zimanê kurdî) ya Maurizio GARZONI (1787)

Şewirmendê Hiqûqê

M. Nuri DENİZ

Çapxane

Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan

Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR

Tîf

(0412) 237 43 16

E-Mail

kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB

www.kovaraw.com

Şertên Abonetiyê

Nava Welat, salek: 25 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesab

Semra OZBEY
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir
YTL: 8300 195 27 89
EURO: 8300 071 16 47
USD: 8300 071 16 52

Nimroya Hesabê PTT'ê

Semra Ozbey - 5426215

■ *Nivîsên ku ji bo weşanê
ji kovarê re tên şandin,
li xwediyên wan nayên
vegerandin.*

■ *Her nivîskar ji nivîsa
xwe bepirsîyar e.*

- Ji edîtor / 2
- Rêka dibistanê - **Brahîm RONÎZER** / 3
- Tu ku de diçî - **Mehmet DEVÎREN** / 6
- Rojên derew - **Yûsiv BIYANÎ** / 6
- Gîrrê zilamtiyê - **Lokman AYEBE** / 7
- Guldesteyek helbest - **Reyhan SARHAN** / 10
- Carinan mirov xwe jî dîkuje - **Şener OZMEN** / 11
- Strî û gul - **Dilşêr BÊWAR** / 18
- Veqetîn - **Baxdat ARDA** / 18
- Ji min re bibêjin Îsmail - **Yavuz EKÎNCÎ** / 19
- Êdî bêhna te tê - **Nesrîn NAVDAR** / 22
- Goristana hêsrên rizyayî - **Îrfan AMÎDA** / 23
- Xwircezîna dil - **Fatma SAVCI** / 24
- Tazî - **Şevger ÇIYA** / 25
- Dosye: Kurdolojî; çi, çima, çawa? - **Serwet DENÎZ** - **Elixan LORAN** / 32
- Kurtebehseke pêşketina kurdnasiyê (1988-2008) - **Rohat ALAKOM** / 33
- Daxwaza kurdan perwerdehî ye ne kurdolojî ye - **Samî TAN** / 41
- Efrasyab Hewramî: Kurdnasên Sovyetê li pey berjewendiyên dewleta xwe bûne
Hevpeyvîn: Azad ZAL - Serwet DENÎZ / 43
- Lêkolînên kurdolojiyê li Fransayê - **Salih AKIN** / 51
- Kurdolojî: Zanista hesta netewî - **Mihemed RONAHÎ** / 57
- Di romana kurdî de pêngaveke pîrhêl: Rojnivîska Spînoza - **Yapob TILERMENÎ** / 60
- Rênas Jiyan: Helbest derb e - **Hevpeyvîn: Elixan LORAN** / 64
- Portre - **Fewzî BÎLGE** / 73
- Ji William Shakespeare çend sone - **Kawa NEMIR** / 72
- Di neynika pirtûkê de - **Yunus EROGLU** / 78
- Cîvîna Wyê bi xwendevanan re - / 80

Ji edîtor

Xwendevanên hêja û delal,

Çawa ku tê "gotin" jî "berê gotin hebû", belê ev gotin rast e û qet şik û guman tê de tune ye. Lê em îro nexşeya ruhê xwe û alavên derbirînê, metaforên zanapeyî, hêmayên rênîşander bidin ber hev, em ê lê varqilin ku gotin asta pêşîn û rewşa nanozikoyî ye. Çawa ku îro bo jimartinê tiliyên destên me reben û sêwî dimînin, em dikarin danberheveke ku paralelî vê mînakê bidin ku êdî gotin têra derbirîna me û vê cîhana şêt, qure, borbore, gewî, têrxwarî, zamorte û zalim nake.

Bi vê niyetkirinê em dikarin bibêjin ku wêje (nemaze jî çîrok û roman) ne gotin e, vegotin e. Ji ber ku gotin di vîr de ragihandin û neqilkirinê bi bîra me dixe lê vegotin bi gotinê qanîh nabe û hewl dide ku rêyeke nû ji xwe re bibîne. Ji ber ku qîma xwe bi tiştên heyî nayne hêjayî pesindanê ye û mirov dikare bibêje ku şoreşger e jî. Wêje vegotin e û em dikarin piçekî din jî pêş de herin û bibêjin ku "çep" tirîn û "pozilind" tirîn awayê vegotinê ye.

Gotin dikare di otobosê de li ber camê rûnê û çî tiştên ku dibîne ragihîne me. Lê vegotin dikare awayê rûniştina rêwiyan, profîla rêwiyan, bêhna ku ji rêwiyan difûre, çavên sorbûyî, mijê ku di çavên wan de kon vedaye, mitaleyên wan ên koç û rêwîtiyê û hwd. ya ji neynika hundir a otobosê dixuye de ji me re bibêje.

Gotin rîs be, vegotin tevî û dolab e. Gotin daringa xav be, vegotin fabrîqe ye. Gotin simbil bin, vegotin dêrandin e.

Ji ber ku di çîrokên ku ji me re tên de gotin li ser vegotinê tê girtin û ev jî ji bo wêjeya kurdî elem û kelem e, me xwe avêt dextlê daxuyaniyên li jor.

Di vê hejmara me de Kawar Nemir, birek soniyên William Shakespeare wergerandîye kurdî, serê lodê girtiye û eşkere kiriye ku bergîdana van helbestan bi kurdî jî hene! Me di vê hejmarê de hevpeyînek bi Rênas Jiyan re kir û gelek fikr û bîr û boçûnên balkêş derketin holê.

Di vê hejmarê de me mijara dosyeya xwe wek kurdolojî diyar kir. Tevî ku ne li gor konseptê me bû jî ji ber ku mijar aktuel bû û dihat nîqaşkirin û zelaliyek jê re pêwîst bû me girt dest. Em hêvîdar in wê dosyeya me sêdewar be.

Dîsa kurdan qûna dîlnexwazên xwe dan tavê û 98 (nod û heşt) şaredariyên qut û gilover bi dest xistin. Vê hîlbijartina 29ê adarê bi me dide hîskirin ku kurd mîna pêlan êdî didine ber xwe. Her çiqas piştî encamên hîlbijartinê êrîş birine ser DTP'ê jî em dizanin ku ev êrîşkar çawa har bûn wê wisa sar jî bibin. Heke ku serdest û êrîşkar "dîn" bin divê zanibin ku em kurd "perçe perçe" ne. "Ew" serdest in û divê baş bizanibin ku em -Kovara W- ji roja roj de li ser destnimêja xwe ne û bi alav, derfet û platformên afirandinê ku bi giştî mebesta me jê huner e em ê "bavê serdestan bînin ber çavên wan."

Û tekane rojnameya rojane ya bi kurdî Azadiya Welat bi sedemên vala ji aliyê dewletê ve hat girtin. Ev ne bes bû rabûn rojnameya rojane ya bi kurdî Rojev jî bi sedemên pûç û vala girtin. Di van wextên ku dewletê agir xistiye dawî xwe em zilm û zordariya li ser rojnameya Azadiya Welat û kurdî şermazar dikin.

Em dixwazin agahiyekê jî bidin xwendevanên xwe. Edîtorê me Enîse Şîrîn ÇAGER jî ber rewşa xwe ya tenduristiyê wê êdî ne bi me re be.

Em Cejna Zimanê Kurdî, 1 Gulan Cejna Kedkaran û Roja Dayikan li hemû xwendevanên xwe pêroz dikin.

Gulan e û em deftera xwe didin ser deftera çand û wêjeya kurdî.

Rêka dibistanê

Brahîm RONÎZER

Diya min dibêje ew telebe ne. Bê ka telebe çi ne? Cilên wan ne weke yên me ne, yê hemûyan ji hev in. Tifingê wan hene. Dûrbênê wan û gelek tiştê wan ku ez navê wan nizanîm. Tu zanî, her car merheba didin min jî û ji min re “heval” dibêjin,

Ji nîfşê ku ji jarê û waweyleya wan re şahidek û pênûsek divê, ji zarokên bê gund û bê ziman re.

Elîko, xwe di nav nivînan de cewciqand vî aliyî wî aliyî, destê wî li sobeya sincirî ket, hilçenî, ji xew şiyar bû. Di şibakeya nizm re li derve nihêrî, dinya ronî bûbû. Li destê xwe mêzand, pif kirê, careke din li derve mêzand, hêdî hêdî bi medekî tîrş rabû ser xwe, şewişî, bi kotek devê derî dît. Derket der, li hewşê, di ber qurmê tuyê de mîz kir. Vegeriya, li ser sêlingê dest û rûyê xwe bi misînê şîn şûştin. Pê hisiya ku dîsa pirzika di bin çengê wî de bi fanoriyê wî yê binî ve girtiye. Piço piço fanorî şil kir. Bi dîlxlênêkî fanorî kişand. Bi fanorî re qemûşka pirzikê jî rabû, edabê tê re avêt. Li derve cemidîbû, edab paqij kir û zûka çû hundir. Li ber sobeya germ rûnişt. Dayikê beroşa şorbenîskê danîbû ser sobê, ji kurik re tasikeke nîska ku hê danê xwe bernedayî tijî kir, li ser naylona sobê li ber kurik danî. Di ber diya xwe re kurik cilên mektebê li xwe dikirin, pê re jî ji diya xwe pirsî:

- Dayê kanê mêvanên me? Dayê ew kî bûn? Çima bi roj nayên, ma mala wan nîn e, her car tîn? Dayê ma bavê min çû cot, qey bûye wextê cot?

Dayikê bi dengêkî nizm û hinekî bi kerb ji

kurê xwe re got ku karekî bavê wî yî girîng derketiye û çûye bajêr. Her wiha diviyabû wî behsa mêvanên wan ji kesî re nekira. Heke xelk pê bihesê ku mêvanên wan ên xwedî tifing tîn û diçin, ku hinekên din pê bihesin wê cin û pîrebok jî pê bihesin û heke ew pê bihesin dê mala wan bişewitînin.

Kurik devê xwe ji şorbenîskê paqij kir, çentê xwe da piştê xwe û deriyê darîn li dû xwe dada. Di rêya yekere ya gund de ber bi bajêr meşiya. Gava gihîşt wî serê gund pîjîk li şibaka mala Sînemê da, wê gavê Sînemê bi lotikdan xwe li devê derî xist, hat balê. Ketin rêya axîn ku bi qasî firehbûna erebeyekê ye, di şûna tekelê tirektorê re, ji ber ku tenê şûna tekelan ne herî û teqan bû, yek di vî tekelî, yek di wî tekelî re, li ber xwe dinihêriyan û dimeşyan.

Gund li serê girikekî bû, te digot qey mirovan heyamekî ev girik ji xwe re rast kiriye û welê bi cî bûne. Li gund kaviên binerd hebûn. Xaniyên gund wekî fargonên tirênê li pey hev bûbûn ristik. Tenê di nivî de bendera gund xanî ji hev qut dikirin. Wekî din bergeha gund mizgeftê xera dikir. Mizgefta gund wekî bibêje ez ne ji we me, ez ne mala mirova me, ez mala Xwedê me, ji gund tîş, li raberî gund çikiyabû. Xaniyên gund bi eynî teşeyî hatibûn lêkirin. Avahî bi kevirên hişk, belê kevirên

enîşkan ji yên nerm û şedayî hatibûn neqandin. Aqra xaniyan bi şêwazeke kevn ya gilo-ver dihat çêkirin. Gava di avakirina xaniyan de dor dihat ser aqrê, gundiyan palûte dikirin û tepik çêdikirin bêyî ku wext tê de here aqir ava dikirin. Kevir bi xerceke xwezayî, bi nikarê dihatin lêkirin. Kolana gund a yekere û dirêj ji vî serê gund digihîşt wî seriyî. Kolana bi kevir û xîçikên xwezayî, bi bermayiyên xaniyên kufara wekî peyarêyên bajariyan ji ba û bablîsokê, baran û heriyê bê minet bû.

Tibabekî çûn, gihîştin Kurika Sorî, nivê rê, ev kurik dikeve buwara gund û nahêle bajêr bibîne. Li vir Elîko berê xwe da Sînemê û jê pirsî:

- Sînem, êvaran mêvanên we tên?

Sînemê him pirseke wilo nedipa, him jî tembiya dê û bavê wê hat bîra wê, lew bi derengî û dilwaswasî got:

- Gava xalê min î xwedî qemyon ku ji bajêr tê dimîne û xelas.

Dilê wê hebû, pir jî meraq dikir, ew kesên ku bi şev dihatin û merheba didan wê jî, pir dixwest behsa wan bike, belê xwe ragirt û weke ku hêj axaftina xwe berdewam bike, weke ku li peyveke xweştir bigere destê xwe û lêvên xwe dilebitandin. Paşê dîsa li ber xwe nihêrî.

Keçik li pêş diçû, gihîşt golikeke avê. Av zelal bûbû. Keçikê xwe daqul kir, her du keziyên xwe avêtin pişt stûyê xwe, di avê re li siya papelîska ku xwe di ser golikê re dilewli-band mēzand, dûre li xwe. Bi bîr ve çû hinekî, ji rûyê wê nedihat xwendin ka li çi dihizire. Kurik hat balê, zixurê di destê xwe de avêt nivê avê, peşk pekiyan derdorê, pê re jî keçik veciniqî, hat ser hişê xwe.

Gelek caran heta digihîştin dibistanê di keviyên rê de çavê xwe li pîvok, endeko, bilbizêk an jî kulîlkên cure cure ku navê wan nizanibûn, kulîlkên xweşik û bêhnxeş berhev dikirin. Piştî qederekê ku welê li keviyên rê çavên xwe li kulîlkan gerandin, Elîko wekî ku hew vê sirê bi xwe re bigire, an jî bibêje

hema çi dibe bila bibe. Ji xwe re digot, ma ne Sînem jî ne xelk e, ew jî weke min piçûk e û ka çawa cin û pîrebok wê bibihîzin.

Sînem tu zanî, gelek êvaran mêvanên me tên. Gelek bi hev re tên. Keçik bi wan re hene. Ew keçik te bidîtina desmalên çilo didin serê xwe. Tu caran namînin sibehê. Her ku em ji xew şiyar dibin, êdî ew çûne. Diya min dibêje ew telebe ne. Bê ka telebe çi ne? Cilên wan ne weke yên me ne, yê hemûyan ji hev in. Tifingê wan hene. Dûrbênê wan û gelek tiştê wan ku ez navê wan nizanim. Tu zanî, her car merheba didin min jî û ji min re "heval" dibêjin, weke ku gelek caran em bi hev re bi pîrkabeşonek leyîstibin. Pîrtûkên wan hene, ne mîna yên me ne, sûretê zarokan li ser wan nîn e, sûretê kûçikan, pisîkan li ser wan nîn e. Nivîsa kîtabê wan jî ne wek ên me mezin û rengî rengî ne, nivîsê wan piçûk in. Ew çawa wan pîrtûkên stûr û nivîsên wan hûr dixwînin? Radyoyeke wan hebû, weke ya we bû, vêca pir piçûk bû. Lê bi Xwedê radyoya wan ji Îbrahîm Tatlıses xweştir dikir. Ne weke ya we xeber dida radyoya wan, weke diya min, weke gundiyan, ne weke Îbrahîm Tatlıses kilam digotin, weke Miradkê Şivan ku li ber pêz li bilûrê dixê û di ber re dibêje. Ka binêre min hinek ji ber jî kir:

Zimanê kurdî zimanê me ye

Zimanê kurdî ew rewşa me ye

Zimanê kurdî hebûn...

Her wiha gihîştibûn ber derê dibistanê. Gava dîtin ku kesek li hewşa dibistanê nîn e, tēgihîştin ku dereng mane. Hinekî bi tirs berê xwe dan sinifê, dilê wan li ser hev lēdixist. Elîko li pêş, hêdîka li derî xist, sekinîn û pêjinîn. Careke din li derî xist. Nizanibûn gelo bikevin hundir an na, li benda dengê mamoste diman. Wexta Elîko li derî dixist wekî ku tiştêkî nebaş û qedexê dike, laşê wî bi ber pêleke tevzînokan diket. Bi lēxistina sêyemîn re dengêkî bilind ber bi derî ve hat: "Geel!" Ketin hundir. Elîko ber bi mamoste serê wî di ber de, li pêlava xwe ya di heriyê de mayî dinihêrî û diçû. Sînem jî li pey wî, di pişt de dix-

west xwe veşêre. Mamoste pirs kir ku çima dereng mane. Wî got ku ji gund tèn loma. Mamoste got ku ji kîjan gundî? Digel ku hê nû hatibû van deran û navê tu gundî nedinasî. Wî got ku ji Xirbihê... Mamoste du sê caran navê gund pê da dubarekirin, paşê navê gund ê tirkî pirsî. Elîko heta bersivek dida, pir difikirî, li rûyê mamoste nedinihêrî. Bi vê pirsê dawîn bédeng ma, di bin çavê xwe re li zarokên ku li ciyê xwe rûniştî û bi meraq li wan û mamoste temaşê dikirin, nihêrî. Weke ku alîkariyê hevî bike. Bi dubarekirina pirsê re Elîko got ku ew tenê vî navî dizane. Mamoste jê xwest ku navê gund ê tirkî hîn bibe û careke din ku navê gundê wan pirsî welê bibersivîne. Li gor mamoste ew der Tîrkiye bû û her kes divê navê gundê xwe bi tirkî bizanibûya. Ev tembîh, an jî zirt, gava destûr da wan ku biçin li ciyê xwe rûnên li zarokan hemûyan kir.

Îro ji wek rojên din ders zû neqediyar, dema qediyar û ji dibistanê derketin, di nav kolanên bajêr ên fetlonek û teng re zû derbas bûn û ketin ser riya gund a dirêj û têrherî, zikê wan jî xwe ne qail dikir, ji birçîna dikire qore-

qor. Piştî qasekê meşiyar û gihîştin dahmeke koncalî, şûna tekelnê erebeyan baş diyar dibû. Sînemê ji Elîko re got:



Ka dêhna xwe bide şûna van tekelnan, nasibe dewsa tekelnê tirektora mala apê te. Ka li vir binihêre, bawer ke gelek erebe çûne gund.

Elîko jî ew erê kir û bi heyecan, di coka tekelnê erebeyan re ber bi gund ve lezandin. Gava gihîştin serê Kurika Sorî, çend tirempêlên ku li dû hev li biniya gund ber bi bajêr weke mêr dikişin dîtîn. Ev tirempêl ne tirektora mala apê Elîko, ne jî qemyona xalê Sînemê yî bajarî bû, hemû tirempêl di rengekî de bûn. Hê wisa bi tirempêlan ve mijûl, tişteki din bêhtir ew şaşwaz kirin; dûxaneke tîr bi ser gund de bilind dibû.

Cin û pîrebok niqutîn dilê Elîko.

2002-Enqere

Ji WEŞANÊN BELKÎ du berhemên nû



Tu ku de diçî

Mehmet DEVÎREN

Mîna bajarê bê deng
Mîna stêrkan
Mîna deryayan kûr
Mîna gerdenê spî
Û wek babîsokê
Wek ava çeman diherikî
Ku de diherî?
Rûyê te yê şil
Mîna pêlên behrê li hev digere
Dibiriqin ew çavên te
Tu difikirî,
Diçî diçî şev û roj
Tu ku de diçî?

Ruhê min ji te re vekirî
Hêviya mîn!
Baweriya min!
Cardin wa ye hat?
Bihara bask?
Teyrên bask?
Rêwiyên bask?
Xwediyên bask?
Wek derbeke niftikê,
Tariyê diqelêşe û tê
Tu hîna difikirî
Diçî diçî şev û roj
Tu ku de diçî?

Cardin bû ximexim
Û gurmînî!
Av dilîrîne,
Kewên qefesan pê re dibêjin
Şax xwe berdidin ber govendê,
Li ser rêka te.
Û tu difikirî,
Diçî diçî şev û roj
Tu ku de diçî...

Rojên derew

Yûsiv BIYANÎ

Tîrojên rojên derew
li ser min kirine sih
hêviyên şikestî di destê min de
dibin rêwiyên biharên nû
ez xwe direvînim (ji vê 'ez'îtiyê)
em dibin rewrewkên şevê
derdora me tîrojên xapînok
em tenê şevê digerin
wek ruhên cuda, westiyayî û bêhêvî
dewsa sih û piyên pey me
derdora me pêçane

em niha revokên
demên serxweş in
şev nêzik e
roj hêdî hêdî dirije ji mêjiyên me
em wek rêwiyên bêmebest
hêj bê ser û ber direvin

reva me reveke bêxwedê
ji derdora me şûr û mertalên
bêîman difirin
em dibin ez!
serê xwe bilind dikim
wek Îsayê fêza Golgotayê
kesereke kûr dikişînim
tenêtiya mirovahiya bêîman ez pêçame
li ser milên min kes nîn e
jorê jî...
ez hest dikim ku di dawiyê de
"ew" jî mîna min bû!

12.01.2009

Min nikaribû ragirta û jixwe min ranegirt
jî! Ji bo xatirê Xwedê, heger henek be jî ma tu
carî gotineke ew qas giran ji însên re tê kirin?

Girrê zilamtiyê

Lokman AYEBE

Ew dizane parsûya min qalind e û ez nikarim van gotinan ragirim
û axir min ranegirt jî! Hema min bi gotinên wî re xar bir kursî lê çi
feyde nehiştin ez serî lê belav bikim

Heger gotina divê di dawiyê de bihata gotin wî di serî de û di nava civatê de negota belkî wiha bi min tehde nehata, lê belê min bawer nedikir wê însanekê ji ber gotinekê bikaribe ew qas biêşê û ji êşandinê jî wêdetir wiha weke min gêj û teyš bibe. Piştî gotina wî ez bûm weke marê çu li serî bikeve. Ji bo ez kertiyeke nekim min pir li ber xwe da, ji hêrsê min nizanibû ez ê çi bikim û bi ku de herim. Ji ber vê hêrsê, min zimanê xwe weke cûmek benîşt di nava diranên xwe de cût. Hîn ji zimanê min kul e, ez avê ji vedixwim nola tu sûravkê bera ser vê birîna zimanê min bidî, dişewite. Jixwe do, ji sibehê de nehletê şeytên dest xist pêxila min û heta ku ez çûm li belaya xwe rast hatim ji ji min neqeriya. Serê sibehê ez hîn nuh ji malê derketibûm li ser derencokên malê lingên min li hev aliqîn û ez bi dev û rûyan çûm erdê, lê tu tişt bi min nehat. Bi wê ketinê çawa dereke min neşikest ez ecêbmayî mam. Xwezî libatekî min bişikesta, ez rakiribûma nexweşxaneyekê û bila ez neçûma li sikûmê wî kurê kerê rast nehatima... Kurê kerê! Heger debançeyek min a şazdeh derb hebûya û min her şazdeh derb di zik hev de lê nereşanda bila ez ne ji dola bavê xwe bûma. Axir min ji malê ew kêr peyde kir... Erê min debançeyek peyde nekir lê kêra min jî weke gûzên tûj bû û min qet lê textsîr nekir ku bi wê kêrê min hûrê wî bera ber wî da. Çawa min kêr li bin zikê wî xist çavên wî weke çavên sihorîkekê hûrik bûn û nûzenûz ji qirikê hat. Erê pir li ber min geriya û got neke, te ez şaş fehm kirim, min henek kir, min bibexşîne lê dîsa jî mala Xwedê ava be ku destê min lê sar nebû û weke ez wî di

ser diya xwe de zeft bikim bi hêrs min kêr dawêşand tirêla zika. Bi her sê navê Xwedê heger min ew li ser diya xwe jî bigirta belkî wiha li zora min neçûya. Lê ew gotinên wî yên li qehweyê di nava civatê de ji min re kir, tune... Ma ev gotin di nava civatê de, ji zilamekî re tînin gotin!? Ma tu carî ev gotin tînin xwarin? Min ê çawa daxwara? Heger min daxwara, ez ê sibê ro çawa derketima nava cimaetê? Wî bi hawayê min dizanibû, zilam bi zilamtiya xwe nikare ji min re bibêje, birako pozika sola te xwar e! Tevî vî hawayî jî wî li qehweyê di nava civatek zilam de ew peyv li min xistin. Jixwe gava hîn nuh peyv ji ser ziman pengizî zilam neketina navbera me min ê li qehweyê bi kursiyeke serî lê belav bikira, lê mala wan hezar carî ne ava be ku nehiştin. Min germa germa di hundirê qehweyê de heyfa xwe jê hilaniya wê bêhtir dilê min lê rihet bibûya lê dîsa jî ne xem e, wa ye ji ber derbên kêra min li nexweşxaneyê li ber xwe dide...

Dibêjin mirina bizinê tê dihere nanê şivên dixwe, êdî meseleya me ye. Berê jî çend caran wiha kiribû, peyvên zarçepelî kiribû lê ew qas li zora min neçûbû. Lê vê carê tu yê bêjî qey bû xwê û ketê gir. Piştî min xwe lê rakişand û xelkê nehişt ez li qehweyê tişteke pê bikim, ez ji qehweyê derketim û weke kerê hefsarfilitî ez bê hemdê xwe di vir û wir de çûm û hatim. Piştî min xwe li mala kurê xalê xwe girt. Çawa ez çûm mala wî, wî fehm kir ku nokek di bin zimanê min de heye. Min jî zêde di xwe de veneşart û min debançeya wî jê xwest. Got çi ye, ji bo çi ye, lê min jê re qala tu tiştî nekir.

Min sedem jê re negot, wî jî debançe neda. Tew di ser heqê min re ew qebraxê kurê xalê min li ser serê min xwe tirşûtehlo kir. Min û wî jî di ber hev da û min çend fort jî lê kir lê ji ber ku min nexwest berî ez derba xwe li wî kurê kerê bixim dengê min û kesekî din bê, min dirêj nekir û bera hundirê xwe da. Ez poşman bûm ku piştî valakirina hûrê wî kurê kerê min rêya xwe dîsa danegerand ser wî qebraxê kurê xalê xwe û min devê kêra xwe bi tehma xwîna wî jî nexist. Çawa be kêra min tehmiyîbû xwînê û hey min dabû nav, ha li çongê û ha jî li gûzokê. Lê zarokên wî hûr bûn, dilê min hinekî bi wan zarokan şewitî... Erê kurê xalê min debançeya xwe neda min, lê min xwîna xwe xistibû çavên xwe, ma qey ez ê li xwe biheyirîma. Hema ez yekser çûm malê, ez dizîka ketim hundir û min rahişt kêra me ya goşt. Min kêr li perçeyek rojnameyê gerand, ew rada ber xwe û berî ku diya min bi min bihese ez pengizîm derve. Ne Xwedê heye, di rê de du sê caran rehm hat dilê min û dengê di dilê min de ji min re got li kerê şeytên siwar nebe û vegere malê, lê her di pey vî dengî re ew gotinên wî û fiqefîqa kenê wê civata qehweyê dihat bîra min û ez hîn bêhtir tûj dibûm... Ez çûm qehweyê lê ji wir rabûbû, min jî berî da mala wan. Reva pisîkê hetanî kadîne bû, ma ew ê bi ku ve biçûya! Ne li malê jî bû. Min got belkî birayê wî derewan li min dike û ji bo ez dilê xwe têxim cih min xwest ez xwe li derî biqulibînim û hundir saxtî bikim lê ji bo zêde bêhnê nede û teşqe zêde nebe min li hundir nenihêrî. Yan li êş bû û yan jî li kêş bû, çawa be min ê ew bidîta. Serê sibehê li qehweyê ji bo kirîna hin asûkiyan qala çûyîna sûkê dikir, min jî ji mala wan xwe bera sûkê da. Ew biçûya erş, ew biçûya fers, ew ê dîsa jî bihata ber gunikê min î reş û axir hat jî. Hîn min xwe bera sûkê nedabû, min dît du sê kîsikên tije di destê kurê kerê de ye û ji sûkê tê. Çawa çav li min ket weke cinê çav li hesin ketibe, veciniqî. Min xemla xwe xera nekir û ez hênîk hênîk di ber wî de meşiyam. Gavên wî sist bûn lê rêya xwe neguherand. Gava em hatin texma hev min xwe da pêşiyê û min rêya wî birî. Min bi rûyekî tirş jê re got: "Ew çi qeşmerî bû te vê sibehê li qehweyê kir, hey kurê kerê?" Wechê wî dawerivî, bû çepçepa

devê wî û bi dengê lalûteyî got: "Ez xêrê ji xortaniya xwe nebînim ku te ez şaş fehm kirim." Hîn wî weha digot, ji bo ez bi peyvên wî nexapim û kela min li min sar nebe hema min bi destsivikayî kêra xwe ji ber xwe kişand, rojnameya lê gerandî ji ser şeqitand, çavên xwe girt û kêr dawşand tirêla zikê wî. Kerê reşo, te çiqas ceh xwaro!? Sê çar kêr min li bin zika xist. Her cara min lê dixist jî min kêr di hundirê wî de badida. Jixwe gava ji bo careke din jî ez kêrê dawêşînim min kêr ji zika kişand û min çavên xwe vekir, hew min dît tevî kîsikên xwe tûşî erdê bû û xwîn ji zika dibeliqî erdê. Emrê Xwedê jî mehdê min ji xwînê dixele, bû ku ez vereşim. Jixwe ji bo ez xwînê nebînim min çavên xwe girtibûn. Lê piştî ez çav li wê xwîna wî ya heram ketim, mehdê min xeliya û destê min jê sar bû. Nalenala wî bû... Min ew di wî halî de hişt û beziyam. Hew ez lê hay bûm ku kêr hîn di nava destê min de ye û ez wiha dibezînim, îcar min kêr avêt û min dîsa bezand. Lê ez ê bi ku ve biçûma? Ez qet ne poşman im! Bila kurê kerê li mêzîna zimanê xwe miqate bûya! Bi qasî misqalekê jî sura poşmaniyê li dilê min pêl nedaye. Min ev ji polêsan re jî û gava din ji parêzerê xwe re jî got. Min nexwestibû lê gorî zagonên dewletê gava din parêzerek ji min re hat. Min jê re qala bûyerê kir. Erê navê wî parêzer bû, lê hema çi parêzer! Qet çavên min jê tije nebû. Qaşo ew ê min biparêze, lê bi ya wî be ew ê di tavilê de neh deh salan li min bibire û min biavêje hundir. Çi ye, qaşo min bi qesta kuştinê lê daye û ev jî dike ku ez zêde salan bixwim. Erê, min bi qesta kuştinê lê da, erê min kuşt lê çi feyde Xwedê ew nekuşt!? Ji min hebû mir! Mixabin dilê min tam lê rihet nebû. Xwezî min ew kuştibûya û bila ez jî biçûma sêdarê. Heger ez ji xwînê nexeliyama hetanî can bida jî ez ê li ser serê wî bisekinyama lê ez kêlîkeke din jî zêde li ser serê wî bisekinyama ez ê ji ser hişê xwe biçûma û ez ê biketima. Ji ber wê jî min tavilê ji wir gav qelaşt. Min got çend rojan hetanî av zelal dibe ez ê xwe bidim alî, lê ne qurîşek pere di berîka min de hebû û ne jî cihekî ez pê de biçûma hebû. Ji neçarî, ez rabûm nîvê şeve teslîmî polêsan bûm. Ma qey ez nizanim ne ji hevalan û ne jî ji malbatê wê tu kes li min

xwedî dernekeve û ez ê di hundir de rezîl û riswa bibim. Ma qey ez nizamim ez ê cezayekî zêde bixwim û wê ev sal jî ji xortaniya min herin. Lê qet ne xem e! Xema min ew e ku ew nemiriye û hîn jî sax e. Ez hîn jî bawer nakim ku piştî ew qas kêrî çawa sax mayî û filitî ye. Dibêjin însanê bênamûs zû bi zû namirin, rast e. Gava ez teslîm bûm û min ji polêsan re got, qisasê wî kesê îro li filan derê bi kêrê hatibû kuştin ez im, polês kenîya û got; "Ew nemiriye lê birîndar e û jixwe em jî li te digeriyan lê wa tu bi lingê xwe hatî teslîm bûyî." Gava got ew nemiriye nola tu derziya jehrê li canê min bixî ez ricifîm lê dûre ew dîmenên dema kêrkinê hatin ber çavên min û ez hinekî bi ser xwe ve hatim. Heger nemiribe jî çawa be ez di bin gotinên wî de nemam û min heyfa xwe lê nehişt. Ev serbilindî besî min e... Lê malbata wî? Ez dizanim min agir bera canê wan da lê ez çi bikim, ne qebahetê min bû. Hîn çar meh berê daweta wî bû, ez di daweta wî de ew qas reqisîm, min ew qas tehb di ber wî de dît, lê ka kê şêkir kir? Di ser heqê min re di nava civatê de pê li min kir... Wî û jina xwe ya çikî can jî hîn xêr ji hev nedîtîn lê gunehê min çi ye, ew xuriya. Lê malbata min? Ji do şev de ez li vir im û polêsan haya malbata min ji teslîmbûna min çêkirin lê tu kes ji wan nehat serdana min. Hema bi derewan be jî ma qey mirov nayê napirse!? Jixwe bavê min niha agir xistiye dawa xwe, neyê vir û em hevdu nebînin çêtir e. Ew ê min ji vir û hetanî cem Xwedê neheq derxe. Ez her ku singekî bikutim û ez mafdariya xwe vebêjim ew ê jî tûrekî bi vî singî dake û min neheq bike. Niha

agir bi kezeba diya min ketiye, çawa ew debar dike û nayê ez jî nizamim... Kî dibêje çi bila bibêje ez ne neheq im û ji ber wê jî ez qet ne poşman im. Bila wî ew gotinên giran nekira. Ew têra xwe zarçepel bû û min jî tu carî ji zarçepeliyan hez nedikir û wî jî ev awayê min dizanibû... Dibêjin zimanê însên dibe emelê serê însên. Gunehê min çi ye, yê wî jî zimanê wî bû emelê serê wî... Ma min ê çawa daxwara? Ji rûyê kurê kerê min malik li wî jî xera kir, li xwe jî! Ez hetanî vî emrî nezewicîme nezewicîme, ma çi bi wî ketibû? Ne ew di nava wê civata qehweyê de bibêje "Çima tu nazewicî lo, ma qey tu ne zilam î kuro?" û bike fiqefiq û bikene nabel? Min ewil deng nekîr û weke min nebihîstibe min xwe li gotina wî nekîr xwedî, lê tu mirî çiqas bişoyî ew qasî tiran dike. Erê min deng nekîr lê vê carê wî dengê xwe hîn bilind kir û dîsa jî dubare kir. Tew di ser re jî lê zêde kir û got; "Tu têtî qehweyê çi xwişka min, here malê û kitana diya xwe bide serê xwe." Xwişka min, kitana diya xwe, nezilam... Ew dizane parsûya min qalind e û ez nikarim van gotinan ragirim û axir min ranegirt jî! Hema min bi gotinên wî re xar bir kursî lê çi feyde nehiştin ez serî lê belav bikim. Axx hela ji xwe lê binihêrin bê vî kurê kerê çi anî serê min? Encax min debançeyeke şazdeh derb di zik hev de, tê de vala bikira wê dilê min ê hîn baş lê rihet bibûya lê dîsa jî ne xem e, bi saya serê kêra xwe min xwîna gayekî ji canê wî kurê kerê rijand erdê, ev jî besî min e...

Veşartin

Weşanên Ronahî



Guldesteyek helbest

Reyhan SARHAN

Ez xwe ji dengê evîna te vedişêrim!
xwe ji xwe vedişêrim!
ji rastî û zagonên jiyanê
ji deng û dîtînên li ber çavan
ji evînên li ser riya û yên li ber derî
ji te û evînên nû ez xwe vedişêrim!...
dibe ku evînan ez çavtirsonekî kiribim!?

Gazî

Jana dilê min gazî te dike
komên bîranînan gazî te dikin
çavên westiyayî li her derê li te digerin
lê tu li tu deran nayê dîtîn û xuya nabî?

Bêwijdanî

Ev şerê bêwijdaniyê ye
hin dikin û hin dixwin!
Di hemû şorêşên dinê de
jî ev wiha dibe...
Çiqas li vê rewşê difikirim
ew qas di bin erdê de diçim...
têm qurpandin û cûtin
di devê deqeruyan de!

Kole

Lê ez ê ji niha û pe ve
ji dilê rezîl re nebim kole!
ji bo ku min nexwe nîvê
derya êş û xeman!
ez ê ji niha û pê ve nebim
koleya evînên vala...

Hêviyek

Hêviyeke demsalî me
li ser rûyê karkerekî/a demsale
hêviyeke veşartî me!
Di rê û rêçên deryayên reş de
westiyayî me
tevî hêviyên xwe û te...

Axxx... Yarê!!!

*Dibim hêmaneke sûcdar a xewn û aşopa xwe û ber
bi valahiyê ve difîrim.*

Carinan mirov xwe jî dakuje

Şener OZMEN

Çîroka Kakil, ji du beşan pêk hatibû. Beşa yekê “Ez” bû û ya duduyan jî, “Bajar” bû. Zeraq, bi dû gera xwe ya di şev û tarîtiyê de re, yanê piştî ‘Ez’ ê, îcar bi bajarê xwe re rê dibirî û ligel distra û berevajiyê ristên Konstantîn Kavafîs ên ku digot, “*Wê ev bajar li pey te were*”

Û çilk ji pênûsa min diniquitin...
(Ji Çilkên Pênûsê)

PÊŞEK

J. C. Carlonî û J. C. Filloux di pirtûka xwe ya “*Teoriyên Rexneyê*”(*) de dibêjin; “*Her rexne, di esasê xwe de ji ser nîrxê berheman berê xwe dide ragihandina darazekê, lewre, taybetmendiya rexneyê ew e ku, wêjeyê wek qadeke nîrxan dibîne.*”(**) Piştî bi salan, dema ku min rahişt pirtûkê û li rûpelên wê yên zer û çilmisokî nihêrî, min dît ku ji bilî hevoka li jor, li binê hin hevokên din jî bi pênûseke spîsor hatine xêzandin û li derveyî cihê nivîsînê, yanê di wê nivenga nîvsantîmeke vala de jî bi heman pênûsê bi destxeteke hûr û keşxe nîşeyin hatine girtin. Min pirtûk di kîjan salê de û jî kê stendibû, nema dihat bîra min. Tiştê ku digotin ev bû; “Dema ku tu binê hevokên pirtûkekê welê bi pênûsê dixêzînî, ew yekser dibe delîlek ji bo polêsan.” Yanê diviya min welê nekira û diviya ku roj bîst û çar saet min bi bîr bianiya ku ez li Kurdistanê dijîm û wekî Helîm Yûsiv jî di Gava Ku Masî Tî Dibin de gotî, “*Li vî welatî dibû ku her tişt bibe. Tiştêkî dûrî aqilan nemabû.*”(***)

De her çi be, ew destxet helbet bi tirkî bûn, ji ber ku pirtûk hem bi tirkî bû û hem jî, min bi qasî serê derziyê jî bi zimanê xwe nedizani û siyaseta kurdan jî xwe bi tirkî bi rê ve dibir û dem bi dem dihat gotin ku; “*Em ê heta sala 2000’an bi zimanê tirkî biaxivîn û binivîsin û bixwînin*”, ji min re jî bûbû înyad ku ez piştê li tirkî bişikînim, welê bikim ku dema ku ez bi tirkî biaxivim, hemû zimanzanên tirk û helbet hemû profesorên ku di TDK (Saziya Zimanê

Tirkî) de ne, ji şerman serê xwe biçemînin û tobe bikin da ku careke din bi tirkî nepeyivin. Welê jî bû. Sal bihurîn û çûn. Sala 2003’yan bû. Rojek ji rojan, li Amedê, ji bo amadekirin û pêşkêşkirina bernameyeke çandî û hunerî, ji TRT’yê gazî min kiribûn û ji min tika kiribûn ku ez li ser *Bîenala Stenbolê ya Navneteweyî ya Heştêmîn*, bi kuratorê wê yî Amerîkayî re (Mr. Cameron bû) bernameyeke taybet çêbikim. Min jî erê kiribû û axir, ez ligel mêvanên xwe (Dan Cameron, Emre Beykal, wergerek û hunermendekî biyanî) derbasî studyoya ku ji çarnîkar de bi projektoran hatibû ronîkirin, bûbûm û li paldanka xwe danişibûm. Dirêj nekim û serê wê neêşînim. Bername ji ber ku ne zindî bû, ez hinekî rihet bûm, belam bi tevî wê dilrihetiyê jî, kêmasiyek peyde bûbû, bi dû qedîna bernameyê re gerînendeyê bernameyê nêzikî min bûbû û di guhê min de gotibû; “*Bibexşîne birayê min, lê tirkîya te bi devok e!*” Devok!? Pek û sed carî pek! Yanê tirkîya min a *full* entelektuel ne bi dilê camêrî bû, yanê camêr dixwest bibêje ku, “*Bandora zimanekî din li ser tirkîya te heye û em tê dernaxin bê kîjan ziman e...*”, min bêhemdî xwe gotibû; “*Qû...!*”, lê êdî ez bi bayê bezê ji studyoyê derketibûm. Naxwe “bandor” bû, bandora diya min bû û min yekrê berê xwe dabû mala diya xwe û bi dîtina wê re, min xwe avêtibû ber lingên wê û ew mirç û mirç maçî kiribû.

Îro, li dû her bandoreke wisan ez nikarim berê xwe bidim mala diya xwe, lê di şûnê de, pirtûkan maçî dikim, wan bêhn dikim û di hembêza xwe de diguvêşim. Di van rojên dawîn de jî, ya rast çend pirtûkên hêjayî maçîkirinê hatin ber destên min –ew qet ji min

dûr neketibûn-, giş jî ji Weşanxaneyê Lîsê derçûbûn û min ew peyderpey, li malê, li dibistanê, li otobûsan, li dolmîşan, di rê de xwendibûn. Miriyê Hêram a Bavê Nazê, Dengê Xwînê ya Têmurê Xelîl, Mişextî ya Adil Zozanî, Deqên Qesas a Lal Laleş, Zaremyaya Îrfan Amîda û Çîlkên Pênûsê ya Dilawer Zeraq... Min ew eyn bi vê rêzê xwendibûn. Lal Laleş, demeke dirêj bû ku ji ber karûbarên weşangeriyê pirtûka xwe ya helbestan çap nekiribû, mecal nedîtibû ku helbestên xwe berbihev bîne û bi çavê pirtûkekê li wan binihêre. Axir, piştî *Berbejna Rê*, *Deqên Qesas* jî tev li pirtûkxaneyê kurdî bûbû; bîst û çar deqên bêîman lê kiribûn Lal Laleş, dengê wî yê mêrane, di helbesta "*Deqa Hundirê Min*" de digihîşt asta xwe ya herî bilind. Her wiha, Çîlkên Pênûsê ya Dilawer Zeraq jî, xwe bi zimanekî tekûz û bi mijarine pir û pir balkêş dabû der. Sedema jî nû ve derêxistina wê pirtûka kevn a ku min li jor qal kiribû, belê, pirtûka Dilawer Zeraqî bû. Ez li rêyekê digeriyam da têkevim hundirê çîrokên wî û di heman katê de jî tiştine din bînim zimên.

Di pirtûka J. C. Carlonî û J. C. Filloux de li ser çêşn û awayên rexneyê tespîtên girîng hebûn, nivîskaran tiştêkî balkêş jî şanî me dida û digotin ku; "Cureyeke rexneyê heye ku, me ew di asta rexneyê de nedît," di pey re jî, bi kurtayî qala "*rexneya rêbazî*" dikirin û ev cureya rexneyê jî wek propagandayê wêjeyî ya/yê nîfşê nû (nivîskarên ciwan) ya/yê ku herî bêhtir bi tirs û şayîşa ragihandina ramanên xwe yê nû tev digeriyên, didîtin, helbet bi balkêşanekê; "*Nivîskarên ciwan, di vê cureya rexneyê de, yan bi navê dikevin û her kesê ku ne ji mezheba wan in bi tundî rexne dikin, yan jî ji bo serfiraziya berhemên xwe û yê heval û hogiran dixebitin.*"(****) Heye ku rexnegirên me paxav bi van gotinan û her wiha bi vê pirtûka kevnûbûyî (pirtûk di sala 1984'an de derçûbû) nekin, lewre gelek qereçarşem di ser wan rexneyan re derbas bûn, gelek tişt bi demê re hatin jibîrkirin, an jî wek modeyê li demboriya xwe bûn gorî. Digel vê hindê jî, heqîqeta rexneya me ya îroyîn, wer dixuya ku tiştêk ji cîrnexweşiya xwe ya mezeloqî wînda nekiribû; ez bihevî bûm ku rexne demildest bê ser hişê xwe, lê ji bilî çend nivîsarên ku mirov serê xwe

pê biêşîne û wan ji xwe re bike arîşeyê rexneyî, nivîsareke hêjayî gotinê, rexneyê, şîroveyê, mixabin derneçû.

Na, ne ku pirtûkên kurdî kêr çap dibûn, ne ku hejmara nivîskarên me nedigihîşt yê/ya rexnegiran, mesele ew bû ku, me çawan û bi çi awayî dikaribû li ser berhemên ew çend qels û ne rind binivîsin an qiyametê rakin? Pirs li dû hev hatibûn: Aya me bi çi terhî nav li berhemên dikirin û etîketên giran bi wan ve dizeleqandin? Çi bûn pîvanên wêjê û rexneya me: Ziman? Estetîk? Poetîka? Dîrok? Çend şîrovegerên xas û nas? Wêjê bixwe? Berhemên me çiqas bi gerdîşê re têkildar bûn û çiqas di nav de bûn û çiqas jê dûr ketibûn? Ma serboriyên wêjevanên me, ji berhemên wan girîngtir bûn? Heke min bigota çîrokên Celadet Alî Bedîrxan, ên Kamiran Elî Bedîrxan, ên ku berî bi 80 salî hatibûn nivîsandin, ji gelek çîrokên ku îro bûbûn pirtûk û ketibûn guldesteyan, bi sed qasî (ji gelek hêlan ve) xurtir û geştir in, dê çi bibûya? An na, ez ê bi kevneperestiyê bihatima tawanbarkirin? Heke min bigota Cîm û Gulperiya Seydayê Cegerxwîn mînakeke bêhempa û tekane bû "*çîroka modern a kurdî*" (kê gotibû ku Cegerxwîn klasîk e?) dê kê çi bigota? Gelo, dema ku em di çîrokên xwe de qala tenûra li ber mala xwe, tûtina nîzanim kîjan deverê, axura filankeso, ji çardehsaliya xwe ya li gund û li bajarokê, şer û pevçûnan û qala girtin û rojên xwe yê nî di hepsê de dikin, bi van yekan re em dixwazin heqîqetê çawan şanî dinyayê bidin? J. C. Carlonî û J. C. Filloux ez bi pîrsekê şaşomaşo kiribûm; mînakek ji berhema "*De la littérature considérée dans ses rapports avec les institutions sociales*" (Ji hêla peywendiyên dezgehên civakî ve wêjê) ya Mme de Staëllî ya di sala 1800'î de derçûye, dabûn û gotibûn ku; "*Aya bandora gerdîşê û zagonan li ser wêjeyê heye yan na?*" Bêguman hebû! Bêguman, gelek nivîskar berhemên xwe di bin van bandoran de afirandibûn bêyî ku haya wan ji vê yekê hebe û gelekê caran ev berhem fena wêjeyê hatibûn pejirandin, bêyî ku xwendineke rexneyî li ser wan bê kirin.

Lê hin mînak jî hebûn ku dilê mirovî rihet

dikirin, mirov bi wan re tê digiha ku *"wêjeya wêje"* bêyî ku bi peyveke pêlîstî xwe *"wêjetirê"* xwe bike, li ber destê çend pêûsgirên me mezin û geş dibû. Dilawer Zeraq jî, yek ji wan çîroknûsên me yî pêûsxurt bû. Zeraq, di pirtûka xwe ya dawîn de, yanê di *Çilkên Pênûsê* de, li tikûtenetiyê, li hûrdeman û li kêliyên berî xwekuştin û cinayetê, li takekesiya me ya ku di ber çerxên jiyana rojane de perçeperçebûyî, li xewn û xwesteka jênager a xewnsaziyê, li dilgeşiya me ya durû û li piçîk û zereyên tozê, li bêhtengiyên ku pêûsan dibizdînin û li encamên revokiyên me yên di vê jiyana kambax de hûr bûbû û ji wan çilkan deryayeke poetîk ava kiribû. Zeraq, bi *Çilkên Pênûsê* re bi me dabû zanîn ku ew xetatekî demên berê ye û di heman katê de nivîskarekî cihanê ye.

Na xêr, *Çilkên Pênûsê* ne pirtûkeke kurteçîrokan bû, tenê welê dixuya.

Na xêr, *Çilkên Pênûsê* ne serpêhatiyên nivîskêr bû.

Na xêr, *Çilkên Pênûsê* ne bîranîn bûn.

Çilkên Pênûsê, xwekuştinek bû, xweşkuştineke bi pêûsê, bi nivîsînê...

Belê, carinan mirov xwe jî dikuşt...

KAKIL

Ka em bînin bîra xwe. Yekem pirtûka çîrokan a Dilawer Zeraqî *"Kakil"* (1) di Adara sala 2002'yan de gihîştibû ber destê xwendevanên kurd. Pirtûk, ji neh çîrokên *"dengdar"* hatibû pê û nivîskar ew diyariyê *"koçera xwe ya rûheyo"* kiribû, ya ku lê digeriya.

Di wê pirtûkê de, her wiha di çîroka *Kakil* a ku navê xwe dayî pirtûkê de, Dilawer Zeraq, bi peyva *"Ez"* dest bi çîrokê dikir û digot: *"Min ji şevan hez dikir. Teq û reqên ku li dûrî min pêk dihatin, aramî û vehêşîneke bêhawe dixistin nava min..."* (2) Zeraq, têkildarî yan altaxiya xwe ya bi şevê û bi tarîtiyê re -û di heman demê de ya bi tikûtenetiyê re-, hema hema bi maweya şevê, bi hîs û pêjn û monologên derûnî dianî zimên û dema ku rûbirûyî *"şev û tarîtiyê"* dibû jî, xwe jê nedida alî û hewl dida ku wê perdeya reş a bi ser hebûn û tûnebûnê de hatî, di wê kêlika rûbirûbûyinê de bi çend pîrsên ontolojîk vebîçirîne; dûre jî digot: *"Ev yek xapînokiya tarîtiyê bû. Min tu tişt ji tarîtiyê fêhm nedikir. Wê*

him heyî, him jî tune dikir." (3) Wî li tarîtiyê dinihêrî û lê dişopand, bi dû diket û ne rastî xwe, lê rastî şevê diçû heta ku digihîşt bêencamiya xwe ya mējûyî û wê hingê li ser xwe digot; *"Hîs û pêjneke wisan di dilê min de peyde bû ku min digot qey ew dixwaze ruhê min, heyîna min dîl bigire; wekî avgirê ber bi nava xwe ve bikişîne û têxe rewşa stêrkan; stêrkên ku dema roj hiltê jê direvin û vedikişin taldeyên tarîtiyê..."* (4)

Çîroka *Kakil*, ji du beşan pêk hatibû. Beşa yekê *"Ez"* bû û ya duduyan jî, *"Bajar"* bû. Zeraq, bi dû gera xwe ya di şev û tarîtiyê de re, yanê piştî *"Ez"* ê, îcar bi bajarê xwe re rê dibirî û ligel distra û berevajiyê ristên Konstantîn Kavafîs ên ku digot, *"Wê ev bajar li pey te were"*, ew li pey bajarî diçû û birc bi birc, beden bi beden li navê digeriya. Mixabin, bajarê ku ji ber gelek sedemên aşkera xwe hîni xweveşartin û xweparastinê kiribû, wî (yanê hebûna nivîskêr) negirtibû nava xwe. Digel vê hindê jî nivîskar dev ji pesnê bajarê xwe yê qedîm bernedabû û li serê gotinên xweş û dilveker kiribûn û li dorê çûbû hatibû ka bê dilê wê nake. Zeraq, bajarê ku çarmedora wî bi bedenên ji kevirên reş lêkirî (reş, yanê çarenûsa bajêr, bextreşiya wî), şibandibû fêkiyeke bi kakil û kakil jî, wek *"hebûn"*, *"nûbûn"*, *"ruh"*, *"evîn"* û *"jiyanê"* watedar kiribû û gotibû; *"Loma wî qalikek ji bo kakilê xwe çêkiriye; qalikekî hişk ku tu derb û hêz nikare wî bişkêne; wekî qalikê dendikê xoxê; ku dema bikeve bin axê, axa qedr û rûmetzan wî dihevine û bi fêkiyên xweşiktir û bi çêj û tehm ew ji nû ve vedijîne û keremî mirovayetiye dike."* (5) Dilawer Zeraq, bi Şêxê xwe yê *"navê xwe li birc û bedenên kolayî"* re, rêyeke din li ber me, her



wiha li dîrok û çîroka Şêx Seîdê Pîranî jî vekiribû; *"Ew birc û beden, xwebûna bajarê min a ji xwînê tînin zimên."*(6) Di çîroka Kakil de tiştê herî balkêş û nexuya, di wateyên pêreyî de veşartîbû: Nivîskar di beşa "Ez" ê de, xwe jî û hişê xwe jî bi qalikekî qayîm vepêçabû, lê belê, di beşa "Bajar" de wî jî dilê dil xwestibû ku wî qalikî bişikîne û jê derkeve; *"Ez devê xwe vedikim da ku bi bajarê xwe re biqîrim, tev li strana kakilê wî bibim, lê deng ji min dernayê."*(7) Bi tevî vê reşexewnê jî ew hêviya xwe ji bajêr nabire û dibêje; *"Piştire... destanek, bangawaziyek, evîniyek: yara ku tu car naterikîne; kakilê bajarê min... tê hawara min."*(8) Belê, ziman e ew, ê ku tam di wê bêhnika têkçûyî de bi hawara wî de tê. Tê û bi hatina xwe re jî bêhna wî vedike, gazî wî dike û wî dikişîne nava kakilê xwe.

Dişê bibêjim ku çîroka Kakil, bi zimanê xwe yê metaforîk, jî çîroknûsiya Dilawer Zeraqî danîşanên girîng danîne ber destê me. Zeraq bi peyvan nalîze, wan naqurmîçîne, naçilmîşîne, bi wateyên wan re nakeve heftûheşteke bêsûd, wekî ku Walter Benjamîn jî gotî, *"Nivîskarê baş jî zêdeyî tiştê ku difikire, napeyve û gelek tişt jî bi vê ve girêdayî ne. Qisekirin, jî ber ku ne bi tenê derbirîna ramanê ye, di heman demê de lidarhatina wê ye jî."*(9)

Dilawer Zeraq jî di çîrokên xwe de bi heman aramiyê tevdigere.

BIŞIRÎNA ŞERMÎNÎ

Bi dû Kakilê re, yanê di kewçêra sala 2003'yan de duyemîn pirtûka Dilawer Zeraqî ya çîrokan derçû: *Bişirîna Şermînî*(10) bû ew pirtûk. Ji şeş çîrokan pêk hatibû, ya rast, çîroka *"Jiyek Cemidî Di Hembêza Tîrmehê De"* cara ewil, di pirtûka yekem de weşiyabû û piştire, me heman çîrok di pirtûka *Bişirîna Şermînî* de jî xwendibû. Zeraq ev yek bi van peyvan wekî nîşe diyar dikir: *"Ev çîrok di yekem pirtûka min Kakilê de jî weşiyabû. Lê ji ber ku jî bo çîrokên vê pirtûkê bûye kanî û jêderk, min ew xist nav çîrokên vê pirtûkê jî."*(11) Lê ez ê li ser vê çîroka destnîşankirî ranewestim, meseleya min bêhtir bi çîroka *Bişirîna Şermînî* re ye û ev çîrok, di heman demê de çîroka herî dirêj a pirtûkê ye jî.

Çîroka dirêj, bi diyalogên "dûdirêj" ên di navbera "Gulbîn" û "Şermînê" de dest pê dikir û bi vegotinên Şermînê diherikî. Bajar: Amed e, cih: kafeyeke bi neynik e. Pîrsa pêşîn *"Ev çi halê te ye?"* ye. Bi dû pîrs û devgerînên Gulbîna hevala Şermînê re, çend bersivên nixumandî tînin ji hêla neynikê, wek: *"Halê min..."*, *"Veşartin..."* û liwîrbûyîna neynikê dibe hincetek, her wiha dergehek û delîveyek jî bo vegotinê; *"Gulbînê li rûyê wê yî di neynikê de nihêrî, ji kezeb de axîneke kûr kişand, di dilê xwe de got; 'Erê lê, Xwedê daye te!... Tu dibê qey ronahiya ku di nav selitiyê de ye, bes ji bo şanîdana delaliya te ye...' û lê zivîrî..."*(12) Nîgaşa neynikê (mirroring) ya ku xwe bi wateyên xwe yên pêreyî wek; xuyana xapînok, xuyana derveyî, xuyana bi endîşe, xuyan (bergeh), xuyana zahîrî, serfiraziya xapînok şanî me dide, dîsan bi pîrsekê re diderize; *"Va ye rûyê te yî candar li pêş çavên min e, îcar çi hewce ye yê di neynikê de?"*(13). Neynik, wek Laura Mulvey jî di nivîseke xwe de gotî; *"Li vir, meraq û daxwaza lênihêrînê, tev li rakêşeriya dirûvtî û nasînê dibe: rûyê mirovî, gewdeyê mirovî, pêwendîya di navbera beden û hawîrê de û hebûna mirovî ya xuyanî ya li dinê."*(14) Aya Şermîn jî bo ku xwe nas bike li neynikê dinihêre yan na? Wekî ku di vê jêwergiranê de jî hatiye gotin, meraq û daxwaza wê ya lênihêrînê, ji sedema naskirina bedenê tê yan jî xweseriyekê? Wisan be jî, neynik li rasta wê (Şermînê) ye û Şermîn di lênihêrtinê de heweskar e; *"Em her du jî dikarin di heman demê de hevdu tê de bibînin, ji bo wê bonê..."*(15) Gulbîn dibêje: *"Dema tu li neynikê dizivîrî wech û awirên te diguherin."*(16) Nexwe guhertinê dibin û Şermîn wekî ku haya wê qet ji van guhertinan tune be, li Gulbînê vedigerîne; *"Diguherin... yanê çawa...? Ma rûyê di neynikê de... ne rûyê min e?"*(17) Va em gihîştin pîrsa herî girîng; heke ku em ji ser pîrsa Théophile Gautier ya ku arasteyî kevala Velázquezî, *"Las Menînas"*ê dike bi dû meseleya neynikê bikevin, em ê karibin hin xalên girîng ên pê eleqedar jî bibînin; helbet ez nabêjim ku ev dîmena bineynik dişibe kevala Las Menînasê, na, berevajî jê bi gelekî dûr e, ez dixwazim bes vê pîrsê jî nivîsa xwe re bikim arîşeyek; *"Gelo Şermîn li ku ye û ya di neynikê de ew e yan na?"*

Ma rast e ku neynik, hindek xweşiyên gengaz jî didin me? Belê, wisan e. Yek ji wan xweşiyên jî, bi gotina Freud, *skopofilî* ye, yanê raçavkirînerî ye. Li vir nihêrîn, dibe jêderka xweşiyê. Freud di her sê ceribînên xwe yên li ser zayendiyê de qala vê yekê dike û skopfilîyê mîna ajoyên ku ji deverên şehwar (*erojen*) pir serbixwe ne dibîne û wê wekî ajoyîne ku zayendiyê diafirînin, dipejirîne.

Herî zêde ez dişem bibêjim ku Şermîn, bi qasî ku di neynikê de xuyana xwe ya vajî dibîne, xuyaneke din jî dibîne ku em wê nabînin. Gulbîn e ew û ev xuyan, di heman demê de xuyana dayika wê ye jî. Ji ber ku Dilawer Zeraq tevger, liv û lebat û axaftinên hevala Şermîn Gulbînê, bi dilovaniya dayikekê dide; *"Gulbînê hay ji vê yekê bû û mîna dayikek ku li keça xwe biqehire; – Haydê, haydê...! Dek û dolavan li min negerîne! Îro tiştek di te de heye! Lê nizamim çi..."*(18) dibêje û jê pê ve jî çîroka xwe ya bi mêran re kite bi kite ji Gulbînê re vedibêje.

Çîroka Şermînê bi sê karesatan e (giş jî bi sosret in) û ya yekê wê di demên wê yên lîseyê de zevt dike; *"Beriya şeş salan... Wê hingê min lîse dixwend. Di pola duyemîn de bûm."*(19) Xelo, tolazekî ku sê bişkokên jor ên kurtika wî vekirî ye û sînga wî jî bêpûrt lê mêrane ye, bela xwe di Şermînê dide û rojekê, wekî dîkê qoqo xwe qure û kuşpene dike û ji Şermînê re dibêje: *"Şermîn xanim!.. Agirê dilê min li te geş bûye. Ji îro pê de tu de'wa min î, te fêm kir!?"*(20) Na xêr, Şermîn tê nagihê ka bê Xelo çi jê dixwaze û jê gelek bitirs e û pêlewane me yê fisfisok jî kuçe û kolanên bajêr ên bêhejmar, bi tûka xwe av dide û di pîlanên xwe de kar û peywirên kevanîtiyê jî li Şermînê parî dike. Belê, wekî ku li jor jî hatibû gotin Şermîn êdî *"de'w û doz"* û *"bîrdoza"* Xeloyê sîngbêpûrt e û di dawîya çîrokê de tiştê ku em jê dipên, dike: Quretiyeke din li ser quretiyên xwe yên pûç zêde dike û bi şaştêgihîştinekê re, tavilê dev ji de'wa (doza)

xwe berdide; *"Dêlik ne hêjayî evîna min in!"*(21) Şermîn şîmaqeke baş jê dixwe û serqûnkî li erdê dikeve; *"... şîmaqekê wisa hişk û tund li bin guhê min xist ku ez berepaşkî û serqûnkî li erdê ketim."*(22)

Li dû vê çîrokê Şermîn, minêkar e ku ya duduyan jî vebibêje lê ji aliyekî ve jî xwe difisfisîne, xwe giran dike û naxwaze tûrikê xwe jî welê zû bi zû vala bike, belam carekê dest pê kiriye û êdî veger tune ye ji bo wê: *"Me carekê dest pê kir. Divê em hebanika xwe biweşînin, got û domand."*(23) û çîrokê jî serî heya dawî vedibêje ji Gulbînê re. Îcar li zanîngehê ye û axir vê carê ew bela xwe li xortekî dide, li Seyîtxanê jixwerazî, çeleng û zarxweş;

"Ew roj bû destpêk... Di hemû rojên li dû wê rojê de, her ku çû dilê min bi Seyîtxan ve hate girêdan. Hema bêje her roj em digihîştin hev."(24) Dema ku qala rêzebûyeran dike û hêdî hêdî ber bi dawiyê ve tê, kela giriye jî lê radibe; *"Çend dilopên ji girîna ku ji ber hesta mixabîniyê ye, li ber çavên wê biriqîn û bi dengê ku êdî ji arambûnê kerixîbû, domand."*(25) Jiyana Şermînê ya xwendekariyê bi rêza xwe ya di pirtûkê de bi kurtayî wiha hatiye honandin:

- Şermîn ji malê derdikeve diçe zanîngehê û ji zanîngehê derdikeve diçe malê.

- Baweriya wê bi xwe jî û bi kesên din jî nemaye.

- Dike nake nikare bêbawerîtiya xwe bişikêne.

- Dixwaze, lê nikare.

- Dilê wê ji vê yekê teng dibe.

- Ew jî dixwaze wekî hemû xwendekaran têkeve nav mirovan.

- Bi wan re bide û bistîne.

- Xwendekarên di pola wê de çi keç, çi jî xort zû li hev banîyane.

- Dilê xwe li oxweşî û rihetiya wan dibijîne.

- Ajda, keçeke cîrana wan e ku du salan li pêş wê ye, ji paş de digihîje wê.



• Şermîn bi hişkî vedicinîqê û ji vecinîqîna xwe jî dibizde.

• Şermîn pêşniyaza Ajdayê erê dike û bi hev re li baxçeyê çayê, li bin dareke tûyê rûdinên.

• Tev li civata heval û nasên Ajdayê dibe.

• Seyîtxanê xwe jî li wir dibîne.

Di vê çîrokê de ji hêvîşikestinên Şermînê pê ve, tişteki din heye ku hêjayî gotinê ye, ew jî, helwesta Seyîtxanî ye ya -nexasim- li hember jinên mîna Şermînê. Em ji tevger û axaftinên Seyîtxanî tê digihên ku ew xortekî, heke ne welatparêz be jî, çepgir î kitêbî ye û bîr û boçûn û zanînen xwe yên der barê jinan de, bêhtir ji belavokan û ji kovarên mişt bi propaganda wergirtine. Bi dû gotina; "*Seyîtxanê xebata gel bidomîne...*" (26) Şermînê dibêje; "*Wey hema di wê gavê de devê min bişikiya û deng ji min derneketa. Seyîtxanê awirtûj! Xaloyê hevalên xwe... Mîna şêrekî gurmijî. Kef û kunc bi devê wî ketin. Rabû ser piyan. Ji civatê re got,*" (27) re, Seyîtxan çî tê ber devê wî, ji Şermînê re dibêje, ya rast di rûyê wê de dipijike; "*Ev keçik... Şermîn! Ji bo ku ez hevaltiya dilînê pê re deynim ketiye nav kom û civata me. Min di destpêkê de got belkî em ê karibin wê ji xwe re wekî dost û hogirekê bigirin. Lê na! Wê çend caran zor da min ku ez di meşa kolanan de bi destê wê bigirim. Hema derd û kulên wê mêr û hezkirina mêran e!*" (28) Û ne hewce ye ku em rewşa Şermînê ya di wê kêlîkê de qal bikin... Ji ber ku, bi dû vê şerpezebûyînê, Şermîn vêca qala yekî din dike ji hemraza xwe Gulbînê re û dibêje ku; "*Hîna sê meh in me hev nas kiriye. Ew ji civata hunermendan e.*" (29) Û dema ku meseleya huner û hunermendan tê navê, gur û guman jî zêde dibin. Şermîna me, di vê pêwendiyê de jî bi ser nakeve û xweziya xwe bi carekê dadiqurtîne. Mixabin, xortê dawîn jî, homoseksuel derdikeve û Şermîn cara sisêyan serqûnkî li erdê dikeve.

ŞEVÊN WINDA WÊNEYÊN MEÇHÛL

Piştî Bişîrîna Şermînî, di kewçêra sala 2005'an de yekem romana Dilawer Zeraqî derçû. Navê romanê *Şevên Winda Wêneyên Meçhûl* (30) bû û her çiqas pirtûk wek pirtûkeke çîrokê hatibû binavkirin jî, ji hêla form û tevn û vegotin û sazkirina vegotinê, bêhtir bi ser romanê ve diçû û jixwe wisan bû jî.

Şevên Winda Wêneyên Meçhûl, her wiha yekem vebêjeya dirêj a Dilawer Zeraqî bû û bi awayekî bêsekin hatibû lêkirin. Roman *Dayikên Şemiyê* jî xwe re kiribû mijar û ev yek jî, bi ya min çêjeke nû bû di romana kurdî ya modern de.

Zeraq, bi gotineke nivîskar, helbestvan û siyasatmedarê Frensî Alphonse de Lamartîne (bi navê wî yê êsil, Alphonse-Marie-Louis de Prat de Lamartine) dest bi romanê kiriye; "*Carinan ku kesek jî jê kêmbibe, mirov dibêje qey dinya vala bûye.*" û xwestiye ku hîn di destpêkê de em rûbirûyî peyvên wek "kêmbûn" û "valabûn" ê bibin, ji ber ku roman, li ser van peyvên an têgihan ava bûye.

Di romanê de em bi vegotinên keçikeke xwendekar ku li Stenbolê dijî û dixwîne û di heman katê de jî di kafeyekê de kar dike re, derbasî çîroka wê dibin û ji devê wê, em dibin şahidê jiyana wê ya li bajêr; "*Sê meh temam bûbûn ku ez hatibûm vî bajarî.*" (31) Keçik li wargehekê bi cî bûye û rewşa wê ya aborî jî, zêde ne baş e. Heta bi wê ku ji hevaleke xwe bi deyn pere dixwaze û bi vî deynî re, hestên wê yên xîretê bi carekê şiyar dibin. Rûtirşiya keçika hevala wê ya di wê kêlîka deynxwestinê de, ji bo dest bi karekî bike û debara xwe pê re bike û barê bavê xwe jî hinekî sivik bike, dibe deliveyek, "*Çi dibe bila bibe, divê ez di van çar salan de ji bo deqeyekê jî nebin hewcedara tu kesî.*" (32)

Kafe, li rasta Kolana Îstiklalê ye û paceyeke wê jî li pêşberî Meydana Galatasarayê ye û keçik, ji bo ku bikaribe bi rihetî li meydana temaşe bike, sendeliya xwe piçekî nêzikî paceyê dike. Di wê temaşekirina yekalî de dibîne ku her roja şemiyê kom bi kom keç û jin û dayikên meydana, "*Min li dayikan, li jinan temaşe dikir.*" (33) Vê temaşekirinê, dixwazim veguhezînim ser çîroka *Bişîrîna Şermînî* û neynika di wê kafeya ku Gulbîn û Şermîn lê de. Şermîn di wê neynikê de tirs û xofên xwe yên ji mêran wergirtî didît, lê digel hindê jî, ew li şox û şengî û ciwaniya xwe ya ku jê piştrast e, temaşe dikir, wekî ku bixwaze bibêje, "*hîn ez li ser xwe me*", awir vedidan. Me gotûbû ku Şermîn, di neynikê de yeke ku ji me ve naxuyê ye jî didît, yanê di rûyê Gulbînê de, hemû tirs

û hêvîsikestinên diya xwe. Di Şevên Winda û Wêneyên Meçhûl de keçika me ya xwendekar, li ber paceyê rûdinê û dem bi dem bi awirine meraqtije li derve, li Meydana Galatasarayê temaşe dike, yanê li wêneyên meçhûl, li wêneyên ku di destên keç û jin û dayikan de ne; li wêneyên ku çu agahî der barê wan de tune ne, li wêneyên ku kes nizane bê çî bi serê wan de hatiye. Heke ne şaş bim li Arjantînê bû, bi demekê dayikên me yên Arjantînî bi wêneyên keç û kurên xwe yên windabûyî dimeşyan, lê bi cudahiyeke, di wan wêneyan de cihê serê wan keç û xortan bi awayekî xweş hatibûn qewirandin, yanê çavan bi tenê gewdeyên wan didîtin, wekî din valahî bû.

Zeraq, serê ewil valahiya keçikê şanî me dide, *"Heta niha, ji xeynî yên ku di televîzyonê de nîşan didan, min tiştekî wiha, tiştekî bi vî rengî nedîtibû; min tu car nedîtibû û nebûbûm şahid û govan ku mirov, bi taybetî jin, li derve, li kuçe û kolanan li hev bicivin, bi qîrîna sloganan bimeşin û bi dem û wextên diyarkirî li erdê rûnên."*(34) dûre me jî dike şahidê jîholêrabûna wê valahiyê û bere bere berê me dide kakilê çirokê, yanê çiroka Seyrana Kurd û jiyana wê ya ji şevên winda û wêneyên meçhûl pêkhatî.

Heta bi cihekî, keçik bi xwe jî yeke meçhûl e, em bi tenê du caran pêrgî navê keçikê dibin, em hîn dibin ku navê wê Yasemîn e, lê navê Seyranê kêmûzêde sî caran (ev hejmar ne girîng e) derbas dibe. Wekî din, navên kes û kesan ku di romanê de derbas dibin û rasterast bi jiyana Seyranê re têkildar in, ev in:

Mala Bişarê Çeto: Leqeba Faris e

Bişar: Navê bavê Faris e

Faris: Navê hezkiriyê Seyranê ye

Seyran: Navê evîna Faris e

Sevdîn: Navê birayê mezin ê Faris e

Sêvê: Navê dayika Sevdîn e

Arzû: Navê keça Seyranê ya yekemîn e

Çekdar: Navê kurê Seyranê yê yekemîn e

Çiyager: Navê kurê Seyranê yê duyemîn e yê ku diçe ber rehma Xwedê

Şevîn: Navê keça Seyranê ya duyemîn e

Mucahîd: Navê kurê xalê Faris e

Şevên Winda Wêneyên Meçhûl, wê ji xwendevanên ku hînî karakterên mîr û mîrxas bûne re hinekî ecêb were, lewre roman, awayê romana ku li ser karakterên mîrane ava bûye, serobino dike û bi vî helwêsta xwe ya femînîst jî, ji niha de cihekî girîng di romana kurdî a modern de girtiye.

(Dê dom bike)

JËRENOT

(*) Teoriyên Rexneyê (Eleştiri Kuramları), Werger: Tahsin Yücel, Weşanên Kuzey, Çapa Yekem, Îlon 1984.

(**) Heman berhem, r. 14.

(***) Gava Ku Masi Tî Dibin, Helîm Yûsiv, Roman, Weşanên Lîs, Gulan 2008.

(****) Ji pêşeka Teoriyên Rexneyê (Eleştiri Kuramları), r. X.

1 Kakil, Dilawer Zeraq, Weşanên Sî, Adar 2002.

2 Çiroka Kakil, heman pirtûk, r. 27.

3 Çiroka Kakil, heman pirtûk, r. 28.

4 Çiroka Kakil, heman pirtûk, r. 28.

5 Çiroka Kakil, heman pirtûk, r. 30.

6 Çiroka Kakil, heman pirtûk, r. 31.

7 Çiroka Kakil, heman pirtûk, r. 31.

8 Çiroka Kakil, heman pirtûk, r. 32.

9 "Nivîskarê Baş", Walter Benjamin, Parîltîlar, Weşanên Belgeyê, r. 47.

10 Bişîrîna Şermînî, Dilawer Zeraq, Weşanên Aram, Kewçer 2003.

11 "Jiyek Cemidî Di Hemêza Tîrmehê De", heman pirtûk, r. 94.

12 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 35.

13 Pîrsa Gulbînê, ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 35.

14 Xweşiya Dîtarî û Sînemaya Vegotînî, Laura Mulwey, werger: Abisel, bnr.

<http://www.filmnor.org/default.asp?sayfa=65>

15 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 35.

16 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 35.

17 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 35.

18 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 35.

19 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 38.

20 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 41.

21 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 43.

22 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 43.

23 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 44.

24 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 48.

25 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 52.

26 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 53.

27 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 53.

28 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 53-54.

29 Ji çiroka Bişîrîna Şermînî, r. 57.

30 Şevên Winda Wêneyên Meçhûl, Dilawer Zeraq, Weşanên Lîs, Cotmeh 2005.

31 Ji Şevên Winda Wêneyên Meçhûl, r. 10.

32 Ji Şevên Winda Wêneyên Meçhûl, r. 11.

33 Ji Şevên Winda Wêneyên Meçhûl, r. 12.

34 Ji Şevên Winda Wêneyên Meçhûl, r. 13.

35 Çilkên Pênûsê, Dilawer Zeraq, Weşanên Lîs, Adar 2009.

Strî û gul

Dilşêr BÊWAR

Lê lê kezîkurê! Te agir berda cîgera min
Bi kenê xwe yê payîzokî
were porê xwe yê qurîşk bialîne lî dor
xeyalên min ên serjêkirî
Bi rondikên xwe yên ji agir bikewîne devê
birinê

** ** *

Lê lê kezîkurê! Bes! Êdî nexemilîne
kevalên ji cendekên min bi pênxwînê
di ser giyana min de danewêşîne tîrên
kul û xeman.

Bi ava Zê av bide gulên kaviştanê

** ** *

L ê lê kezîkurê! nesoşîne kezeba daxdaxî
Kêl neke êş û janên peritî bi şûjinê
Qîr û giryan e, şerê xal û xwarziyan e
Lê lê çavnûtîkê awirşûrê
Bifirîne serê penceşêra Kurdistanê

03.03.2009

Veqetîn

Baxdat ARDA

li vî bajarê ku biyanî
dîsa ji beskura te janê dimêjim
ji dev, bêvil, devling û paniyan xwîn diherike
hest û ramanên min lehî lê rabûne
lê ez kêfxweş im wek mazoşîstekî
bi êşê re şa dibim
ez dikarim serê xwe li ber giyotînê ji bitewînim îro
ne xem e
min got ez kêfxweş im
ji ber ku ez hatime merheleya dawiyê sekinîme
yan ez ê giyan û goşt ji hev veqetînim û herim
yan jî ez ê te ji xwe veqetînim tu dê herî

"Bo çi hemû mirovên dijîn, dixwazin hemû mirî bêdeng bimînin"

Ji min re bibêjin Îsmâîl

Yavûz EKÎNCÎ

Li dûrî her kesî li serê wî çiyayî hatim kuştin. Cesedê min li wir ma. Diya min bo min her û her got, nemiriye. Lê belê ez li wir mirim

(Herman MELVÎLE)

Ji min re bibêjin Îsmâîl. Di bin ezmanekî ku şînboziya wî jê şeqitiye min xwe vezelandiye, radikevim. Ji bo gora min winda nebe li ber ser û lingên min hema ferşekî cûn ji neçikandin. Bo cesedê min were definandin tu merasîm jî nehat lidarxistin. Ne mele ne jî keşîş ayetên pirtûkên pîroz xwendin. Canê min li ser textê teneşîrê nehat şûştin. Û li ser kevirê mûsalayê jî nehat danîn cesedê min. Cenazeyê min ji merasîman, ji orf û adetan bêpar ma. Li serê çiyayekî bera min dan û mirim. Leşkerekî wekî min carinan li bestekê carinan li deştekeke ku bi ber dawîbûnê ve dirêj dibe, carinan jî di kozika ku xwe lê vedişêre de tê kuştin. Û muhtemelen cesedê wî li cihê ku lê tê kuştin dimîne. Mirim. Di singê min de şewatek peyda bû. Min tê derxist ku xwîna min sekinî. Tiliyên min sist bûn, çeka min ket erdê. Dengê çeka min î ku gava li erdê ket hat guhên min. Çongên min fisiyan. Li hewa vir de wê de çûm û hatim. Li dora xwe zîz bûm û bi êşa singê xwe yê wesle wesle ve deverû çûm erdê. Stirî û bixuşk di destê min re çûn. Çonga min a li kevir ket şikest. Gava ez li erdê diqirqilîm gule bi fîqefîqên xwe yên erjeng di ser serê min re diçûn. Bi zorê min destê xwe bir ser singê xwe. Destên min giş bûn xwîn. Min li tehtê ku çend metre li paş min bû nihêrî. Gule li kevirên derdora min diketin. Min hewl da ku xwe bikişkişînim tehtê paş xwe. Halê min nemabû. Gavek cih bi min gelekî dûr dihat. Min digot qey ez ê qet negihîjim wê. Heta ez gihîştim paş teht ez di nav xwîn û xwêdanê de mabûm. Min piştî xwe da wî tehtê hişk û bêhnên kûr stend û berda. Her ku min bêhn

dida û distend di singê min de şewateke giran peyda dibû. Ez gēj dibûm. Min destê xwe yê diricifî bir ser singa xwe. Şilbûneke germ bi ser destê min ve diherikî. Bi çavên nîvgirtî min li ezmanan nihêrî. Roj... Teyrên dirinde li hewa zîz dibûn. Ez li diya xwe, ya ku her hêvî dikir ez ê rojekê vegerim, fikirîm. Bi rojan wê li benda min be. Wê qet bawer neke ku ez mirime. Ew ê goreke min î ku gava bêriya min bike û here ser bigirî jî çênebe. Ev rewş bo dayikekê çiqas janeke mezin e. Min ev tiştên hanê ji bala xwe avêt. Çavên diya min ji ber çavên min nediçûn. Min li ezmanan nihêrî. Û ez li wir hema werê mirim. Li serê vî çiyayî gava ez mirim kes bi ser min ve daqûl nebû û negot; "Ji kerema xwe re nemire tu yê bijî." Tenêtiya wê kêliyê, hêviya min î jîyanê ji binî ve birî. Ji ber ku tu kes li ba min nîn bû mirin yek car nedihat kişandin. Tirsî mayîna cesedê min î li vir dikir ku ez xwe bixwim.

Ji min re bibêjin Îsmâîl! Li dûrî her kesî li serê wî çiyayî hatim kuştin. Cesedê min li wir ma. Diya min bo min her û her got, nemiriye. Lê belê ez li wir mirim. Kincên li min kevn bûn. Saeta bedena min hêdî hêdî xera bû. Sewalên ku wê bêhna goştê xerabûyî, ya bê dida ber xwe û li çol û çepelan digelandin, çawa hilanîn xirpişîn ser cesedê min. Sîsark, rovî, wawik gur... Di laşê min de kurmên gewr peyda bûn. Kurmikan her roj hinekî din laşê min xwarin û misêwa pir bûn. Li vir reşetariya gorekê jî tune bû. Min her tişt weke berê didît. Bi qasî tariya şevê, reşikên çavên min jî li hember tiştên ku min didît, bûbûn tas û ziq sekinîbûn. Kurmîkên ku dêmên wan î mîna qîrê, lêvên wan î bêxwîn û bi çavên wan î ku agir jê dibariya, pir dirinde dixuyan, çûn

û hatina diranên wan î zirav û tûj xulkê min teng dikir. Ax teyr û tilûrno... Ew teyr û tilûrên şêrîn... Li vir veguhezîbûn mexlûqatên dirinde. Xwîna ku ji nikulê wan diniqutî, perikên wan î spîboz dilewitandin. Gava ku bi nikulên xwe goştên min hilqetandin, xezeb ketibû çavên wan. Nikulên xwe yên bi xwîn bi binê baskên xwe paqij kirin. Nahperûşkên wan ji canê min parçeyên goşt radikirin. Li serê vî çiyayî hemû giyanewer bûbûn mexlûqatên dirinde. Gava ku teyran beskurka xwe tije kirin û ber bi hêlîna xwe ve firiyan vê carê jî lawirên ku derketibûn nêçîra şevê li talanê cesedê min xistin.

Ji min re bibêjin Îsmâîl! Min her tişt dît. Reşetariya wê gora ku mirov ditirsand li hember tiştên ku min dîtîn bi qasî bihuşteke ku ji mirov re hatibû qewlîkirin, xweş dihat. Wexta bedena min di binê rojê de diheliya dilê min dibijiya wan miriyên ku di binê çîman de razayî ne. Ew ê merivên wan herin ser gora wan û wê karibin bibêjin "hezkiriyê min, kurê min, diya min, bavê min..." li vir definkirî ye. Ez pir li ber dayika xwe diketim. Gora kurê wê ya ku here li ser bike kûrekûr jî tune bû. Ji ber laşê min î lawaz û çîçîlaskî, hestiyên min man. Hundirê hestiyên min jî moriyên birçî talan kirin. Bayekî tûj teyr û tilûr tirsandin, pel û pelûş da ber xwe bir diyarên dût. Mîna pelên payîzê ro bi ro bîranînên min ên di derbarê mala min, hezkirîya min û zaroktiya min de, bi bê re li ezmanan belav bûn û çûn diyarên dût. Tenê hestiyên bêrih û bêgoşt man. Hestiyên ku bi baranê tîn şûştin û bi rojê tîn biriqandin... hestiyên ku hesta netîştekbûnê bi mirov tev radike...

Ji min re bibêjin Îsmâîl! Malbata min ev nav li min nekir. Bi vî navî kesî gazî min nekir. Di qeydên dewleta ku ez hemwelatîyê wê me de jî bi vî navî neqeydkirî me. Xwedê dizane heta niha li Midûriyeta Gelheyê, dosyeya min ji nav refên zindîyan, ji arşîva xwe ya giştî derxistine û xistine nava refên miriyên ku bo rizandinê hatine terikandin. Di binê ezmanê şînboziya wî jê şeqitî de, gava min lê dimeyzand bê çawa hêdî hêdî laşê min dibe

ax, ji nişka ve Xwedê ji min xuya bû. Heta wê rojê jî dinya li ber çavên min çoleke vikîvala bû. Hin caran min dengê lingên moriyên ku di hundirê hestiyên min de dimeşîyan dibihîst. Bi xuyakirina dîmenê Xwedê re, te digot qey dîwarê hemberî wan xerabûyî ye, ba bêperwa gobilî. Dengê lingên moriyên mîna erd û ezmên kerr bike gur bû. Di kûrahiya binê erdê de humegumeke dişibiya qêrîna zelzeleyê bilind bû. Ji nişka ve hemû gewdeyê min lerizî, min tişteke ji hev dernedixist. Her der reşetarî bû. Bi dengê berz û qewî got "Vebêj." Ji ber ku hestiyên min li hev diketin, dengê teqeteqê dihat min gote "Vebêj! li ser navê hemû goriyên weke xwe vebêj!" Ezmanekî reşetarî yê bi qasî dilê mirovekî kumîşî ser min. Hestiyên min ên ku bahozan tajan kiribûn, rojê şewitandibû û baranê şûştibû dirikrikîn. Hişê min ê jî êşê, ji acizbûnê û ji bendemayîne westiyayî, ji nişka ve ket xeweke tije kabûs. Gava min di nava nîvxewnan de bi giraniyekê çavên xwe vekir roj hêdî hêdî bilind bûbû. Wechê ezmanê reş ronahiya sibehê ya zenûn bi pey xwe ve dikişkişand û di ser hestiyên min re dibihurîn. Min çavên xwe girt û ketim mitalan

Ji min re bibêjin Îsmâîl! Min ev nav li xwe kir. Çîroka xwe min li ser navê hemû kesên ku dişibiyan min vegot. Yên wekî min bi mirinê re xwazgînî ne, çîrokên wan wekî hev in. Ez li serê çiyê hatim kuştin, yekî din li şikeftêkê... Yekî din li nav deviyan hat kuştin. Di encamê de an em hatin kuştin an jî me kuşt. Ev jiyana me ye. Ez bi rojan bo bêm kuştin an jî ji bo bikujim, hatim perwerdekirin. Gava min çek li yekî kişand ji bilî hedefa hemberî xwe ez li tişteke nefikirîm. Ez qet li hezkirî, dê, bav, zarok an jî hevalên ê ku min ê ew bikušta nefikirîm. Ez bawer im ku yê ku çek li min kişand jî, ji bilî kuştina min li tu tişteke nefikiriye. Nîşanî singa min kir û tilîkêş hêdî hêdî bi ber xwe ve kişand. Tev de ev bû. Gava min bi êş û jan got "ez hatim kuştin" min qîrînên kêfxweşiyê yên qesasê xwe, ku digot "min kuşt! min kuşt" bihîst. Çiya li dora min zîz dibûn. Bi dijarî min bêhn distend. Çeka min ji nav lepê min şemitî ket erdê û ez jî bi ser de terpilîm erdê. Bi gulereşandinê re

birûsk ji kevirên dora min diçûn û gule li keviran diket û hey dipengizî. Min xwe bi erdê ve zeliqand û min xwe kişkişand paş teht. Dengê çekan, bêhna barûdê, bêhna xwînê... Min tû kir erdê. Tûka min bi xwîn bû. Min cizdanê xwe derxist û bi keserên tûj li fotografan nihêrî. Min got qey ez ê careke din wan nebînim. Tîrsa mirinê hêdî hêdî tev li bûneweriya min dibû. Ez li roja ku min nû rahişt çekê ramiyam. Peyvên wî zilamê birûstûr û bejnqut ji nişka ve hatin bîra min. "Di vî şixulî de mirin heye, leşker di nav sî û tavê de, bêyî ku zanibe ji ku derbe hat koç dike dinyaya din. Bêtevdirîyeke biçûk wê bibe sedema mirina we." Ez mirim. Gava min xwest ez bibim leşker hê simbêlan neavêtibûn ser lêvên min. Pûrta heram hê nû bi min ketibû. Bo dahatûyê gelek planên min hebûn. Hin caran ez li tiştên ku min ê di çil saliya xwe de bikirina jî fikirîbûm. Şeva ku ez ê ji malê veqetiyama, ez ketim odeka xwe. Min derî kilît kir. Ji bo ku wext bibihure heta ji min hat min hêdî hêdî kincên xwe ji xwe kir. Bi kişandina keserên tûj re min xwe li ser nivînan dirêj kir. Bi saetan min hewl da, da ku ez di xew re herim. Lê bi qasî misqalekê jî xew neket çavên min. Sibê zû gava ez ji malê derketim dinya ne xweş bû. Li şûna wê hewayaya germ û şînboz, hewayeke sar, şilope, bi berf û mij avêtibû ser bajêr. Hemû tiştên ku dihatin gotin, hêleke guhê min jî xwêy nedida. Min nedixwest ez li yekê jî guhdarî bikim. Yên ku şîret li min dikirin, jîrikên ku rê li ber min dixistin, ên bi mirinê û kuştinê xwe serbilind dikirin... Ez ji deriyê ku bi salan e ji hêla bahozan ve tê tajangkirin, bêyî ku ez li dû xwe binihêrim derketim derve. Ez di kolan û zikakên bajêr re meşiyam. Di cemedanê pişta min de çend îşlig, çend binkinck, amûrên rihqusandinê û goreyên min hebûn. Ji nişka ve berfa şilope vekir. Mij bi lez belav bû. Pişt re ezmanekî sayî xuya bû û tîrêjên rojê dîsa avêtin ser peyarêyên ku şil î keldûman jê diçûn. Rê û kolanên bédeng ji mirovan xirxilî. Li derve rojeke biriqok û ronak, li ser rîyan makîneyên bi xurxur, mirovên ku bi kêf û coş ji xwe re dimeşîyan, dengên mirovên ku di paceyên malên xwe de bi şeng û şox dikenîyan dihatin. Di nava van tiştan de zivêr

bûm. Ez li makîneyekê siwar bûm û berê xwe da xerajê. Li otobosê siwar bûm. Min li koma xortê ku wê biçûya leşkeriyê li ser milê xwe kiribû û radikir hewa, nihêrî. Belkî jî piştî demekê heman mirov wê têkevin bin darbesta bedena wî ya bêrih û bibine goristanê. Girseya ku destên xwe li ba dîkin, li pîspîskê dixin, ramûsanên ji hev re dişînin... Û otobosê çiya, best, bajar û gund li dû xwe hişt. Min hewl da ku ji nav xirecira xerajê xwe bifilitînim û xwe bigihînim cihê ku ez ê biçimê. Li ber devê deriyê avahiyeke xûz rawestiyam. Piştî ku belgeyên min venihêrîn, ez birim hundir. Em derbasî odeyeke tarî bûn. Pênc şeş wechên reş ên li dora maseyekê civiyabûn bala xwe dan min. Tu yê sond bixwî qey civîna naletbûyîyên dogehê li dar bû. Min serê xwe bera ber xwe da, li axaftinên wan guhdarî kir. Û leşkeriyê wisa dest pê kir.

Ji min re bibêjin Îsmâîl. Ey ew mirovên ku di nav nivînên xwe de di xew de ne û em bo wan dimerin! Piştî mirina me we xwe qanih kir ne wisa? We wekî hemû caran li qadan got, hûn nemir in ne wisa? Lê belê ez mirim. Li serê çiyayekê ji hemû tiştan dûr. Min ji bîr kir. Weke ku ez qet çenebûbûm. Navên me tune ne. Tenê beramberî hejmarekê bû hemû jiyana me. Wî ezmanê ku beriya ez bimirim min lê nihêribû, di çavên min de ziq sekinî. Wê rojê ez fikirîm ku ez ê li vir bimîmin, wê laşê min hêdî hêdî belawela bibe û tune bibe. Ez giriyam. Ewîlî bi dengêkî nerm, ji ber ku hestên min tev rabûn ez giriyam. Hahanga bi hîsên kûr û tîr û bi dengêkî hêlan, bû îskeîska min. Wechê min li hember tiştên ku min dîtibûn, çeloxwarî û hêrsokî bû. Xwîna min bi gujeguj bi erdê de çû. Te dît we digot divê ax bi xwînê bê avdan. Ax ev xak. Ma ji kê re nebû gor! Çend xwediyên xwe, di nava xwe de heta mirinê di xwe de heland. Laşê min perçe perçe heliya. Min ji bîr nekin.

Ji min re bibêjin Îsmâîl.!

Wergera Ji Tirkî: Lal Laleş

Tarî bû her der
dema ku min cara yekem navê te bihîst.

Êdî bêhna te tê

Nesrîn NAVDAR

Ji wê rojê pêve
bûme evîndara te.
Digotin ku bejnek te heye
digihîje asîman,
dema milê xwe radikî
reqsa stêrkan e di nav tiliyên te de dibirsin.
Hinekan qala çavên te dikir.
Yek okyanûs e digotin,
hemû giyanewerên avê tê de mest dibin.
Çavê din ezman e digotin
di asoya wî de, dengê senfoniya
baskên balindeyan
navê te dibarînin
li ser rûyên ziwa...
Digotin ku keskesor e porê te,
her tayek rengê rûmetekê ye
her rûmetek netewek...
Li ser mêrga singê te, tevî hemû cudahiyên xwe
jiyanan kon vedane digotin
û bi sedan cure ziman baqa gulên rengîn in,
ji nav guldanka devê te
bi geşbûnî bêhna xwe belav dikin, digotin.
Lê me didît ku giyana me masiyekî nîvruh e;
li qeraxa okyanûsa çavê te diperpîte.
Balindeyên me baskîşkestî li dor xwe dizivirin.
Me didît ku rûmeta me hatiye bînpêkirin,
konê me xera bûye
û gula xwe, me didît
ku li ser qerqaza lêvên te aliqî maye.
Hema ku bikeve kurahiya wê

hûr hûr bibe!
Lê roj hat Rojek li me hilat...
Her balindeyek me bû teyrekî baz
ber bi şînkahiya asoyê te ve firîyan
û êdî, rûyê me jî şil bû
ji dilopên navê te.
Ji wê rojê pêve
Çem û robarên me gihîştin hev
ber bi okyanûsa te ve herikîn.
Hindik maye,
dê masiyê me jî têrî xwe oksîjenê bigire
ji okyanûsa te.
Dayikên me, ber bi qerqaza lêvan ve hildikişin
dê gula me, ji qeraxa qerqazê rakin
têxin nav guldanka te.
Ronî ye her der îro
û bêhtir bûme evîndara te.
Va ye êdî bêhna te tê
sibê dê destê te li nav destê me,
şînkahiya te li asoyê me,
keskahiya te li bejna welatê me be
û konê me ji hemû konan mezintir...
Tu dê bihejî li ser wî
di nav keskesora ala me de.
Dê ew roj bê, ger ez nebînim jî
ne xem e.
06/04/2009

Qermîçokan li keviyên çavan dixê giriyê bi

Goristana hêsrên rizyayî

Îrfan AMÎDA

Sîtavka ku di nav şaxên dara hinarê re diçizirî, li hinarkên rûyê Neslîxan Xanimê dixist. Lê Neslîxan Xanimê, Neslîşahê, nîvê kezeba xwe di paxila xwe de diguvaşt û ji cihê xwe nediliviya

tenê. Diderizîne awiran. Şopeke bizeng li rehên rû dihele. Lêv, kêlî bi kêlî pûç dibin. Zuha û terikî...

şer'a qewîn lê dihat birîn, hat guhê Qasim Axa û bi hêrs got;

Neslîxan Xanimê, kembera wê di dest de, kirasê meqşî yê hevrîşimî bi bejna tenik î zirav re dilerizî, bi daketina ji pêpelûka qesrê re, bi piştî destê xwe, rondikên ku li çermê rûyê wê yî westiyayî hişk bûbûn, paqij kir. Kesereke ku ji mêj ve ye di kalanê xwe de riziya, kûr kişand. Benda li ber bêhnê hilweşiya.

Tu bi şerefa min dilizî, tu bi hizûra mala min dilizî. A soxî tu bi peyva min dilizî. Tu yê piştî baskên min zimanê min, gotina min jî bişikênî. Destên min li ser bû li vî bajarî lê destên min dirêjî wir nabe got, dema ku Neslîxan Xanimê destê wî danî ser gerdana xwe. Birînen me yên riziya bi kefenên hêsrên me pêçayî ne diya Neslîşahê. Di mezêlên me yên vala de hê hêsrên me neriziyane xanimê.

Hê diricifîn bibikên wê, dema ku Sarê ket bergiya awirên wê yî bi bux. Bi buxa awirên xwe yên neçar li Sarê nêrî û berê xwe pê re guherî. Sarê xwe ji ber awirên Neslîxan Xanimê vedizî.

Hê destê Neslîxan Xanimê di nav rihanê de bû. Dizanibû ku Qasim Axa di paş perdeyê re li wê dinihêre.

Pêkên wê bi erdê ve dixijiqîn. Ber bi baxçeyê pêşberî odeya razanê ve çû. Milên wê pûç bûbûn. Bi zorê derî vekir. Dizanibû ku niha Qasim Axa, delalê ber dilê wê, li paş paceyê, di ber perdeyê re li wê dinêre. Lê dilê wê ranekir vê carê, bi bişirîna bibikên xwe yên zeytûnî, di nav mijangên xwe re wekî sîtavkeke esra teng, nermijî bibersivîne nêrîna Qasim Axa.

Li Qasim Axa nenihêrî.

Rondikeke xizêzî di nav qermiçokan re hêdî hêdî herikî û xwe bera nav bêhna rihanê da. Li ber her şitlekî, mezelek vebû. Ta bi ta da hev dengê xwe yî di ber mezelan de riziya. Têra hevokekê nekir.

Berê li ber rihanên ku seranser li tixûbên baxçeyî, bi destê xwe çandibûn rawestiya. Her du destên xwe, wekî ku porê Neslîşahê yê hevrîşimî, yê mîna liva berxikên mîjo biniwêze, di nav pelên rihanê de gerand. Bêhn kir û xist paxila xwe.

Ji emrê xwe, nav û dengê Qasim Axa û êşa Neslîşahê dawerivand. Ên mayî têra hêwîkirina mezelekî nekir.

Li Qasim Axa nenihêrî.

Di nav tiliyên xwe yên pûç de firidand tayeke rihanê, bi ser mezêlê vekirî de. Bi hêsrên xwe dagirt û di ber xwe de got: Mirov bi çend mirinan dibe deyndarê emrekî gelo?

Sîtavka ku di nav şaxên dara hinarê re diçizirî, li hinarkên rûyê Neslîxan Xanimê dixist. Lê Neslîxan Xanimê, Neslîşahê, nîvê kezeba xwe di paxila xwe de diguvaşt û ji cihê xwe nediliviya.

Li Qasim Axa nihêrî.

Bi piştî destê xwe çavên xwe paqij kir Qasim Axa.

Dema ku îskeîska Neslîşahê ya li paş deriyê odeya Qasim Axa ku şêwr û mişêwr lê dibûn a ku

Berê peyv riziya.

Xwircezîna dil

Fatma SAVCI

Di payiza emrê xwe de, me dest bi qurafa azadiya xwe dikir. Hêviyên ku me ji dêliyên jiyane kiribûn li erda giyana me diçirisîn. Miştaxeya daxwazên me, ji kena dibiriqîn. Xurcezînên dilê me, ji stêrkan misêwa dibûn. Di cîrnên êşan de, me canê xwe diesirand, buhayê heft zeman bextewarî, dimsa xweşiyê diafirand.

Cêziya xeyalên me bilind dibû, destên zarokatiya me jî hew digihîştê. Me li ser pelê çilo hew hêstirên Pepûkê didan hev. Me tenê bindariya bav û birayan nekir êdî, di awirên dîlovan ên serfiraziyê de, heftsed reng û nawayê rozerînê didît.

Li gor saloxan, Pîra Sêhra pîfî ruhê keçikan kiribû. Loma bû di ciyên xwe de nedisekinîn û bi şikestina stûyê gula nava xwe re ne qaîl bûn.

Zû de ye, me dil hebû di xewneke zîvîn re derbas bibin. Bîbikên çavên me bişîbin xalên avê, çûk ji kenê me biwelidin. Ji berêvara temenê me, nefela sêpelkî kême nebe û beriya hemû biharan bigihîjin rihê axê.

Xebînet e. Kesek niha bi pey kulîlkên ku di nav nexşên keçikan de diçilmisin nakeve. Kes nabîne ku gelek ji wan hew xeyalên xwîngîrî dihiwêzin. Xem nake, bila ew giriyên xwe di piştê xwîn û êgir de veşêrin. Bila dilê wan yeko yeko biniqute.

Bila kesek ji dil pirs neke: Çima ev jin wisa ji dil, wiha bi kul xwe dikuvin?

Erê em dizanin, ev dan, ne danê êvar û evîne ye. Hew şeveq di destên keçikan de dizê. Kenê wan çû ava, giriyê wan her kêlî dihibe. Sibehên xwe bi tu mizgîniyan xelat nakin.

Va ye bajar jî bê stran man, êdî herin awazên keçikan ji çiyê deyn bikin. Çavên wan jî mirinan bidizin. Herin talana av û êgir, bejnên wan rizgar bikin. Ku Dicle û Mûnzûr jî çikiyan, em ê ji kîjan çemê êtûnê vexwin?

Hele rawestin, wan çavşînkên ji berbiskên jinan venekin.

Porên wan, ji qeseb û morîkan neşon.

Mij û moranan ji çavên wan biweşînin.

Guliyên nifiran û kofiya şîne nedin destên wan.

Emrê wan ê şikestî bi azadiyê bicebirînin.

Xwîna keçikên kuştî bi ser rûyê cejnan de nebarînin.

Xezalan neterikînin û kanîka çavên keçikan neherikînin.

Ma hûn nizanin, em xwîniyên evîn û azadiyê ne...

Tazî*

Şevger ÇIYA

“Mizgîniya me li we! Serşoya pakbûnê vebû, bi xebatkarên şareza û pispore, ji malbat û gruban re erzanî heye, serşoya pakbûnê, Diyarbekir pak, mirovên diyarbekirî pak in. Navnîşan: Serê riya Elezîzê kîlometreya dehemîn, werin bibîn, bişon.”

Derî vedike dikeve hundir. Bêhna parfûmeke giran û xweş ji hundir tê, seranser diçe odeya xwe, di odeya wî de jinikek dirêj ketiye, jinik heta navtenga xwe tazî ye, her dû pêsîrên xweşik û gilover, gerdena spî, biskên nav piştê dikevin, lêvên sorkirî, çavên kilkirî, birûyên zirav, mijangên dirêj, pozê biçûk weke niqteyekê, dêmên sorsorikîbûyî, bi her halê xwe jinik doza bihevşabûnê dike. Li jêr tenê kirasekî tenik nahtoriya wê dike. Jinik wexta wî dibîne dikene, wî dawetî ser nivînan dike. Ew jî tê bê navber dest li newqa jinikê dilefîne, lêvên jinikê nola şekirê Amedê dimisîne, dest li her derê jinikê dipelîne. Her ku ew diperoşe û di goyê jinikê de dike pistepist jinik dikene, jinik kenên bi dengên bilind dike. Ew di nava xwîdanê de dimîne, laşê wî dilerize, bîbikên çavên wî mezin dibin, hiş ji serê wî diçe lê jinik hê jî dikene. Her çiqas ev tevgerên jinikê bêwate bin jî, ew dixwaze karê xwe biqedîne lewre dest davêje kirasê jinikê derdixe, du çîpên bêpûrt li hemberî wî disekinîn, wexta dest davêje derpî nikare derpî derxe, didexise. Çi dike nake nikare derpî ji jinikê derxe, jinik kena xwe bilindtir dike. Lavayê jinikê dike, na jinik tenê dikene. Di vê navberê de têdigihîje ku yek dixwaze derî veke, li rûyê jinikê dimêzîne, jinika ku heta wê çaxê tenê dikeniya bi pistepist dibêje “Wele mêrê min hat, dê min û te tev de bikuje. Bi lez xwe bike vê qulikê.” Li goşeyê odeyê qulikek tarî heye, xwe di cî de dike qulikê, di qulikê de difikire dibêje “Ev mal mala min e, jinik çawa ket hundir. Mêrê jinikê çawa zanibû ku jinik di mala min de ye. Jinik kî ye?” di cî de ji qulikê derdikeve, mêze dike

kevialeke mezin li nava malê sekiniye. Li hundirê çavên kevjalê dinêre jinik di hundirê çavê kevjalê de ye. Di wê navberê de divarqilê ku çipuryan e. Deriyê dolaba cilan vedike, tiştê di dolabê de nemaye, li der û dora xwe mêze dike ne perde, ne şeltê balif û lihêfê tiştê nemaye. Diheside, ji xwe şerm dike dibêje ez dê çawa biçim buroyê? Paşê di çavê kevjalê de dîsa jinikê dibîne, jinik serê xwe ji çavê kevjalê derdixe û dîsa bi heman şewazî dikene.

Serê sibê saet dora dehan de rabû, dîsa şeytan pê keniyabû. Ev bû hefteyek her roj şeytan pê dikeniya. Dîsa bi ava sar serê xwe şûşt weke rojên din. Gava ava sar li laşê mirov dikeve bêhna mirov diçike, mirov dilerize, belkî deh caran nalet li wî çavê şeytanê kor tîne. Wexta ji serşoyê derket hê nû hat bîra wî ku cilên wî yên paqij nemane, li berstûka îşlikê wî du pêçî qirêj hebû, ji binê çengê îşlikê bêhna xwêdana şeş rojan dihat. Bêgav heman kincên xwe dîsa li xwe kir. Di ezebiyê de cilşûştin kêşeya sereke ye, bi destan hem zehmet e hem jî rind paqij nabe, birina mala eqrebeyan şerm e lewre hem henekên xwe bi mirovan dikin hem jî dikin minet, tenê riyek dimîne ew jî bi pere kincên xwe danşûştin e. Ev yek jî rasterast nabe çare lewre hemû cilan bi hev re diavêjin makîne û cilên spî reş dibin, ên sor pembe dibin, ên reş jî gewr dibin. Çareya hêsantir û paktir kirîna makîneyekê ye lê ew jî pere divê.....

Wexta gihîşt buroyê êdî bûbû nîvro, hevalê wî li ser maseya xwe xaçepirs çêdikir, wexta

dît ku ew ket hundir serê xwe rakir silav da pê. Ew jî çû li ser maseya xwe rûnişt, li ser maseyê du sê kaxizên beredayî, li koşeyê maseyê çend pirtûkên zagonan hebûn, li ser maseyê xêvjimar nîn bû. Parêzerê me yê ciwan weke her rojî dest bi xwendina rojnameya xwe kir. Hê belkî nûçeyek neqedandibû, bi aliyê şîrikê xwe ve zivirî “kuro min îşev xewneke eceb dît, min dît jinikeke ji jor ve tazî di odeya min de ye, bangî min kir. Ji wê pê ve hewce nake ez qal bikim lewre tu texmîn dikî lê tiştekî seyr bû ku min çî kir nekir min nikaribû derpiyê wê jê derxim. Ew jî hema dikiya, wisa zora min çû, ji kerban hindik mabû bigirîm. Min carekê dît ku yek dixwaze derî veke, jinikê got ev mêrê min e. Ez kirim qulikeke tarî, ev qulik jî di odeya min de ye, paşê ez hizirîm gelo ev yek çawa dibû, hişê min negirt min çawa xwe ji qulikê avêt derve min dît ku kevjalêk li orta odeya min sekiniye. Ez çipuryan, hemû paceyên min bê perde, şeltê lihêf û balîfa min jî nîn in. Heman jinikê dîsa serê xwe ji çavê kevjalê derxist û dîsa keniya. Ez dewsa ku ji kevjalê bitirsim, ez difikirim gelo ez dê çawa biçim buroyê” bû pişkêpişka hevalê wî. Wî jî devam kir “Yaw ev xewn çiqas balkêş in, serê sibê dîsa min dît ku hemû cilên min qirêjî bûne, ev xewna min jî hat bîra min kena min hat.” Di vê navberê de telefona buroyê lêket, hevalê wî bersiv da, ew jî vegeriya xwendina rojnameya xwe. Hevalê wî telefon danî û bi zikopişt keniya. Wî jî bi nêrînên seyr li hevalê xwe temaşe dikir, li hêviya qedandina kena hevalê xwe bû. Hevalê wî got “Radyoyê veke û heke reklam derkevin bi baldarî guhdar bike.” Wî jî wiha kir. Piştî çend stranên kurdî radyoyê dest bi reklaman kir, hevalê wî ew şiyar kir got “Reklama serşoya pakhbûnê xweş guhdarî bike.”

“Mizgîniya me li we! Serşoya pakhbûnê vebû, êdî bila kes nebêje ez qirêjî bûm. Em serê we dişon, kerika guhên we, nav ranên we, pişt stûyên we, binê çengên we dişon, tu dereke we êdî qirêjî namîne. Rûvên we, rûyên we, binê çengên we diqusînin, neynûkên we, porê we jêdikin. Paqijkirin karê me ye. Bi xebatkarên şareza û pîşpor, ji malbat û gruban re erzani heye. Serşoya

pakhbûnê, Diyarbekir pak, mirovên Diyarbekirî pak in. Navnîşan: Serê riya Elezîzê kîlometreya dehemîn, werin bibînin, bişon.”

Faîq cara yekemîn bû ku ev reklam dibihîst, ew jî fena hevalê xwe ji kenan zikopişt bû. Ji hevalê xwe re got “Baş e, êdî ez dê biçim li wê derê serê xwe bişom, gelo mirov mîsteriyê daimî be dê erzaniyê çêkin?” Dîsa bû pişkêpişka wî, keniya. Hevalê wî sekinî li der û dora xwe meyzand, nefeseke kûr girt û got “Surprîza mezin ma dawiyê. Erê tu êdî parêzerê serşoya pakhbûnê yî.” “Çi!” “Dozger bi hinceta bêexlaqiyê, hilweşandina nîrxên manewî der barê serşoyê de doz vekirîye. Xwediyê serşoyê serî li kîjan parêzerî daye yekê/î qebûl nekirîye. Niha baro li min geriya got hûn hatine peywirdarkirin, her hal mêrik dawiyê serî li baroyê daye. Ji bo ku meha din min doza tecawizê girt, ev doz doza te ye.” Got “Baş e. Doz kîngê dest pê dike?” “Mehêk paşê, sibê rabe here bi xwediyê serşoyê re xeber bide, hev nas bikin.” “Erê lê çawa, belkî serê min jî bişon.”

Dotira rojê, serê sibê rojek ji wan rojên biharê yên Amedê bû. Di van rojan de ba û tav qayîşê dikişînin, aliyê esrê û destê sibê di bin hikumdariya bayê de, berevajiyê vê yekê nava rojê jî di bin hikumdariya tavê de ye. Ev alozî mirovan ditengizîne, mirov di rewşên wiha de bêriya zivistan an jî havînê dike her çiqas havîn germ û zivistana Diyarbekirê sar be jî mirov ji dêvla aloziyê birêkûpekiya sar an jî germê diparêze. Serê sibê wexta ket rê, dîsa bayê serweriya xwe dida pesendkirin. Li erebeyê siwar bû, serê riya Elezîzê nêzî serşoyê peya bû. Dema gihîşt ber deriyê serşoyê hemû xebatkar tazî bûn. Xwediyê kargehê Mihemed Beg -xelkê ew wiha bi nav dikir- ew jî tazî bû. Heta ew şaşwaziya xwe daqurtand, ji wî re kursiyek anîn, Mihemed Beg çawa ji diya xwe bûbû wiha li hember rûniştibû. Zikekî mezin û bipûrt, sersing, mil, pişt hemû bipûrt, di lingan de şimikên sor ên serşoyê hebûn. Mihemed Beg çay ji wî re xwest lê dilê wî hilnegirt, lêborîna xwe xwest, got “Ez tiştekî venexwim baştir e lewre reflûya min heye.” Mihemed Beg ofîniyeke ji kezebê kişand,

cixareya xwe ya qaçax pêça xist devê xwe, bi yek derbê cixare nîvî kir û dest bi xebardana xwe kir, her ku xeber dida dûxana cixarê hêdî hêdî ji dev û pozê wî dihat. Yekî/ê ji dûr ve binêriya dê bigota qey Mihemed Beg dişewite. Mihemed Beg digot “Niha weke her kesî tu ji meraq dikî gelo ev çi ye? Di dîne îslamê de şerm tune ye, kî ji xwe şerm dike xwediyê xirabiyê û gunehan e. Armanca min a sereke pereqezenckirin e. Ez axayê vî gundê hanê me, êdî cotyarî û gundîtî miriye. Titûn jixwe miribû çend sal berê, genim dîsa wiha nanoziko encax, îsal jixwe wa ye ev hişkayî ji çêbû ew jî mir ka bibêje em çi bikin? Ez biçim li Diyarbekirê hemaliyê bikim? Diyarbekirî ji sedî heftê, heştê bêkar in, birçî ne, dixwazin vegehin gundên xwe. Ez ne dizanim bazirganiya bajaran, ne jî dikarim biçim ber destê yekî/ê bixebitim ku dîtina vê yekê gelek dijwar e. Serê ewil min niyet kir em serê qopan, extiyaran, felciyan bişon. Wê demê bêtî ku reklama me hebe, rojê hema bibêje nêzikî bîst, bîst û pênc mirovî dihatin ji bo serşûştinê. Bi gelemperî mirovên zengîn dê û bavên xwe yên extiyar ku ketibûn ber destan, zarokên xwe yên qop û bêhiş dianîn, car jî ew birayên me yên xêrxwaz dînen kuçeyan dianîn ku em serê wan bişon. Karê me baş nebe jî, xirab jî nebû. Paşê ez têgihîştim, çi mişteriyê me bin çi nebin karê me kirine karê neletê. Her kes ji hev re dibêje ew diya xwe dibe dide şûştin. Ev êdî bûye dijmin. Ango em kirin qebrax, cihê me jî kirin kerxane, cihê ku her kes diçe û kes çûyîna xwe qebûl nake, her kes hev dike sûcdarê çûyîna wê derê. Li ser vê yekê min jî sond xwar ku ez hem ji vî karî pere kar bikim hem jî vî karî bikim karekî rojane. Ji bo ku ev yek pêk bê divê cara pêşîn xelk hînî vê yekê bibe angî divê nepenîbûna vî karî ji holê rabe, ew jî bi reklamê dibe, min reklama xwe da hemû televizyonên herêmî yên Diyarbekirê, di heman demê de me serê sibê dînen bajêr hemû top kirin û serê wan şûşt, ew tazî berdan kuçeyan, qiyamet li pey vê bûyêrê rabû. Ev dînen me yên paqij û tazî bi xwezayî kincên ku xelkê dan wan red kirin. Mêran li wan xist, zarokan bi kevîran berî wan da, dawîya dawîn Yaşoyê dîn kuştin. Binêr, her kes dizane bi kê re çi heye lê wexta ev

yeka hanê tê deşîfrekirin qiyamet radibe. Qaşo namûsa xelkê hatiye bînpêkirin. Li ser vê bûyera dilsoj min jî biryar da em hemû tazî bigerin. Bi ya min, wexta em karibin kincên gel ji gel bikin, şerma gel bişikênin hem dê gel zû qirêjî bibe hem jî dê bîn em serên wan bişon. Li derve xalî tîn şûştin, cil tîn şûştin, cilên nû tîn kirîn ku derpî, sutyen û atlêt di nav de, her kes diçe her dera xwe nîşanî doxtor dide şerm nîn e, ez dixwazim serê xelkê bişom ev yek şerm û guneh e? Ka destê xwe bide ser wijdana xwe û bibêje ev rewaya ye?”

Mihemed Beg, piştî vê axaftinê li cixareya xwe ya di xwelîdankê de mêze kir, cixare hemû bûbû xwelî, destê xwe dirêjî qutiya titûnê kir hinek titûn derxist, bi qasî ku lazim e bi destê xwe ji hev xist, kir nav kaxiz, kaxiz bi zimanê xwe şil kir, bi diranên xwe kaxiz jê kir, ew kaxizên ketin devê wî tû kir û dewam kir “Her neyse, ez ji birayê xwe yê ezîz re bibêjim piştî ku min û karkeran xwe tazî kir hinekan hatin gotin guneh e, hûn li hember Xwedê derdikevin, qaşo Xwedê gotiye xwe binixumînin. Ezîzê de tu bibêje rebê alemê me tazî diafirîne û paşê tazîbûna me dike guneh? Ev yeka hanê dibe? Heke ew bixwaze dikare me bicil biafirîne lê ew me tazî diafirîne nexwe tazîbûn emrê Xwedê ye. Ji aliyê din, hinekan hatin gotin hûn zirarê didin civakê, hûn rûmeta civakê bînpê dîkin, hûn ji pergale jî xirabtir in. Min jî got herin civak kî ye bila ew bê. Min baş negotiye birayê ezîz? Di vê civakê de keç bi pereyan tîn firotin, zarokên şeş heft salî li ser çopan kaxizan berhev dîkin, ji bo du qurîş pere bi hezaran mirov derdikevin nêçîra birayên xwe, di ba û bagera zivistanê de mirov li derve radikevin kes dengê xwe nake, civak tişteki nabêje wexta ez xwe tazî bikim ev dibe bêexlaqî? Ez vê yekê qebûl nakim kî dibêje çi bila bibêje, ez bi namûsa xwe pere qezenç dikim û dixwazim qezenç bikim. Kîjan xizan jî bê ber min ez dê her dem belaş serê wan bişom, ez ji feqîran pere naxwazim, ez dê serê dînen bajêr jî bêpere bişom. Xwedê me afirand em çima xwe ji hev veşêrin, wa tu her derên min dibînî ka çi bû? Ez dê dozê jî qezenc bikim ka min çi

tawanbarî kiriye, ez xizmeta gel dikim û pere ji gel distînim ka çi gunehê vê yekê heye, ka min kî bi zorê aniye vir û serê wî şûştiye? Belkî kincên min nîn in, an jî ez dixwazim xwe tazî bikim ka kî dikare bibêje çi? Xelk hemû dilê xwe dibijînin çaqên jinên tazî yên ku fistanê kurt li xwe dikin. Manken ji bo ku xwe tazî dikin bi hezar milyonan pere distînin, ew jî baca xwe didin ez jî baca xwe didim, ka çi cudahiya me heye? Ez mafdar im birako, ez mafdar im. Bi destûra Xwedê tu jî parastineke baş û bihêz binivîst ez dê ji dozê bifilitim lê ez dê heqê te jî bidim te, ez tu carî heqê yekî/ê naxwim. Birayê min ê xweşik, dirûvê yekî zana bi te dikeve, jinikê zarok jî girtin û çû mala bavê xwe bila biçe, ez çi bikim min xeta nekiriye, lawê min ê mezin dibêje te em rezîl kirin. Ka bibêje birayê min te zanîngeh xwendiyê, ev karê min xeta ye?" Faîq bi refleksa parêzeriyê got "Na em dê safî bikin, tu li ber nekeve. Bi îhtimaleke mezin em dê dozê xilas bikin."

Xatir ji Mihemed Beg xwest, vegeriya mal. Li malê cilên xwe hemû ji xwe kirin, çipuryan wexta li xwe nihêrî cara pêşîn bû ku tazîbûn ji wî re asayî dihat, digot niha ez şerm nakim derkevim derve bi vî halî. Di havîna Dîyarbekirê de mirov ji germê bêzar dibin, nexweş dikevin, ditengizin lê carinan xwe tazî nakin, heke cil tiştên ku mirov ji sermê diparêzin in çima havînan mirov xwe tazî nakin? Bersiva vê yekê li cem wî tune bû. Tiştêkî seyr li wî peyde bûbû, jixwebawerkirineke bêsedem hemû hişê wî talan kiribû. Ew îro hînî tiştêkî bûbû, vî tiştî hêz didayê. Cilên xwe li xwe kir, porê xwe şe kir, parfûma xwe li xwe kir û berê xwe da mala Xaltîka Eysê. Di van saeten de kolan hêdî hêdî vala dibûn, di kolana hunerê de tenê du sê nîqaşên dirêjbûyî, hinek bufe, dikanên araqfiroşan vekiribûn. Mala Xaltîka Eysê du kuçe ji kolana hunerê wêdetir bû. Li cihê zengînan her tişt buha ye, mala Xaltîka Eysê jî buha bû û li Ofîsê bû. Bi lez û bi biryar bi rê de diçû. Lez dikir lewre dizanibû lingên xwe sist bike û bifikire dê ji biryara xwe vegere. Wî di wê kêlikê de hemû dinya ji holê rakiribû, ji xwe re kiribû hember û dixwest li hember pev

biçe lê wext mirovan kedî dike, mirovan têk dibe karibû wî jî poşman bike, dîl bigire. Wî lez dikir. Xaltîka Eysê, di malan de keç difirotin. Ev bû serê du mehan e bêbiryar e biçe an neçe mala Xaltîka Eysê. Lewre êdî hevalên wî dibêjin em ji bo wî karî pere nadin. Her yekî ji wan ji xwe re yek dîtibû û bihevşabûn êdî rûtînek bû li cem hevalên wî ew hê jî weke berê tenê bû. Vê tenêbûnê ew bê hêz kiribû, her çiqas dixwest biçe mala Xaltîka Eysê jî dîsa jî neçûn ji xwe re kiribû meseleyeke jêneger. Dixwest ew jî rojek ji hinekan re bibêje ez pere nadim ji bo wî karî. Lê piştî du mehan ev cara yekemîn bû digot "Armanca sereke ya vî karî çêja ku mirov digire ye. Peredayîn an nedayîn girîng nîn e. Qey ez bêgav im, keçika hemberî xwe dilşa bikim. Ez pêdiviyeke xwe ji holê radikim ji min re çi heke ew jî dixwaze an naxwaze." Bi van ramanan li deriyê Xaltîka Eysê xist, yekê di kunika derî de mêze kir, paşê çû bangî yeke din kir ew hat wê jî mêze kir paşê derî vebû. Faîq bi şêwaza miştêriyekî herdemî got; "Wey ev çi ye? Qey ûris davêje ser malê?" Xaltîka Eysê got "Na ez qurban. Ev keçik nû ye te nas nake. Hema polês li pey me ne. Hê wan rojan ez ji nezaretê derketim." Faîq nola femandarekî serkeftî, bi xwe bawer got "Tu xizmeta gel dikî, dewsa ku pesnê te bidin, te tawanbar dikin, ez tiştêkî ji vê yekê fêm nakim." Hemû keçikên wê derê kenîyan.

Di salonê de li ser paldankê, di dest de piyaleya araqê, her du pişkojên jorîn ên îşlik vekirî, her du faqên xwe ji hev vekiriye, bi dengêkî nenizm distirê *"Cîran tê û tê ji Mêrdînê, cothê memikan dihejîne, ew kî kor e, cîran nabîne... herê cîran bextê te me, bextê te û diya te me, ev pênc sal e li hêviya te me, cothê memikê te hewce me"* ji wan keçikan yek ji nişka ve her du memikên xwe derdixe derve û dihejîne. Dibe pişkepişka wan, hemû keç bi Xaltîka Eysê dikenin. Yek ji wan keçikan tê serê her du memikên keçikê digirê û memikan dihejîne, dîsa dibe pişkîna wan, keçik dike qîreqîr *"Werin memik, memikên tazî, memikên xweşik, taze, bêhnember, ev bi peretiye ha. Di dinyayê de her tişt bi pere ye, em li hemberî belashiye ne. Belasî mirovan ko dike, em tûj in.*

Ev tenê man, cotek memikên min tenê man, bazara êvarê ye, erzanî ye werin, werin. Faîq dîsa dest bi stranê dike lê vêca stranê diguhere *"Da min, da min, da min cotên memikan wê da min, ketime ser singê wê ketime xêra Xwedê da, sê sê sisê, sê sê sisê... sê caran wê çav da min, sê caran wê maç da min, sê caran wê dest da min, sê caran wê lêv da min."* di vê navberê de dewxa Faîq diçe, dilê wî li hev dikeve, lembeyên sor, perdeyên sor, keçikên nîvtazî hemû li dora wî digindirin. Bi zorê digihîje serşoyê û li wê derê vedireşe. Ew ava tehl tê devî, mirûzê xwe tîrş dike, serûçavê xwe dişo, qîm nake, serê xwe dide binê ava sar, pêşgîra li pişt derî ya qirêjî li serê xwe dilefîne û diçe hundir. Keçik hemû li ser paldankan jixweçûyî dirêj ketine, Xaltîka Eysê tê dibêje *"Çi bû, qey te pir vexwar ji ber wê?"* Di wê navberê de diya wî, jiyana gund, bavê wî, xwişk û birayên wî dikevin bîra wî. Li saeta xwe dinêre dibêje niha hemû raketî ne, dê dîsa serê sibê zû rabin biçin paletiyê, dest û pî li xwe biqelêşin, dê diya wî dîsa bi dilovanî êvaran dest û piyên wan merhem bike û wan bixe nav nivînan. Di nav van ramanan de ditengize, xwe tawanbar dike lê piştê dibêje *"Niha dilê min bi wan dişewite lê dema ez diçim wê derê, ez dibînim ku bêyî ku zanibin derveyî wan çi xweşî û rihetî hene, karên xwe dikin, baş an xirab ji xwe re jiyanekê diafirînin, ez wan li gorî jiyana bajarvaniyê difikirim û gunehê min bi wan tê lê mirov li gorî şert û mercên derveyê xwe teşe digire lewre ew jî jiyanekê li gorî xwe diafirînin. Gunehê wan bi wan nayê. Ew di nava jiyanê de ne, ez li derveyî jiyana wan im, ji bo wê dilê min bi wan dişewite."*

Devê xwe dibe ber guhê Xaltîka Eysê, bi pistepist dipirse *"Ka îro keybanûya te tune?"* Xaltîya Eysê dibişire, ew jî bi heman şewazî ango bi pistepist bersivê dide *"Ka te tu carî ditiye ku keybanûya xaltîka te tune bûye? Her dem keybanûyek heye, ezgorî."* Xaltîka Eysê dide pêşiyê, ew dide dû ber bi odeya keybanûyê ve diçin. Di vê qonaxê de divê behsa keybanûyê bi kurtî be jî bê kirin; keybanû keçika herî bedew û nûhatiya malê ye, ev keçik dernakeve hemberî mêvanan, bi mêvanan re sohbetê nake, di odeya xwe de ye,

buhayê vê keçikê duqatî yên din e. Ciwantirîn keçika malê ev keçik e. Faîq, derî vedike keçikeke temenê wê li dora bîstî, çipuryan, her dû pêsîrên bi qasî sêvan, gilor, şidandî, navtengeke zirav, pişteke dûz û spî, bisk heta orta piştê tîn, her du tilmên gilover û ne pir mezin, teşkên ziravên bêpurt û spî, tehêlên xweşik û qasê destê mirov tije bike bigoşt li hemberî wî sekinandî bû, li serçavê keçikê bişirîneke jixwebawer hebû. Li keçikê mêze dike, di van deman de piranî divê mirov hinek sohbet bike, bi keçikê re xeber bide lewre heta pênc şeş deqîqeyan divê mirov hînî odeyê û keçikê bibe, hinek bêhna xwe vede û hişê xwe top bike û piştê dest bi karê xwe bike lê her çiqas Faîq bi van qayîdeyan zanibû jî vê carê ev yek pêk neanî, rasterast xwe tazî kir. Keybanû bişiriya, Faîq dihezirî ku ew vê bişirîne jî ku nas dike, hinekî tazî li ser piya fikirî, çi kir û nekir nehat bîra wî ev ken kenê kê bû? Xwe ji vê ramanê xilas kir, xwe nêzî keçikê kir, bêyî ku peyvek ji devê wî derkeve xwest bi lêvên keçikê bimije lê keçikê destûr nedayê, bi her du destan xwest her du memikên keçikê bipelîne keçikê dîsa destûr nedayê, keçik ji ser doşekê pekiya çû li ber şibakê sekinî. Faîq bi dengê bilind qîriya *"Tu çi dikî?"* keçikê berê xwe da aliyê Faîq û dîsa bişirî, heman bişirîn. Faîq çû ber pacê her du dest li newqa zirav lefand, devê xwe kir binî qirika keybanûyê û misand, keçikê dehfek lê xist, xwe ji wî dûr da û dîsa bişirî, Faîq êdî dikir ku dîn bibe, ji kerba destên wî dileriziyan, çavên wî fireh bûbûn, guzm û bi lez nefes digirt û berdida, serûçavê wî spî bûbû, di wê kêlikê de derî bi zorê û bi dehfan vebû. Polês ketin hundir, Faîq, keybanû, Xaltîka Eysê, keçikên din hemû girtin û birin qereqolê. Saet dora sisêyê şevê bû, axir ku devê derî ji rojname û televizyonan kes nîn bû.

Faîq heta sere sibê di qereqolê de vereşiya, hucreya xwe di nava bîna araq, xwêdan, vereşanê de hiştibû. Her ku dibû bilqebilqa wî vedireşiya polêsek dihat du sê pihîn li wî dixist, çêr dikir û diçû. Serê sibê wexta roj hilhat, Faîq êdî bêhêz, qidûmşikestî, jixweçûyî çavên xwe girt. Nola termekî li erdê di nava

wê qirêjê de vezeliyayî bû. Saet dora nehan îfadeyên wan girtin û ew berdan. Faiq hema li ber deriyê qereqolê li texsiyê siwar bû, perê ku do ji bo mala Xaltîka Eysê veqetandibû da texsiyê û xwe avêt mal. Li malê hemû cilên xwe ji xwe kir, dilê wî ji wî qelibiya û dîsa vereşiya. Ew cilên xwe kir çopê, çû fişa qazanê lê xist, xwe li ser doşeka xwe dirêj kir û ji xwe ve çû. Aliyê esrê, bi zora tîbûnê ji xew şiyar bû. Xewa araqxwiran jî ne xew e. Mirov çiqas rakeve jî mirov nayê ser hişê xwe, serê mirov giran e, çav bê hemdê xwe tînin girtin. Xew tu hizûr û hêzê nade mirov. Çû sarinc vekir, av di sarincê de tune bû, li metbexê devê xwe da binê kaniyê heta ji wî hat av vexwar. Paşê çû serşoyê serê xwe şûşt. Hê niha dikaribû mihakemeya xwe bike, heke dê, bav û merivên wan pê bihesin dê rezîl bibe. Dê çawa bikariba li rûyê bavê xwe binêriya, dê bigota çi? Ji her tiştî wedetir heke baro bi vê yekê bihesiya dê der heqê wî de lêpîrsîn vekira û belkî ew ji parêzeriyê bavêta. Heke ew ji parêzeriyê bavêta dê çi bikira? Dê xwe bisparta kê? Çawa do êvarê ew qas bi xwe bawer bû? Çawa ev tişt hemû ji ber çavê wî çûbûn? Belkî jî tiştê nebe û kes bi vê yekê nehese. Xwedê bike wiha bibe, haya kesî ji vê yekê tune be. Hezar car poşman bû, hezar car çêr û nifir li xwe kir, lê tiştê jî neguherî. Di tawanbariyekê de tiştê herî mirov ditengizîne, zirara dîtina der û dora mirov e. Mirov nikare texmîn bike gelo dê bandora vê yekê çiqas li ser dora mirov çêbibe. Hezar pîrs, hezar îhtîmal û hezar senaryo di nava hişê wî de diçûn û dihatin, rasterast ev aloziyek bû, nikaribû çareyekê bibîne. Di destê wî de tenê sekin mabû, di nava çar dîwaran de sekinîn mirovan dîn dike, ji ber vê yekê ye hemû zindan wiha tînin çêkirin û hemû mehkûm di nav çar dîwaran de tînin hepskirin. Sebra wî nehat, cilên xwe li xwe kir û derket derve. Tav hê nû çûbû ava, derve hê ronî bû. Wexta gihîşt parkê, dengê qîrîniyê, keftûleftekê, seranser park dabû ber xwe. Her kes bi gavên fireh ber bi bakurê parkê ve diçû. Dengê sixêf, nifir, qîrînan ketibû nava hev. Bi qasî hezar kesî, bi aliyê başûr ve dihatin. Her ku xelk tevî wan dibû hejmara wan zêde dibû. Faiq di ciyê xwe de sekinî, jinikeke tazî, navsere bi porê wê

girtine kaş dîkin, her kes tif dike ser çavê wê, dê çavên zarokên xwe digirin, nifiran dibarînin. Du mêrikên rûdirêj, şalwar li wan, di destê yekî de tizbiya nod û nehî, destê yê din de şûrêkî biriqandî heye. Xwediyê şûr diqîre, her ku diqîre, cemaet li hev hol dibe, hinek li pêşiyê baz didin, hinek kevîran top dîkin, hinek bangî Xwedê dîkin. Zarok, kalên heftê salî, ciwanên nûhatî, dayik, keç, xort her kes dide pey xwediyê şûr. Xwediyê şûr diqîre “Dada hezretî Emer hat, ê ku bînamûsiyê bike li ber namîne, yê ku li hember Xwedê derkeve li ber namîne. Alahû Ekber! Kî dikare li hember şerîeta Xwedê bisekine, çend qewm hatin tune kirin, çend caran kevîr bariyan dewsa baranê de, çend hezar car tofan rabû, erd hejiya, dinya rûxiya. Xwedê civakên ku ji rê derketine dizane bîne rê, heke îro em van gunehkeran ceza nekin dê sibê em xwe çawa ji xezeba Yezdan biparêzin? Cezayê minafîqan kifş e. Yê diziyê bike destê wî tînin jêkirin, yê qûnek e tê recmkirin. Ev şerîata Xwedê ye. Kîjan hêz kare xwe ji Xwedê biparêze? Kevîrên xwe top bikin, ji bo Xwedê we biparêze teksîr nekin”

Bi her hevoka mêrik re dengêkî dirinde ji civatê diçe, civat dizûre, diore, bi lepan li ser û çavên jinikê dixê, porê jinikê kaş dike, pihînan diweşîne û kevîran top dike. Her kevîrek xêrek, kî pîr biweşîne ew qas xêr qezenc dike, ew qas deriyê bihuştê vedibe. Civat nêzikî wî dibe, mêrikek di her du milên wî de du ciwan, tije cil lêkirî, du sê saqo, betaniyek di ser saqoyan de avêtine ser, serê wî bi çar pênc çefîyan pêçayî, di lingên wî de botên dirêj ên heta ser çokan, pantorê qedîfe bi ser wî de şarwal lêkirî, bi kaşekaş wî jî bi xwe re dibin. Xwediyê şûr tê aliyê wî dîsa diqîre “Mihemed Beg, me çend car lavayî te kir, me got neke. Me got li hember Xwedê dernekeve. Şîrkê neyîne neke nava civaka me, te xwe tazî kir, te karkerên xwe tazî kirin, te dînen bajêr tazî kirin. Namûs li ku derê hatiye firotin ku tu li vê derê namûsê difiroşî? Niha helkehelka te ye, tu xwêdan didî, laşê te di nava agir de ye. Ji vî agirî netirse, ji agirê dogehê bitirse. Dê tu bibî îbret, dê navê te li ber navê Ebû Leheb bê nivîsandin. Kî mêr e bila bê te xilas bike. Te

rêya xwe şaş kir, tu li hemberî Xwedê derketî, niha û heta dawiya dawîn tu yê di dogehê de cezayê vî gunehê xwe bikişînî."

Faîq têgihîşt ku ew Mihemed Beg e, tûşî erdê bû. Cimaeta ku hat lê qelibî, di binî lingê cemaetê de dev û pozê wî di nava xwînê de ma, ji ser hişê xwe çû. Wexta hat ser hişê xwe, êdî her der tarî bûbû, kes li derve nemabû, li saeta xwe nihêrî saet li dora heştan bû. Berê xwe da mala xwe, tiştê ku dîbû digot qey aşop bû, bawer nedikir, newêribû ji kesekî bipirse, tenê tiştêkî seyr hebû kes li derve tune bû. Gihîşt malê, radyoya xwe vekir, li hêviya nûçeyê ma, di vê navberê de digot bila ev yeka hanê rast nebe, dia dikir. Heman hevok bê navber digot, bila rast nebe, bila xeyal be. Bila rast nebe, bila xeyal be... Nûçeyê dest pê kir. "Îro aliyê êvarê li Parqa Bezê, qasî hezar mirovî Mihemed Beg û Eysêya ku keçan difiroşe kuştin. Kiryar nediyar in. Lê polês li her derê li wan digerin." Nexwe ew jinika tazî Xaltîka Eysê bû. Her du ji mirin.

Hê Faîq nehatibû ser hişê xwe telefon lê ket, Faîq bersiv da. Li ciyê xwe rûnişt. Li derve

baraneke guzim dest pê kir, sirûştê bi hemû hêza xwe asîman diguvaşt û her çîka ku li erdê diket dixwest Diyarbekirê ji holê rake. Bayekî nermik di nava çîkên baranê de dihat li rûyê Faîq dixist, birûsk li ser birûskê li navenda Diyarbekirê diket, xelk kişiyabû qalikê xwe û dia dikirin. Faîq cilên xwe hemû ji xwe derxist, li ser balqonê xwe bi baranê re ber da xwarê. Radyoyê dest bi reklaman kiribû;

"Mizgîniya me li we! Serşoya pakbûnê vebû, êdî bila kes nebêje ez qirêjî bûm. Em serê we dişon, kerika guhên we, nava ranên we, piştê stuyên we, binê çengên we dişon, tu dereke we êdî qirêjî namîne. Rûvên we, rûyên we, binê çengên we diqusînin, neynûkên we, porên we jêdikin. Paqijkirin karê me ye. Bi xebatkarên şareza û pîşpor, ji malbat û gruban re erzanî heye. Serşoya pakbûnê, Diyarbekir pak, mirovên Diyarbekirî pak in. Navnîşan: Serê rêya Elezîzê kîlometreya dehemîn, werin bibînin, bişon."

* Vê çîrokî di 16. pêşbirka Huseyîn Çelebî ya helbest û çîrokan de di beşa çîrokan de xelata yekemîn girtiye.

Ji WEŞANÊN AVESTA du berhemên zarokan ên nû





Dosye:
Kurdolojî
çi, çima, çawa?

Amadekar:

Serwet DENÎZ - Elîxan LORAN

Kurtebehseke pêşketina kurdnasiyê (1988-2008)

Rohat ALAKOM

Daxwaza kurdan perwerdehî ye ne kurdolojî ye

Samî TAN

Efrasyab Hewramî: Kurdnasên Sovyetê li pey berjewendiyên dewleta xwe bûne

Hevpeyvîn: Azad ZAL- Serwet DENÎZ

Lêkolînên kurdolojiyê li Fransayê

Salih AKIN

Kurdolojî: Zanista hesta netewî

Mihemed RONAHÎ

Dosyeyên me yên heta niha çandî û hunerî bûn. Di vê hejmarê de me mijareke aktuel wek dosye hilbijart. Lewre ev mijar di rojevê de ye û tê nîqaşkirin. Bi vê dosyeyê me xwest ku hem em bîr û baweriyên xwe yên der barê vê mijarê de binin ziman û hem jî mijarê bixwe hinekî veçirînin û qala naverok, pênase û dîroka wê bikin.

Mijara dosyeya me “kurdolojî” (kurdnasî) ye. Li gor bawerîya me pêdivî bi dosyeyêke bi vî rengî hebû û me amade kir. Em hêvîdar in dê sûd jê bê wergerin.

Di gotarên dosyeyê de wek tîgih “kurdolojî” jî her hêlê ve hatiye nirxandin. Ji gotaran mirov dikare hîn bibe ka ev tîgih kîngê derketiye holê, pêşiyê kê li ku bi kar aniye, kîjan mijar û xebat dikarin di vê çarçoveyê de bên nirxandin, tîkiliya wê bi kîjan beşên zanistê re heye, ew bi xwe zanistek e yan qadeke lêkolînê ye, xebatên ku wek “kurdolojî” tên binavkirin heta niha li kîjan qad û welatan bi pêş ketine, yên ku ev xebat kirine çima kirine? Bersiva van pirsan tevan di gotarên dosyeyê de hene.

Di gotaran de mijar ji gelek hêlan ve hatiye nirxandin û zelalkirin. Ji bo vê yekê em sipasiyên xwe pêşkêşî nîvîskarên dikin. Lê di hinek mijaran de em cihê difikirin û em dixwazin nêrîn û nêzikahiya xwe ji bo xwendekaran û raya giştî diyar bikin. Wek mînak hinek nêrînên wek; TRT6 û beşên kurdolojiyê yên ku tê xwestin li hinek zanîngehên Tirkiyeyê bên vekirin dê ji bo pêşketina kurdolojiyê roleke girîng bilîzin û asta xebatan bilind bikin. Em ne ligel vê baweriyê ne. Çima?

Ji bo bersiva vê pirsê pêşiyê divê em li gelên din binihêrin. Gelên din xebatên bi vî rengî ji bo çi dikin armanca wan çi ye?

Armanca sereke avakirina “bîr” a netewî ye, sazkirina hişmendî, bîr û baweriyên netewî ye. Bi nirxên netewî perwerdekirina nîfsên nû ye. Bi vî awayî jî domandin û mayîndekirina hebûna wî gelî wê neteweyê ye. Her kesê/a tîkildarî mijarê vê yekê dizane. Gelo mirov dikare bibêje ku ev karên tên kirin ji bo domandin û mayîndekirina hebûna gelê kurd e. Gelo dewleta ku sed sal e hebûna kurdan înkâr dike wê çima herhebûna kurdan ji xwe re bike derd? A herî girîng jî peyva “kurd” hîna di tu belgeyên fermî yên dewletê de tune. Dewlet bi xwe ji bo kurdî dibêje “ziman û zaravayên herêmî”. “Ziman û zaravayên herêmî” çi ye? Ev ne bînpêkirina rûmetê ye? Gelek pirsên bi vî rengî dikarin bên pirsîn.

Bi ya me “kurdolojî” ne tenê hînkirina ziman û weşana to’vê ye. Avakirina “bîr” a gelê kurd e. Ev “bîr” jî encax bi destê kurdan dikare bê avakirin. Ji derveyî kurdan kî ava bike dê li gorî berjewendiyên xwe ava bike û em dizanin ku ev rewş jî ji bo kurdan malkambaxî ye.

Nêrîna li vê mijarê li derveyî helwestên rojane ye û divê mirov bi demdirêjî lê binihêre wek ên ku niha dixwazin wan beşan ava bikin. Armanca û çawaniya kar pir û pir girîng e. Mijar di vê çarçoveyê de bê nîqaşkirin wê rewş baştir bê fêmkirin.

Bi van bîr û bawerîyan em dosyeya xwe pêşkêşî we dikin. Di hejmareke din de bi mijareke cihê em ê li pêşberî we bin.

Kurtebehseke pêşketina kurdnasiyê (1988-2008)

Rohat ALAKOM

Eger em gotin û pîvanên wek *tez*, *unîversîte* û *latînî* bidin ber çavan û kurdnasiyê wek zanistekî (ilm) qebûl bikin, wê demê paye û şanê “*bavê kurdnasiyê*” bi dîtina min ji Maurîzîo Garzonî zêdetir para Mathias Norberg dikeve.

Bav(ên) kurdnasiyê

Wek tê zanîn dîroka kurdnasiyê (kurdzanî, kurdologî) kevn e. Gelek caran ev dîrok bi xebateke keşeyekî îtalî, Maurîzîo Garzonî, lêkolîna wî ya bi navê *Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda* (Rêziman û ferhenga zimanê kurdî) ve dest pê dike. Ev xebata wî wek pirtûk di sala 1787’an de li Romyê hatiye weşandin. Ew bi xwe çûye bajarê Mûsilê, li wir maye û ew materyalên kurdî li wir berhev kiriye. Ji ber vê yekê Garzonî ji aliyê hin kesan ve wek “*bavê kurdnasiyê*” tê nasîn. Lê belê çawa em ê li jêr ji bibînin berendamekî din ê bavê kurdnasiyê ji nû ve tê keşifkirin!



Bavê Kurdnasiyê Mathias Norberg

Ev kesê ku em qala wî dikin rohilatnasê (oriyantalîst) swêdî yê navdar Mathias Norberg (1747-1826) e ku du tezewên akademîk li ser kurdan nivîsiye. Di


sala 1781’an de dema ji gera xwe ya Rohilatê, ji Constantînopelê vedigere, her wisa ji dîçe Parîsê. Ew li Parîsê rastî keşeyekî Kaldeyî, Joseph Behenam tê, ew bi xwe li Mûsilê hatiye dinê. Joseph Behenam him kurdî zanibûye û him jî di dema xwe de pisporê kurdan bûye. Mathias Norberg bi wî re hevaltiyê dike, bi saya wî, kurdan ji nêzik ve nas dike. Dema vedigere Swêdê bi xwe re hin materyal û çavkaniyên nivîskî jî tîne. Sala 1782’yan di Unîversîteya Lundê de dibe profesor û heta sala 1820’an li wir nêzikî çil salan kar dike. Mathias Norberg bi gelek zimanan zanibûye, wek erebî, tirkî, latînî û hin zimanên din. Piştî salan çawa em dibînin, vî akademîsyenê swêdî di sala 1808’an de li ser kurdan du tez amade kirine û nivîsîne, lê belê du xwendekarên Unîversîteya Lundê, du kesên mayî bi navê Carolus Edvardus Planck û Johannes Wieslander ev tezewên li ser kurdan parastine, di wan salan de edet wisa bûye. Yek ji van tezan li ser kurdên misilman e (kesê tez parastiye: Carolus Edvardus Planck) û ya din li ser kurdên êzîdî ye (kesê tez parastiye: Johannes Wieslander). Ew zanyarî û agahiyên ku di van tezan de cih girtine zêdetir agahî û dîtînen înfomatorê wî Joseph Behenam in ku Mathias Norberg li Parîsê rastî wî hatibû û bi wî re bûbû nas.

Îsal çawa em dibînin di ser van her du

dokumentan re tam dused sal derbas bûye, simbolîk be jî wek du xebatên akademîk dikarin bên hesibandin. Cara pêşîn kurd di unîversîteyekê de dibin mijara tezên lêkolînan. Tişteki balkêş jî kurtebehseke van her du têzan him bi latînî û him jî bi zimanê erebî li teniştê hev hatine nivîsîn û heta îro jî hatine parastin. Çawa li vir jî xuya dibe hejmara bav(ên) kurdnasiyê zêde dibin. Eger em gotin û pîvanên wek *tez*, *unîversîte* û *latînî* bidin ber çavan û kurdnasiyê wek zanistekî (ilm) qebûl bikin, wê demê paye û şanê “*bavê kurdnasiyê*” bi dîtina min jî Maurîzîo Garzonî zêdetir para Mathias Norberg dikeve. Nivîsîna van tezên Mathias Norbergê her wisa jî wek nûçeyeke teze dikare bê hesibandin. Heta niha jî derî du, sê çavkaniyên swêdî di tu çavkaniyeke din de qala van her du tezên li ser kurdên misilman û kurdên êzîdî nehatiye kirin.

Li vir ez dixwazim bala xwendevanan bi-
kişînim ser xaleke din jî, çawa em li jor
dibînin, navê bajarê Mûsilê li vir du caran der-
bas dibe (wek mekanê Garzonî lê maye û wek
bajarê înmatorê Mathias Norberg jê tê). Di
van çavkaniyan de derbasbûna navê bajarê
Mûsilê, her wisa jî dikare di pêşerojê de xeml
û qîmeteke mezin bide nivîsîna dîroka vî ba-
jarê qedîm û ev yek her wisa jî wek nîşana
hebûna cimaeta kurd li vî bajarî dikare bê qe-
bûlkirin. Ew keşeyê ku ji Mathias Norberg re
înmatorî kiriye, belkî jî înmatorê Mau-
rîzio Garzonî jî bûye, em nizanin. Gelek tiştên
wisa qewimîne ku paşê bi saya lêkolînan

derdikevin holê. Di vî warî de em mîsaleke din a balkêş jî dikarin bidin. Berî ku Mathias Norberg di Unîversîteya Lundê de kar bike, li wir Jacob Jonas Björnstål (1731-1779) kar dikir. Dema Jacob Jonas Björnstål li Stenbolê maye, çawa em dibînin ew di sala 1778'an de li



*Bergê teza Mathias Norberg a li ser
kurdên misilman (1808)*

wir rastî Maurîzîo Garzonî hatiye.¹

Dîroka kurdnasiyê yek ji wan babetên ku kêfa min jê re tê dikare bê hesibandin. Ez bi evîneke mezin jiyana wan kurdnasan û keda wan teqîb dikim. Piştî ku pirtûka min a bi navê *200 Saliya Kurdnasiyê* di sala 1987'an de bi zimanê tirkî derket, haya gelek xwendevanan ji wan xebat û lêkolînên ku li ser kurdan çêbûbûn, tune bû. Di ser derketina vê xebata min re ji bîst salan zêdetir wext derbas bû.² Gelo di navbera van bîst salan de xebatên kurdnasiyê, bi taybetî li derveyî welêt û li Kurdistana Bakur çawa pêş ve çûne, çi xebat hatine amadekirin? Di vê nivîsê de ez dixwazim bi kurtî be jî bersiva vê pirsê bidim. Xebatên ku li Kurdistana Başûr û Rojhilat tên kirin bi serê xwe hêjayî lêkolîn û danasîneke mayî ne, li vir behsa wan nayê kirin.

Berî sala 1987'an ku kurdnasiyê 200 saliya xwe tijî dikir, navendên kurdnasiyê yên herî navdar li Yekîtiya Sovyetê bûn. Li gelek paytextên komarên Sovyetê navend û komên kurdnasan hebûn. Lê belê piştî têkçûna Sovyetê, her wisa jî ew navendên kurdnasiyê li wir têk çûn, belav bûn, an jî bandor û hêza wan kêm bû. Her kurdnasek çû cihekî, yên mayî jî ketin pey belengaziya xwe, bi debar û aboriya xwe re mijûl dibin û hinek ji wan, wek kurdnasên navdar Qanadê Kurdo, Heciyê Cindî, Ordîxanê Celîl, Şekroyê Xudo ji nav me bar kirin, çûn ser dîlovaniya xwe. Piştî vê serobinobûna li Sovyetê, rola Amerîkayê û welatên ku bi îngilîzî dipeyivin mezin bû, li Amerîkayê gelek xebat û kurdnasên navdar derketin. Mîrov dikare bibêje ku di nav demeke ne wisa dirêj de Amerîkayê cihê Yekîtiya Sovyetê tijî kir.

Kurdan di nav van bîst salên dawîn de her wisa jî 400 saliya nivîsîna Şerefnameyê, 300 saliya Mem û Zînê, 100 saliya derketina rojnameya kurdî ya pêşîn Kurdistanê him pîroz kirin, him jî bala lêkolêr û kurdnasan şemitî ser dîrok, edebiyat û rojnamegeriya kurdî. Prosesa lêkolîn, werger û weşandina van her sê sertacên çanda kurdî her berdewam in. Cara pêşîn piraniya hejmarên Kurdistanê çawa tê zanîn li bajarê Marburgê li Al-

manyayê hatin dîtîn, paşê hejmara 17'an li Parîsê, hejmara 18'an li Enqereyê, paşê hejmarên 10'an û 12'an li Viyanayê hatin dîtîn. Di nav vê koleksiyona ku ji 31 hejmaran pêk tê de, heta niha tenê hejmara 19'an peyde nebûye! Dîtina her hejmareke Kurdistanê bûye nûçeyek. Niha çavên kurdan li hatina mizgîniya dîtina hejmara 19'an e, li benda wê ne! Temamkirina koleksiyona rojnameya Kurdistanê di avakirina netewetîya kurd de dikare roleke gelek mezin bilîze. Ne tenê ev qîmeta sembolîk, her wisa ji mirov meraq dike gelo di nav rûpelên wê yên veşartî de çi hene? Çawa li vir ji tê dîtîn, kar, zehmetî û berpirsiyariyên kurdnasan gelek in. Ew, tenê me ronî nakin, ew her wisa ji avakarên netewetîya kurdî ne.

Li jêr zêdetir tenê li ser wan kurdnas, lêkoler û nivîskarên ku di van bîst salên dawîn de (1988-2008) bi xebatên xwe hatine nasîn, tê sekinîn.

Amerîka

Piştî ku di sala 1989'an de pirtûka Robert Olson der barê Serhildana Şêx Seîd de bi zimanê îngilîzî derket, bala lêkoleran şemîtî, ket ser rewşa kurdên Tirkîyeyê û dîroka wan a sedsala 20'an. Der barê vê serhildanê de cara pêşîn lêkolînek bi belge û bi çavkaniyên nû bi zimanê îngilîzî hat weşandin. Paşê ev lêkolîn bi zimanê kurdî, farisî û tirkî jî derket. Di sala 1992'yan de lêkolîna Mehrdad R. Izady hat weşandin, wek ansîklopedî, çavkaniyeke berdest û referanasê gelek deng da. Piştî derketina van pirtûkan di warê lêkolîn û xebatên akademîk de pêşketineke mezin di warê kurdnasiyê de li Amerîkayê peyde bû. Gavên din ev xebat teqîb kirin. Di sala 1997'an de vê carê xebateke berfireh, xebateke cihê ji aliyê Susan Meiseles de bi navê *Kurdistan - Di Bin Siya Dîrokê de* der çû. Wênekêşa navdar a emerîkî di vê pirtûka xwe de bi sedan wêne, kartpostal, nexşe û gelek çavkaniyên din bi kalîteke bilind weşand. Li teniştê wan dokumentên dîrokî her wisa ji tekstên Martin van Bruinessen cih girtin. Vê xebata bi gotin û bi wêne gelek bala lêkoleran kişand û mala her dîrokhezî xemiland. Vê xebatê her wisa ji

qîmeta efemerayê (bi îngilîzî Ephemera) derxist holê. Çavkanî û kaxizên efemerî, kaxizên rojane, kaxizên ku gelek caran mirov davêje çopê, jiyana wan weke rojekê wisa kurt dajo, kaxizên ku di pirtûkxaneyan de nayên katalogekirin êdî piştî salan, wek mîsal pakêteke çayê (bi motîvê Mistefa Barzanî) gelek caran kêrî lêkoleran tên.

Rengîniya dîroka kurdan bi saya pirtûkên Robert Olson û Mehrdad R. Izady ên akademîk û xebata Susan Meiseles a populer mirov dikare bêje ku bala gelek lêkoleran kişand. Yek ji wan kurdnasên ku di van salên dawîn de li Amerîkayê dengê xwe da bîhistin, filolog Michael Chyet e. Bi zanebûna gelek zimanan alîkariyeke mezin da etîmolojîya kurdî. Wî paşê ferhengeke mezin a kurdî-îngilîzî weşand. Bi vê nema, gelek şaxên destana Mem û Zînê yên devkî û nivîskî rûberî hev kir, yek ji wan xebatên komparatîv ên hêjatîrîn di vî warê de amade kir. Lê mi - xabin ev xebata wî heta niha jî wek xebateke neçapkrî wisa maye.

Di van salên dawîn de babeta ku zêdetir bala lêkoleran kişandiye, babeta kurdên êzîdî ye. Piştî xebateke dûr û dirêj lêkoler John S. Guest di sala 1993'yan de lêkolîna xwe ya bingehîn û berfireh der barê dîroka kurdên êzîdî de weşand. Ev cara yekem bû ku lêkolîneke wisa bi naverokeke têr û tijî li ser van kurdên êzîdî dihat weşandin. Bi derketina vê pirtûkê re kesên din dan peya şopa wî. Lêkolerên îngilîz wek Christine Allison û Philip Kreyenbroek gelek tekstên êzîdîyan ji ber zarên wan berhev kirin, bi şîrove, bi dîtinên xwe û bi wergera wan ve tevayî weşandin. Du kesên ku bi koka xwe ji kurdên Sovyeta berê jî tevî vê koma lêkoleran bûn. Yek ji wan kurdê Gurcistanê, Pîr Dîma, yek jî kurda Ermenîstanê, Xanna Omerxalî ye. Her duyan jî xebatên xwe wek pirtûk weşandin.



Fîlologê amerîkî Michael Chyet
bi ferhenga xwe ya kurdî-îngilîzî

Heta niha jî lêkolînên li ser kurdên êzîdî her berdewam in. Piştî nîfşa kurdnasên dewra Sovyetê, hejmara kurdnasên li ser vê axê çawa em dibînin her çûn kêmtir bû.

Hinek kurdnasên din jî wek mîsal Michael M. Gunter, Yona Sabar, Janet Klein navên xwe li derdorên kurdnasiyê li Amerîkayê dan bîhistin.

Li Kanadayê Amir Hassanpour û Shahrzad Mojab gelek karên hêja kirin. Bi taybetî dîroka zimanê kurdî, medya kurdî û di warê pêşvebirina netewetîya kurdî de rola ziman gelek bala Amir Hassanpour kişand û teza doktoraya xwe li ser van babetan amade kir. Shahrzad Mojab zêdetir bi lêkolînên li ser jinên kurd re mijûl e. Der barê dîroka jinên kurd, rola wan û babetên wek cînsiyeta civakî gelek lêkolînên wê hene. Her wisa jî bi lêkolînên din ên li welatên cihê re ket têkiliyê, toreke xebatê, toreke pevguhestinan di navbera wan de pêk anî. Vê xebata wê, piştî çend salan encam da. Bi keda gelek lêkolêran, bi lêkolînên wan xebateke berfireh bi zimanê îngilîzî wek berhevokekê der çû. Li ser jinên kurd yek ji wan monografiyên herî baştirîn bi navê *Jinên Neteweyêke Bêdewlet - Kurd* (2001) hat çapkirin. Amir Hassanpour bi koka xwe kurd û Shahrzad Mojab jî faris e, her du jî ji Îranê tên. Kurdekî îranî ku wek Amîr Hassanpour bi pîrsa netewetîya kurdî re mijûl dibe, li ser vê mijarê kar dike, Abbas Welî ye. Bi taybetî bîngeh û hîmên teorîk ên netewetîya kurdî bala wî dikişîne. Gelek salan li Îngiltereyê, demekê li Unîversîteya Boxazîçiyê li Stenbolê kar kiriye û li Kurdistana Başûr, li Hewlêrê tevî karên sazkirina *Unîversîteya Kurdistanê* bûye.

Li welatên Ewrûpayê

Îro hema bibêje li her welatekî Ewrûpayê kom û kesên li ser kurdan kar dikin hene. Bi taybetî li Fransa, Îngiltere û Almanyayê gelek karên zanistî tên kirin. Her wisa jî li welatên îskandinawî wek Swêd, Danîmarka, Norveç û Fînlândiyayê jî kurdnasî bi lez pêşde diçe û li ser kurdan li van welatan gelek xebat tên kirin.

Li Ewrûpayê welatê ku di warê kurdnasiyê gavên pêşketî avêtiye, bêguman Fransa ye. Di nav van bîst salan de li gelek welatan konferans û civînên cihêreng ên kurdnasiyê çêbûne. Konferanseke wisa mezin û girîng a enternasyonal bi navê *Kurd û Bajar* (The Kurds and City) di rojên 19-21 îlon sala 1996'an de li bajarê Sewrê li Fransayê pêk hat. Ji her aliyên cihanê gelek kurdnas, lêkolêr û nivîskar tevî vê konferansê bûn. Fransa yek ji wan welatên ku kurdnasî lê pêşve çûye dikare bê hesibandin. Li Fransayê îro kesên wek Hemîd Bozarslan, Fuat Dundar, Salih Akin, Îbrahîm Seydo Aydoğan û kesên mayî bi jiyana siyasî, dîroka kurdan û ziman-edebiyata kurdî ve mijûl dibin. Yek ji wan sazgehên ku li ser kurdan hin lêkolîn li wir tên kirin *Dibistana Bilind a Zanyariyên Civakî* (EHESS) ye.

Hin kurdnas û lêkolêran jî di van salên dawîn de berê xwe dane Îngiltereyê, li wir jî xwe re kar dîtî, wek Haşim Ehmedzade û Clémence Scalbert-Yucel. Ev yek jî nîşan dide ku Îngiltere yek ji wan welatan e ku kurdnasî lê pêşve diçe. Di sala 2006'an de li Îngiltereyê, di nav Unîversîteya Exeter de *Navenda Lêkolînên Kurdî* hat sazkirin. Vê navendê wek nimûne di rojên 2-3 nîsan 2009'an de konferanseke navneteweyî amade kir. Ji gelek welatan kurdnas û lêkolêr tevî vê konferansê bûn. Kesên wek Nazand Begikhani, Welat Zeydanlioglu, Cengiz Guneş û hin kesên din jî li Îngiltereyê li ser kurdan karên zanistî dikin.

Piştî Fransa û Îngiltereyê her wisa jî di nav van bîst salên paşîn de karên kurdnasiyê li Almanyayê pêşve çû. Bajarê Berlîne ne tenê bû paytexta Almanyayê, her wisa jî bû naven-deke kurdnasiyê, lêkolînên kurdîtiyê. Komeke ku li Berlîne saz bûye, ev çend sal in bi gelek çalakiyan alîkariya pêşketina kurdnasiyê dike. *Komeleya Berlîne ya Alîkariya Kurdnasiyê* (Berliner Gesellschaft zur Förderung der Kurddologie e.V). Ew kesên ku pêşengiya vê komeleyê dikin, ev in: Siyamend Haco, Carsten Borck, Eva Savelsberg. Bi saya vê komê heta niha gelek civîn û konferans li Berlîne hatine çêkirin û encamên van çalakiyan paşê wek

pirtûk, berhevok hatine weşandin.

Hin kurdnas û lêkoler wek Nelida Fuccara (Îngiltere), Jordi Tejel (Fransa) û Eva Savelsberg (Almanya) ev çend sal in bala xwe dane tevgera kurdên Sûriyeyê, wek mijarên Xoybûnê, çalakiyên Malbata Bedirxaniyan, Mala Haco û her wekî din. Di nav van bîst salan de gelek kurdnas bi babet û mijarên cihê mijûl bûn û lêkolîn kirin, wek David McDowall (Îngiltere), Maria O'shea (Îngiltere), Susan McDonald (Îngiltere), Ephrem Isa Yousif (Fransa), Annabelle Böttcher (Almanya), Zorabê Bûdî Aloian (Almanya), Michiel Leezenberg (Holanda).

Kovara bi navê *Études Kurdes* (Lêkolînên Kurdan) ku ji aliyê Enstîtuya Kurdiya Parîsê ve bi fransî derdikeve, heta niha 8 hejmarên wê hatine weşandin. Her wisa jî sê hejmarên taybet der barê mijarên wek Dîroka Kurd, Selahadînê Eyûbî û Rêxistina Xoybûnê hatine weşandin. Kovareke mayî bi navê *Lêkolîn* ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Berlînê ve ji bo lêkolîn û zanist, li Almanyayê derdikeve. Di nav rûpelên kovara *Bîrnebûnê* ku li Swêdê derdikeve de (heta niha 40 hejmarên wê derketine) li ser civata kurdên Anatoliya Navîn gelek materyal, tekst û lêkolîn hatine belavkirin. Mijara Kurdên Anatoliya Navîn îro bi serê xwe warekî kurdnasiyê û lêkolînê yê herî fireh, nû û balkêş pêk tîne. Li dora bajarên Qonyayê, Enqereyê û Kirşehîrê bi sedan gundên kurd hene. Serpêhatiya civak, dîrok, folklor û zimanê kurdên van her sê bajaran bi serê xwe mijarên tîzên doktorayê pêk tînin.

Li dinyayê bi saya pêşketina teknîkê (înternet, telefonên pirfonksiyon ên mobîl û televîzyonên bi antên) înfomasiyon bi leztir û bi tehrekî gelek fireh li dinyayê belav dibe. Mirov îro li ku derê dibe bila bibe, çawa em dinêrin bi hev re dikevin tîkiliyan. Êdî telefona mirovan di dîst de, qutiya wî ya postê li pey, here kê derê li wir di xizmeta wî de ye. Bi sedan teksên depokirî yên pirtûkan, muzîkê û înfomasiyonên din di stûyê wî de bi haceteke pir piçûk dardakirî ji xwe re bi rihetî digere. Bi îfadeya globalîzebûnê, ne tenê mal û aborî, her wisa jî xizmet, înfomasiyon,

çand û raman û rêva çûyî nê mirovî ji qalibê xwe yê t e n g derdikevin, ji xwe re mekane n dersînor ên nû peyde dikin. Çawa mirov (kurd jî tev de) li r û b a r î d i n y a y ê belav dibin, her wisa jî î n f o r m a s -

yonan li dinyayê bi lez wisa belav dibe, bi xwe re tîkilî û pêwendiyên nû tîne, vedijîne, ji nû ve diafirîne. Transnasiyonlîzm û diyasporayê wek sahayeke nû ya lêkolînê peyde kiriye. Koçberiya navneteweyî û pêwendiyên etnîkî sahayeke din e ku bala lêkoleran kişandiye û dikêşîne jî. Li van walatên pireng, pirnetew û pirziman zanavên cihê (nasname) nû jî li pey hev peyde dibin. Hin caran serêşî û problemên civakî jî derdikevin. Gelek caran tenêmayîn, segregasiyon û nijadperestî dibe belaya serê civatan. Sedemên paş van rûdanan û bûyerên civakî dibin mijarên lêkolînan. Ne tenê di nav kurdên ku li welat û mekanên cihê dijîn, her wisa jî pêwendiyên di navbera kurd û netewe, kom û gelên din jî dibin mijarê lêkolînan. Wek mîsal kesên ji Kurdistanê û Şîliyê tînan jî pêwendiyên kurdên Fînlândiyayê û kurdên li Îngiltereyê dijîn dibin mijarên lêkolînên danberhevî. Komek lêkolerên li Swêdê û Fînlândiyayê dijîn wek Minoo Alinia, Ann-Catrin Emanuelsson, Erik Olsson, Clarissa Kugelberg û Östen Wahlbeck doktorayên xwe li ser van mijaran amade kirine yan jî gelek lêkolînên wan li ser van mijaran hene.

Xebatên entegrasyonê, dubendî û dijayetiyên di navbera çand û nîfşên cihê de wek mijarên nû yên kurdnasiyê dikarin bîn



Hejmareke kovara *Études Kurdes*
(Enstîtuya Kurdî ya Parîsê)

hesibandin. Der barê van babetan de heta niha bi gelek xebatên doktorayê, master û lîsansê hatine amadekirin. Wek mîsal lêkolera alman, Heidi Wedel li ser kurdên Stenbolê, Clémence Scalbert-Yucel, lêkolera fransî li ser kurdên Swêdê hin lêkolîn amade kirin.

Yek ji wan babetên ku zêdetir li Ewrûpayê bala lêkoleran kişand, rola jinên kurd, bi taybetî pîrsa namûs û şerefê vê dawiyê cihê yekemîn girt. Xebatên bi vî tehrî her berde-wam in. Wek mîsal, tenê li Swêdê ji bîstî zedetir xebatên doktorayê, master û tezên din li ser van mijaran hatine amadekirin.

Li Tirkîyeyê

Bi salan di unîversîteyên tirk de lêkolînên zanistî û akademîk hatibûn qedexekirin. Hebûna kurdan hatibû înkarkirin, kurd wek tirk dihatin qebûlkin. *Enstituya Lêkolînên çanda Tirkî* (Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü) ku di salên 1960'î de saz bûbû, bi sedan pirtûkên înkarkirina çand, dîrok û edebiyata kurdî derxistin, gelek caran bê pere belav kirin. Lêkolînên li ser kurdan di van salan de di nav dewreke herî xirab de mabû. Piştî salên 2000'î êdî bandor, hêz û rûmeta wan zêde nema, dengê wan ne temamî be ji hat birin.

Li Tirkîyeyê di van salên dawîn de hin xebatên akademîk di unîversîte û dezgehên mayî de tên kirin. Hin kes xebatên xwe yên doktorayê, master û lîsansê li ser kurdan amade dikin. Niha kesên ku bi koka xwe kurd in wek Mesud Yegen, Ahmed Ozer, Qadrî Yildirim, Handan Çaglayan û hin kesên din li

ser kurdan kar dikin. Wek mîsal Handan Çaglayanê teza doktoraya xwe li ser hiş-yarbûna jinên kurd nivîsiye. Di unîversîteyên Bîlgî, Bogazîçî û Sabancı de çend lêkolînên balkêş (neçapkirî) wek tezên master amade bûne.³ Hin kesên ku di Unîversîteya Hacetepeyê de xwendine, tezên xwe yên masterê der barê kurdên Anatoliya Navîn û kurdên êzîdî de amade kirine.⁴ Di van salên dawîn de der barê ziman û edebiyata kurdî de baldariyeke mezin di unîversîteyên tirk de peyde bûye. Wek mîsal di Unîversîteya Bîlgîyê de çend konferansên cihê di van salên dawîn de li ser babeta edebiyata kurdî pêk hatine, akademîsyenên tirk, Jale Parla û Necmiye Alpay bi baldarî pêşketina edebiyata kurdî teqîb dikin. Akademîsyenên wek Baskin Oran, Dogu Ergil, Kemal Kırışçi û Murat Belge ji hewl dane û didin ku babeta kurdan di unîversîte û sazgehên din ên Tirkîyeyê de bên lêkolandin. Lêkolerên wek Lale Yalçın-Heckmann, H. Neşe Ozgen, Ayşe Gul Altınay bi gelek babetên sosyolojîk ên civata kurd re mijûl dibin, guhertin û danstandinên civakî û gelek aliyên civata kurd analîz dikin.

Ji derî xebatên akademîk, her wisa ji gelek xebatên populer-zanistî li Tirkîyeyê tên kirin, pêşve diçin. Ew kesên ku wek nivîskar-lêkoler yan ji rojnamevan tên nasîn, bi kar û xebatên xwe yên populer him zêdetir kurdnasiyê didin hezkirin û him ji alîkariya pêşketina wê dikin. Her sê Mehmedan: Mehmet Emîn Bozarslan, Mehmet Tayfun (Malmisanij), Mehmet Bayrak bi xebat û lêkolînên xwe alîkariyeke mezin di nav van bîst salan de dane pêşketina kurdnasiyê. Bi taybetî koleksiyonên periyodîk ên kurdî yên kevn û gelek tekstên kurdî yan ji li ser kurdan ji aliyê van kesan ve ji nû ve hatin weşandin. Her wisa ji Zana Farqînî, Selim Temo, Ahmet Aras, H. Mem, Salihê Kevirbirî, Sinan Hakan, M. Şefik Korkusuz, Aris Arda, Muslum Yucel, Birdal Aksoy û hin kesên din di warê ziman, edebiyat, folklor, dîrok, etnografya û mîtolojiya kurdî de karên lêkolînê dikin. Lêkolerên wek Reşo Zilan, Mûrad Ciwan, Emîn Narozi, Osman Aytar, Cemil Gundogan ku li Swêdê dimînin bi lêkolînên xwe ev bi salan in tevî



Her du ferhengên Zana Farqînî

van xebatan dibin.

Di van salên dawîn de hêjayî gotinê ye ku hejmara monografiyên bajar, bajarok, nahiye, gund û eşiran her ku çû zêdetir bûn. Naveroka wan angorî armanc û koka kesê amadekar diguhere. Şevket Beysanoglu wek mîsal hemû jiyana xwe da dîroka bajarê Diyarbekirê. Piştî mirina wî, lêkoler Şêxmûs Dîken bi xebatên xwe şûna wî tijî dike. Heta niha çend pirtûken Dîken der barê Diyarbekirê de hatine weşandin. Hin monografiyên bajaran êdî bi kurdî tînin nivîsîn. Wek mîsal, yek ji wan der barê bajarê Nisêbînê de ji aliyê Eslîxan Yildirim, xebateke din jî li ser bajarê Lîcê ji aliyê Amed Tîgrîs ve bi kurdî hatiye nivîsîn. Gelek ji van monografiyan cihmekanan bi destê komên tirk tînin amadekirin û weşandin. Di nav rûpelên wan de qala kurdan kêm tê kirin, yan ew zanyariyên şaş û faş der barê kurdan de pêşkêş dikin an jî qet behsa kurdan nakin.

Divê em balê bikişînin ser xebat û lêkolînên *Komîsyona Babeta Kurdan Di Çavkaniyên Osmanî de* (Osmanlıca Kaynaklarda Kürtler Komisyonu) ku di sala 2003'yan de li Stenbolê pêk hatiye. Heta niha vê komîsyonê çend çavkanî û tekstên li ser kurdan ku bi zimanê osmanî (bi tîpên erebî) hatine nivîsîn, bi zimanekî sade guhastine tirkîya îro. Bi saya xebatên vê komê, îro çawa em dibînin xwendevan gihiştiye hin berhem û çavkaniyên dûrîdest (nadir).⁵ Wek mîsal heta niha kesî nizanibû ku ew naznavê Lutfiyê ku pirtûka bi navê *Mîr Bedîrhan* di sala 1908'an de li Stenbolê weşandibû, kî ye? Bi salan bû ku kesî nizanibû ev Lutfi kî ye. Paşê bi alîkariya îlaneke ku di kovara *Îçtîhadê* de (nr 5/1908) derketî, hat famkirin ku ev pirtûka ji aliyê nivîskarê kurd Ahmed Ramîz ve hatiye nivîsîn, ango "Lutfi" Ahmet Ramîz e. Ev nota biçûk jî nîşan dide ku karê lêkolînê çî karekî girîng e.⁶

Wisa dixuyê ku pêşeroja kurdnasiyê li Tirkiyeyê û li vê beşa Kurdistanê her sayî û ronahî ye. Li Tirkiyeyê vekirina beşên *Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî* ketiye rojevê, îhtîmaleke mezin e ku di payîza 2009'an an jî sala

2010'an de ev beş bînin vekirin. Ez wisa bawer dikim ku bi vekirina van beşan statûya kurdnasiyê li Tirkiyeyê wê hin jî bilindtir bibe. Bi vekirina Qanal Şeşê (6) mirov dibîne ku gelek akademîsyen, lêkoler, nivîskar û rojnamevanên ku heta niha cesaret nekirine derkevin pêş, hêdî hêdî di bernameyên vê qanalê de dibin beşdar û xebatên xwe didin nasîn. Ez bawer dikim ku ev prosesa destpêkirî di salên pêş me de, wê di unîversîteyên wek Diyarbekirê, Wan, Mêrdîn, Riha û Erzeromê de jî berdewam bike.

Her wisa jî hin lêkolerên kurd ji Kurdistana Sûriyeyê wek Omer Şêxmûs, Konê Reş û hin kesên din bi lêkolînên xwe alîkariya kurdnasiyê dikin.

Di nav van bîst salan de her wisa jî hin kovarên ku giraniya xwe dane lêkolînê derketine. Lêkoler gelek hewceyî weşanên periyodîk ên lêkolînê ne. Di vî warî de kovarên bi navê *War* (paşê bû *Bîr*), *Vesta* (niha dernakeve), kovara *Zend* (weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê) û *Vate* (zazakî derdikeve) bi îmkânên xwe yê bi sînorkirî bala xwendevanan kişandin an jî dikişînin ser karên lêkolînê.

Encam

Beriya her tiştî divê lîsteya hemû tezên doktorayê û masterê (lîsansa bilind) ku heta niha di unîversîteyên cîhanê û navendên lêkolînê de li ser kurdan hatine kirin, bi sistematîk bînin derxistin. Bi vî tehrî lêkolerên mayî dikarin der barê van xebatan de bibin xwedî agahî, ji tecrûbeyên berê çêkirî sûdekê werbigirin. Ew xebatên ku wek destnivîs di refên arşîvan de mane divê wek pirtûk yan jî wek rapor bînin weşandin.

Di warê lêkolînên li ser kurdan de divê sermayeyek bê razandin, lêkoler alîkariya madî bibînin ku ew karên xwe bi rihetî pêş ve bibin. Li welatên Ewropayê di vî warî de sermayeyeke mezin tê razandin, wek mîsal lêkolereke swêdî Christina Svens ku li Unîversîteya Umeå kar dike, di sala 2008'an de tenê ji bo lêkolîna mijara bi navê *Cînsiyeta Civakî û*

Etnîsîte di Tiyatroya Kurdî de li Swêdê bi qasî 1 320 000 kron alîkarî ji Heyeta Lêkolînê li Swêdê wergirtiye. Ji bo ku her lêkolînek ked, wext û baldariyeke mezin dixwaze divê zihniyeta sazkirina fondan, dayîna bursan, pêşkêşa xelatan wek sê faktorên teşwîqkirinê di nav kurdan de jî bibe edet. Gelek pirsên din jî hene ku hatine jîbîrkin, wek mîsal qet kes pirsar arşîv û dokumetasyonê nîqaş nake, gaveke biçûk nayê avêtin. Tenê mirovên sade, wek Lutfî Baksî li Swêdê bi îmkânên xwe yê şexsî hewl didin ku hin tiştên li ser kurdan biparêzin ji bo ku ew wînda nebin, di pêşerojê de bigihîjin nîfşên tî. *Tişt neyên parastin, wînda dibin!*

Akademîsyen û lêkolerên ku ji Kurdîstana Bakur tî divê di nav xwe de qet nebe her sal konferansekê pêk bînin, di nav xwe de bidin û bistînin û torên tîkiliyan deynin. Her wisa jî divê di warên ziman, folklor, edebiyat, dîrok û etnografayê de komên din bî sazîkirin, ew jî di nav xwe de tîkiliyan deynin. Kurdên li Tîrkiyeyê ku hejmara wan îro nêzikî bîst mîlyonan tî hesibandin, wek me li jor jî diyar kir, li vê beşa welêt hejmara lêkolerên ku bi salan li ser kurdan kar dîkin bi qasî bîst kesian tune ne, serê her mîlyonek kurd hema bêje akademîsyen yan jî lêkolerekî kurd nakeve! Ev wêneyê ku mirovan dîlsar û bînteng dîke,

diêşîne divê bê guhartin yan jî mirov qet nebe li ser vê pîrsê hinekî bifikire. Neteweyên ku di warê pêşketina ziman, folklor, edebiyat, dîrok û etnografya xwe de, xwe nelivînin, sermayeyekê ranezînin, pê kêfxweş û serbilind nebin, gelo wê çawa di rojên pêş de xwe (bi his û bi dil) emîn bihesibînin û berê xwe bidin pêşerojê?

Têbînî: Pirtûka Litfî, Mîr Bedîrxan, ji aliyê Dr. Fadîl Bedîrxanoglû ve bo tîrkî û kurdî hatiye wergerandin û di gelawêja 2006'an de ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve hatiye weşandin. (Kovara W)

¹ Jac. Jon., Björnsthål, Resa til Frankrike, Italien, Sweitz, Tyskland, Holland, England, Turkiet och Grekland, femte delen, 1780-1784. Efter des död utgiven af Carl Christof Gjörwell.


² Nivîskar û lêkoler Rohat Alakom niha li Swêdê dimîne. Çend pirtûkên wî: Dused Saliya Kurdnasiyê (1987), Di Edebiyata Tîrkî ya Nûjen de Tema Kurdan (1989), Di Çavkaniyên Swêdî de Motifên Kurdî (1991), Serpêhatiya Jîbîrkinê: Seîdê Kurdî (1991), Di Berhemên Yaşar Kemal de Tema Kurdan (1992), Jana Ziya Gökalp a Mezin: Kurd (1992), Li Kurdistanê Hêzeke Nû: Jinên Kurd (1995), Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan (1994), Kurdên Îstebola Kevn (1998), Rêxistina Xoybûn û Serhildana Araratê (1998), General Şerîf Paşa (1998), Pêwendiyên Swêdiyan û Kurdan di Nav Hezar Salan De (2000), Kurdên Anatoliya Navîn (2003), Arîstokratên Kurd: Torin (2004), Kurdên Swêdê (Serklend, 2006), Ronahiya Dîrokê (Aran, 2008).

³ Mehmet Alagöz, Old Habits Die Hard, A Reaction to the Application of Tanzimat Edict: Bedirhan Bey's Revolt, MA Thesis, Boğaziçi University, Istanbul, 2003. Zehra Ayman, Bellek Mekan Olarak Sınır ve Ötekilik; Kars Şehri, İstanbul Bilgi Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü. Kültürel İncelemeler Yüksek Lisans Programı, 2005. Zeynep Kutluata, Gender and War During the Late Otoman and Early Republican Periods: The Case of Black Fatma(s), Sabancı Üniversitesi, 2006.

⁴ Binêre: Artakalanlar, E Yayınları, 2006.

⁵ Ev komîsyona ji van kesian pêk tî: Namık Kemal Dinç, Şilan Hazar, Barış Baydağ, Sezen Bilir, Alişan Akpınar, Bersi Yetkin, Serhat Bozkurt.

SÊ BERHEMÊN ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ



Daxwaza kurdan perwerdehî ye ne kurdolojî ye

Samî TAN

Geştiyar û mîsyonerên ku hatine Kurdistanê ji bo karibin bi kurdan re têkiliyeke baştir saz bikin û bi hêsanî armancên xwe pêk bînin, hinek materyal berhev kirine û ew materyal wekî pirtûk çap kirine.

⁶ Lûtîfî (Ahmed Ramiz), Emir Bedirhan, Bgşy Yayınları, 2007.

Hin mijar têkildarî qewimîn û rûdanên siyasî, civakî aktûel dibin, dikevin rojeva civakê. Mijara kurdolojî ango kurdnasiyê jî bi qewimînên siyasî re ket rojevê. Berî hîlbijartinên 29'ê adara 2009'an, piştî ku di sersala 2009'an de TRT'ê dest bi weşana kurdî kir, rayedarên dewletê diyar kir ku dê li hinek zanîngehan beşa kurdolojiyê vebin. Bi vê yekê re jî li ser mijarê gotûbêjeke berfireh dest pê kir.

Berî ku em li ser vê mijarê bîr û boçûnên xwe binivîsin, pêşî em hinekî li ser têgiha kurdnasiyê rawestin. Kurdnasî hemû tiştên têkilî kurdan dike mijara lêkolînê. Mirov dikare bibêje ku kurdnasî navê zanista ku kurdan dike warê lêkolînê ye. Vekolana ziman, çand, dîrok, erdnîgarî kurdan ji aliyê zanistî ve ye. Rêbazên beşên zanistê yên mîna zimanzanî, civaknasî, etnolojî, antropolojî, dîrokanî, gelnasî di kurdnasiyê de tînin bikaranîn.

Dema ku mirov bala xwe dide xebatên der barê kurdan de mirov dibîne ku ew xebat bi piranî ji hêla rojhilatnasan ve hatine kirin. Armanca van xebatan bi gelemperî ne zanistî ye. Geştiyar û mîsyonerên ku hatine Kurdistanê ji bo karibin bi kurdan re têkiliyeke baştir saz bikin û bi hêsanî armancên xwe pêk bînin, hinek materyal berhev kirine û ew materyal wekî pirtûk çap kirine.

Xebatên kurdnasiyê hin caran jî ji hêla ajan û balyozên hin dewletan ve hatine kirin. Armanca wan kesan jî pêkanîna daxwazên dewleta xwe bûye. Dema ku em bala xwe didin cihên ku lê kursî û enstîtuyên kurdolojiyê vebûne, em dibînin ku têkiliyeke rasterast di navbera van beşan û xebatên dîplomatîk ên welatê ku ew lê

xebatê dikin de heye. Bo nimûne, li Rûsya û Yekîtiya Sovyetê wekî perçeyekî xebatên siyasî yên van dewletan xebatên kurdnasiyê hatine kirin. Di vî warî de mînakê herî berbiçav A. Jaba ye. Her wekî tê zanîn Jaba Serbalyozê Rûsyayê ye Erziromê ye.

Dema ku mirov bala xwe dide beşên zanistî yên têkildarî gel û neteweyan, mirov dibîne ku ew jî perçeyekî xebatên dîplomatîk ên wan gelan in. Ji ber vê yekê gelên ku xwedan dewlet in, karîne alîkariya zanyarên beşa têkildarî xwe bikin û warê têkildarî xwe bi pêş bixin. Di vî warî de nimûneya herî berbiçav turkolojî ye. Pîrî caran rayedarên Tirkîyeyê pere dane hinek "zanyar" an û wan jî gelek teoriyên balkêş li ser nasname û zimanê tirkî derxistine holê.

Divê em ji bîr nekin ku li bin teoriyên mîna "Güneş Dil Teorisi (Teoriya Zimên a Rojê)", "Güneş Tarih Teorisi (Teoriya Dîrokê ya Rojê)" navê profesorên heye. Ev teoriya ku tirkî di navenda şaristaniya mirovahiyê de bi cih dike û zimanê tirkî wekî rojê, zimanên din jî wekî tîrêjên wî nîşan dide, bi destên hinek profesorên hatiye amadekirin.

Ji ber ku kurd nebûne xwedandewlet, kurd bi têkiliyên şexsî, bi dilxwazî û pîrî caran jî li gorî pêdivî û berjewendiyên dewletan bûne mijara baldarî û lêkolînê. Ji ber vê yekê rewşa kurdnasiyê jî li gorî helwest û berjewendiyên dewletan guheriye. Niha ji ber ku têkoşîna kurdan di qada navneteweyî de deng vedaye, di vî warî de hinekî pêşketin heye. Lê dîsa tiştê diyarker berjewendiyên dewletan in. Gelek dewlet ji bo jî xwe re kadroyan bigihînin, beşên kurdnasiyê vedikin. Ev ne tiştê sosret e, tiştê asayî ye.

Heke werin ser rewşa Tirkîyeyê, her wekî tê zanîn, deriyê zanîngehan ji kurdîniyê re girtî ye. Heta niha destûr nehatiye dayîn ku zanyar li ser kurdan xebatê bikin. Zanyarên ku li ser kurdî xebitîne, tûşî zordestiyê bûne. Di vî warî de mînakê herî berbiçav Îsmail Beşikçi ye. Heta niha xebatên ku li ser kurdan hatine kirin, ji bo xurtkirina bingeha polîtîkayên red û înkare bûne. Hinek kesên ku navê profesoriyê li ser e, pirtûk ji bo înkarkirina kurdan nivîsandine. Ji wan kesan Prof. Dr. Cahît Gulensoy qaşo li ser etîmolojiya zimanê kurdî pirtûkek nivîsandîye. Di wê pirtûkê de peyva "îsot" wekî "ısı otu" hatiye nîşandayîn. Hinek peyvên ku ji tirkî derbasî kurdî bûne wekî nîşaneyê tirkbûna kurdan nîşan dane. Her wiha hinek peyvên ku ji kurdî derbasî tirkî bûne ji bi heman armancê bi kar anîne. Xebatên bi vî rengî hê ji li zanîngehên Tirkîyeyê ji xwe re cih dibînin, kesên bi vî rengî hê ji nasnavê zanyariyê bi kar tînin.

Bi weşana TRT6'ê re vekirina beşên kurdolojiyê jî hatine rojevê. Li gorî hinek gotegotan li hin zanîngehan xebatên vekirina beşên kurdolojiyê ber bi kutabûnê ve diçin. Di vî warî de herî zêde navê Zanîngeha Artûklûyê ya Mêrdînê, Zanîngeha Stenbolê û Zanîngeha Enqereyê derbas dibe. Heta niha gava herî berbiçav ji hêla Zanîngeha Bîlgîyê ve hatiye avêtin, li vî zanîngehê waneyên zimanê kurdî wekî waneya vebijêrkî dest pê kiriye. Niha komek xwendekar di du astan de hînî zimanê kurdî dibin.

Wekî din em der barê naveroka xebatên ku tên kirin de tiştekî nizanin. Li gorî hinek gotegotan, YOK ji bo mufredatê ji Enstîtuya Kurdî ya Parîsê alîkarî xwestiye. Tiştekî diyar heye ku dewlet naxwaze saziyên kurdan ên li Tirkîye û bakurê Kurdistanê wekî muxatab bigire. Her wekî çawa dewletê TRT6 bi derfetên xwe vekir, dixwaze beşên kurdolojiyê jî bi derfetên xwe veke.

Heta ku zîhnîyet û pergala heyî ya perwerdehiyê neguhere, zêde nîrx û qîmeta van xebatan nîn e. Divê serê pêşîn dewlet hebûna kurdan, nasnameya wan bipejirîne. Dema ku dewlet nasnameya kurdan, dîroka wan, wêje û zimanê wan wekî pêkhatîyê serbixwe nas neke, beşên kurdolojiyê xizmeta kurdan nakin. Ne tenê beşên kurdolojiyê, perwerdehiya bi

kurdî jî hebe, dîsa xizmeta kurdan nake. Di vî warî de mînakê herî berbiçav rewşa dibistanên rûm û ermenan e. Rewşa wan dibistanan helwest û mebesta dewletê bi awayekî zelal li ber çavan radixe. Lewre jî serê pêşîn divê nasnameya kurdî bikeve bin ewlehiya makeqanûnî û têkoşîna kurdan a demokratîk jî wekî parçeyekî têkoşîna demokratîk a Tirkîyeyê were dîtin. Wê demê derfetên lêkolînê zanistî li ber kurdologan vedibin. Beşên kurdolojiyê jî dikevin xizmeta gelê kurd û demokratîkbûna Tirkîyeyê. Di van mercên heyî de beşên ku vebin dê bi tenê ji bo gihandina kadroyên dewletê û hinek kesên dilxwaz bin.

Ji bilî vî yekê jî wekî Tevergera Ziman û Perwerdehiya Kurdî daxwaza me ne beşa kurdolojiyê ye, perwerdehiya bi zimanê kurdî ye. Lewre jî divê serê pêşîn ji bo gihandina mamosteyan divê di nava peymangêhên perwerdehiyê de beşa mamostetiya zimanê kurdî vebe. Her wiha divê beşên ziman û wêjeya kurdî vebin. Ji bilî vî divê beşên têkildarî kurdî karîger bin, kesên ku ji van beşan derketin karibin ji xwe re karekî bibînin. Bo nimûne niha xebatên ragihandina bi kurdî bi pêş dikevin, lewre jî divê beşên ragihandinê deriyên xwe ji kurdî re vekin. Ji bilî vî yekê jî bo ku kurdî bikeve hemû qadên jîyanê divê hemû beşên zanistî deriyê xwe ji kurdî re vekin. Bo nimûne divê hemû karmendên dewletê yên ku diçin Kurdistanê hînî kurdî bibin.

Mijara rê û rêbaza xebatê, naveroka perwerdehiya ku dê li vir were dayîn, kesên ku li wir mamostetiye bikin, qonaxêke din e. Dema em gihîştin wê qonaxê, em dikarin li serê bipeyivin. Em hê ne di wê qonaxê de ne. Lê her wekî çawa em dibêjin bila hebûna kurdan û têkoşîna kurdan muxatab were girtin, divê xebata kurdan a di warê çand û zimanê kurdî de jî were fermîkirin. Saziya kurdan ên ku bi salan e xebatê dikin gelek berhem afirandine, kadro gihandine, divê xebata perwerdehiya kurdî jî bi van kadroyan dest pê bike.

Bi kurtasî mijara kurdolojiyê jî her wekî TRT6'ê heke li ser bingeha pejirandin û fermîkirina têkoşîna gelê kurd pêk neyê, zêde qîmeta wê nîn e. Wekî din jî, daxwaza kurdan ne kurdolojî ye, perwerdehiya bi zimanê kurdî ye; ji pêşdibistanê heta zanîngehê.

Efrasyab Hewramî: Kurdnasên Sovyetê li pey berjewendiyên dewleta xwe bûne

Hevpeyvîn: Azad ZAL- Serwet DENÎZ

Min hez dikir ez bizanibim siyaseta Sovyetê li ser Komara Kurdistanê çawa bû? Ev bûbû girêkeke mezin li ser dilê min.



Rêzdar Efrasyab Hewramî ji Rojhilatê Kurdistanê ye. Li Sovyeta berê zanîngeh xwendiyê û doktoraya xwe li Ser Komara Kurdistanê (Komara Mehabadê) amade kiriye. Li ser dîrok û jiyana kurdan gelek xebat kirine û wek pirtûk çap kirine. Der heqê xebatên kurdolojiyê û arşîvên li Sovyeta berê û Rûsyayê de em pê re peyivîn. Di vê hevpeyvînê de gelek xalên balkêş derketin holê em bawer in wê bala we jî bikişînin. Lê mijar berfireh bû û Hewramî der barê gelek nêzikahiyên siyasî de jî agahî dan. Gava ku mirov di çarçoveya wan agahiyan de li mijarê dinîhêre rewş zelaltir dixuyê.

W- Mamoste tu dikarî xwe bi me bidî nasandin û kurtejiyana xwe ji bo me bibêjî?

Efrasyab Hewramî- Ez Efrasyab Hewramî, ji rojhilatê Kurdistanê me. Di sala 1984'an de ez ji bo xwendinê çûm Yekîtiya Sovyetê. Di sala 1990'an de min teza xwe ya doktorayê da. Ji 1991'ê heta 1995'an li Enstî-

tuya Rojhilatnasiyê li Moskovayê xebitîm. Doktoraya min li ser Komara Kurdistanê bû. Çend salan ez çûm arşîvê min kar kir. Min hinek belgeyên baş derxist. Li ser têza xwe min, di 1995'an de doktoraya xwe stend. Paşê jî li arşîvxaneyên Sovyetê min xebata xwe dewam kir. Arşîvên Sovyetê gelek in. Zanyariyên li ser hemû perçeyên Kurdistanê tê de hene. Birên konsol û seferatê, birên seyah û tacir û lêkolînên din ên sedsala 19'an û sedsala 20'an, bes divê piçek hewes û dilsoziya mirov hebe. Wekî kurd dewleta me nebûye heta ku arşîva me jî hebe. Divê em li arşîvên beriya Sovyetê, yên Rûsyayê, yên Îranê, Tirkiye û Sûriye û Iraqê bigerin. Bi karkirdin bo peydakirdinê belge û dokument zehmet in. Divê taqet û sebir hebe. Kesê ku sebra wî hebe dikare bike. Divê yekî/e ku zimanê rûsî baş zanibe, hinek ji dîroka kurdan agahdar be hebe.

W- Te çima dest bi xebateke bi vî rengî kir?
Çima ev xebat, çima ne beşeke din?

E. H.- Gelek tişt li ser Komara Kurdistanê hatibûn nûsîn. Zêdetirê wan bê belge bûn. Min hez dikir ez bizanibim siyaseta Sovyetê li ser Komara Kurdistanê çawa bû? Ev bûbû girêkeke mezin li ser dilê min. Min dixwest ez van tiştan hîn bikim, eşkere bikim. Ez çûm arşîvê. Komara Kurdistanê bi piştgiya Sovyetê hatibû damezirandin. Wê çaxê leşkerên sor li Kurdistanê bûn. Li mintiqeyên ku nifûza Sovyetê lê hebû. Çima Komara Kurdistanê têk çû? Bandora Sovyetê di wê têkçûnê de çêbûbû? Min dixwest ez wê problemê hîn bibim. Min gelek belge derxistine. Di kitêbên min de hene. Lê kitêbên min bi soranî ne. Ez hêvîdar im li kurmançî jî werine wergerandin.

W- Di xebatên te de çi astengî derketin pêşiya te? Ew girêka dilê te çareser bû? Te belge tev derxistin?

E. H.- Ez bo Komara Mehabadê dikarim bibêjim erê. Min gelek tiştên hêja derxistin. Nêhîniya (secret) dewletan heye. Dewlet hemû tiştî nade. Ez nabêjim ji sedî sed lê belgeyên ku min dixwestin min ew bi dest xistin.

W- Em werin ser xebatên te, heta niha xebatên ku te kirine çi ne? Wekî nav jî tu berhemên xwe dikarî bibêji?

E. H.- Ev dema ku derbas bû min arşîv vekolan, li belge û dokumentan geriyam. Min gelek belge û dokumantên der barê perçeyên din ên Kurdistanê de jî dîtin. Li ser Başûr, Bakur, Rojhilat heta kurdên Xorasanê, kurdên bakurê Îranê. Gelek zanyarî di raporên konsolosxaneyê wan a salên 1920, 1930 heta 1945'an de heye. Ew rapor şandine jî bo Moskovayê. Li ser eşîran, li ser bizava rizgarîxwaz, li ser serhildanên kurdan, li ser ziman, li ser dîrok, li ser ekonomî û li ser etnografiya kurdan gelek tişt hatine nivîsandin. Min ev tev berhev kir, kom kir û hinek jî vana wek pirtûk çap kirin. Wek mînak pirtûka min a yekem ku li Başûr çap bû "Berzanî di Arşîvên Sovyetê de" min jî van belgeyan amade kir. Pêvajoya 1945 heta 1950'yî di vê pirtûkê de cih digire.



Hinek jî van belgeyan jî min di kovar û rojnemeyan de çap kir. Bes li ser Komara Kurdistanê (Komara Mehabadê) min doktoraya xwe nivîsî. Li ser têkiliyên Qazî Mihemed ligel hikûmeta Îranê, ligel hikûmeta Azerbeycanê. Beriya komarê komeleya J.K. (Jiyanayew Kurd) hebû. Pirtûkeke min a din jî bi nave "Rûdavên Rojhilata Kurdistanê Heta Komara Mehabadê" ye. Du pirtûkên min jî li ser kurdên Sovyetê ne. Ez dixwazim pirtûka sêyemîn jî binivîsim. Gelek kurd li Sovyeta berê hene piraniya wan li ser axa xwe nemane. Di dema Stalîn de hatine sirgûnkirin. Ji bo Qazaxistan, Qirxizistan û Turkmenistan. Min du tiştên dijberî hev dîtin. Serdema Komara Mehabadê goya Sovyet alîkariya kurdan dike. Bes di heman demê de kurdên Sovyetê sirgûn dike. Ev kirin dijberî hev in. Ji bo min pirseke gelek girîng e, çima Kurdistanê Sor hat hilweşandin? Navê wê yê fermî "Kurdistanê Pişt Qafqasê" bû û xwedî otonomî bû. Ji 1923'yan heta 1929'an hebûye. Emrê wê heft sal e. Çima hat hilweşandin min di pirtûka xwe de qala van tiştan kiriye. Kurdên Sovyetê bi piranî li derveyî cihê (axa) xwe dijîn. Di dema Stalîn de li neh komarên Sovyetê hatine belavkirin. Nehiştin vegerin. Gelek milletên din jî hatin sirgûnkirin. Wekî çeçen, wekî qal-

mûk.... 11 millet in. Hemû piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn bi taybetî jî piştî mirina Stalîn vege-riyan welatê xwe. Otonomiya xwe, hikûmeta xwe, parlemena xwe, kitêbxaneya xwe; her tiştê xwe bi zimanê xwe çêkin.

W- Ev sirgûnkirin ji ber nêzikahiya Stalîn bû ne wisa? Stalîn çima wisa kir û milletên din tev vege-riyan ser axa xwe çima nehiştin ku kurd vege-riyan?

E. H.- Dema sirgûnkirinê bi şev eskeran çû dora gundên kurdan girtin, gotin em ê we ji vir bibin ji bo ewlehiya we pêwîst e. Em ê jiyana we biparêzin. Bes wisa nebû. Gotin ku heke şer biqewime wê Tîrkiye û Îran alîkariya Almaniyayê bikin. Îran jî arî ye dê kurd jî alîkariya Îranê bikin. Alîkariya Tîrkiyeyê bikin li dijî Sovyetê. Ji kurdan bawer nedikirin. Jixwe piraniya mîrên wan di şer de bûn. Li gundan tenê jin, zarok, kal û pîr mabûn. Milletê me jî bawer kir. Got Sovyet ji bo gelê xwe dilsoz e ji bo ewlehiyê me dîr dixê. Lê beriya sirgûnkirinê Kurdistanê Sor hat hilweşandin. Ev pîrseke girîng e. Bi baweriyê min Sovyetê ji kurdan şik û guman dikir.

W- Li gor belge û dokumantên te bi dest xistine bandora Tîrkiyeyê li ser hilweşandina Kurdistanê Sor, sirgûnkirina kurdên Qafqasyayê û tîkçûna Komara Mehabadê çi ye? Bandoreke bi wî rengî heye yan na?

E. H.- Wek belge ez rastî tiştêkî nehatim. Dibe ku hebin lê min nedîtin. Bêguman serdema hilweşandina Kurdistanê Sor tîkîliyên Sovyet û Tîrkiyeyê pir xweş bûn. Lê di serdema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de tîkîliyên wan baş nebûn. Di serdema hilweşandina Kurdistanê Sor de tîkîliyên Sovyet û Îranê jî gelek baş bûn. Min hinek belge dîtin tê de dibêje ji ber ku kurd misilman in hestên wan ligel welatên misilman in. Wekî Tîrkiye û wekî Îran. Heta li gelek cihan kurdan tawanbar dikin ku kurdan alîkariya tirkan kirine. Alîkariya Îranê kirine. Ez ne bawer im ku bandora Tîrkiyeyê li ser hilweşandina Kurdistanê Sor tune be. Wek belge di sala 1934 û 1935'an de li Sovyetê konferansa çand û zimanê kurdî li dar dikeve. Wê wextê konsolosê tirk gelek

rexne û protestoyên xwe arasteyî hikûmeta Sovyetê dike. Nerazîbûna xwe nîşan dide. Dibêje çima hûn wê konferansê li dar dixin? Mebesteke siyasî ya veşarî ya vê konferansê heye yan tune ye? Helwesta Îranê jî bi heman awayî ye. Rayedarên Sovyetê bixwe jî dibêjin di doza kurdan de berjewendiyên me û Tîrkiye û Îranê yek in. Em jî li dijî avakirina dewleta kurd in. Dibêjin emperyalist di ser Kurdistanê re êrîşî me, Qafqasyayê dikin. Ev girîngtirîn belge bû ji bo min di arşîvên Sovyetê de. Sovyet tu wextê ligel doza kurdan nebûye. Ew dibêjin kurd hemwelatîyê me yên dilsoz in lê gelek belge wisa nabêjin.

W- Di van xebatan de ji bo te tiştên herî balkêş çi bûn?

E. H.- Siyaseta Sovyetê ya li ser doza kurd ku min berê qal kir. Tiştên ku min berê xwendibûn û dizanibûn tev dijberî belgeyan bûn. Di pirtûk û rojnameyên Sovyetê de tê gotin ku Sovyet piştigiriyê dide gelek milletên bindest. Da ku mafên xwe bi dest bixin. Bes ne tenê Sovyetê piştigirî nedaye kurdan, alîkariya dewletên dagirker kiriye. Ji bo ku tevgerên rizgarîxwaz ên kurdan tîk bibin. Li hemû perçeyên Kurdistanê wisa dikin

W- Piştî tîkçûna pergala sosyalîzmê polîtîkayên Rûsyayê guherîn an na?

E. H.- Ez bawer nakim. Stratejiya wan di dema hemû rejîman de yek e. Siyaseta wan heta niha neguheriye. Mînak Rûsya dostê Îranê ye heta niha min nûçeyêke der barê Rojhilatê Kurdistanê de di rojname, tv û kovarên Rûsyayê de nedîtiye. Tîkîliyên wan yên aborî ligel Tîrkiyeyê jî pir baş in. Wextê azadkirina Iraqê di bin serokatiya Amerîkayê de Rûsya xwedî helwesteke dijber bû. Sedam hem ligel Sovyetê û him jî ligel Rûsyayê gelek peymanên aborî mohr kiribû. Berjewendiyên wan destûra helwestên cihê nade, dijberî kurdan in. Di hilweşandina komara Kurdistanê Sor, Komara Kurdistanê û tîkbirina Serhildana Agiriyê de destê Rûsyayê heye. Demekê min li arşîvên Sovyetê yên salên 1920'î xebat kir. Min li weşanên wan ên sereke wek "Pravda" û "Îzvestiya" yê nihêrî. Bi çavekî dijminane li serhildanên kurdan dinihêrin.

W- Tê gotin ku di dema serhildana Agiriyê de balefirên Sovyetê jî Çiyayê Agiriyê bombe kirine. Di belgeyan de tiştêkî wisa heye?

E. H.- Min di belgeyan de ev yek nedît. Dixwazim tiştêkî bibêjim di nivîsên ku min dîtî de dijberiya Sovyetê ya li hemberî serhildanên kurdan pir aşkere ye.

W- Wek xebat, proje çî li ber destên te hene?

E. H.- Gelek tişt li ber destên min hene. Ez dixwazim wan temam bikim. Li ser karesatên ku hatine serê kurdên Sovyetê gelek tiştên din binivîsim. Min gelek tiştên nû di belgeyan de dîtî. Ez dixwazim li ser têkiliyên kurd û ermenan xebatekê bikim. Li gor belgeyên di destên min de ermenan bi alîkariya rûsan gelek kurd kuştine (di dema Şerê Cihanê yê Yekemîn de). Kurd qir kirine. Niha hinek kes dibêjin kurdan jî di qirkirina ermenan de cih girtiye. Li gor belgeyên ku niha teze ketine destên min tiştêkî wisa tune. Ermenan negotîne “ev kurd e, ev tirk e, ev çerkez e” gotîne “misilman e” û bi çekên rûsan li wan dane.

W- Di dema Şerê Cihanê yê Yekemîn de gava ku Rûsya Kurdistanê dagir dike Evdîlrezaq Bedirxan jî bi wan re ye. Li gor peymanê ku danîne dê Rûsya, Ermenistan û Kurdistanê serbixwe ava bike û wê Evdîlrezaq jî bibe serokê Kurdistanê. Têkiliyeke bi vî awayî di navbera wan de heye û paşê ev têkilî xera dibe. Dibêje “min ev kuştin dîtî û ez jî wan qetiyam”. Der barê têkiliya Evdîlrezaq Bedirxan û rûsan de û bûyerên wê demê de belgeyên nû hene yan na?

E. H.- Ne tenê Evdîlrezaq e. Kamil Bedirxan û Yûsiv Ziya Beg, Xalid Begê Cibrî jî hene. Der barê wan de min gelek belge bi dest xistin. Ez hêvîdar im wê bîr çapkirin û wergerandin. Piştî Şoreşa Oktobirê (1917) Rûsya dev ji opozîsyona Îranê û Tirkiyeyê berdide. Der barê kesayet û serokhozên (eşîr) kurdên Bakur de gelek belge û dokuman hene. Konsolosxaneyên wan ên li Kurdistanê gelek belge berhev kirine. Nameyên ku wan kesayetên kurd ji bo Rûsyayê şandine hene. Bersivên ku Rûsya-Sovyetê daye serokhoz û

kesayetên kurd hene. Nêzî pêncsed belge hene. Min ew di şeş, heft salan de berhev kirine. Gelek belge û mijar hene mirov nikare behsa tevan bike.

W- Em werin ser mijareke din. Hinekî qala xebatên kurdolojiyê bikin. Bi te “kurdoloji” çî ye?

E. H. - Ez naxwazim bi têgehan bibêjim ev e, ev e. Lê ez dikarim vêya bibêjim wek dewleteke/împaratoriyeke mezin Rûsya cîranê Kurdistanê bûye. Û bi demeke dirêj bi Îran û Tirkiyeyê re şer kiriye. Rûs hatine Kurdistanê. Gelek lêkolîn jî kirine. Lêkolînên wan di arşîvên Sovyetê de hene. Ez dixwazim tiştêkî balkêş bibêjim; kurdnasên rûs li ser polîtîkayên çewt ên Rûsyayê yên der barê kurdan de tiştêkî nenivîsîne.

W- Tu dikarî çend mînakên bidî?

E. H.- Belê. Wek Lazarov. Lazarov dibêje “helwesta Rûsyayê ya dema qeyzeriyê (çarîfî) li hember kurdan nebaş bûye”. Piştî têkçûna Sovyetê bi derketina belgeyên nû em bi nêrînên wan ên têkildarî Serhildana Agiriyê, Şêx Seîd û hwd. hesiyar. Dîsa wek mînak wan kurdnasan li ser kurdên Sovyetê tiştêkî nenivîsiye. Ew qas trajedî û karesatên ku hatine serê kurdên Sovyetê yek jî nenivîsîne. Ez dixwazim tenê tiştêkî bibêjim. Kurdnasên Sovyetê li pey berjewendiyên dewleta xwe bûne. Gelek tiştên ku min paşê dîtîne beriya min hinek kurdnasên Sovyetê dîtîbûn. Lê dewleta Sovyetê nehişt ku ew belge bi tevahî werin belavkirin. Lewre li dijî berjewendiyên siyaseta dewleta Sovyetê bûn. Piştî têkçûna Sovyetê niha mecal heye. Min çend jî wan belgeyan belav kir. Ez dixwazim wiha bibêjim “rast e, li Rûsyayê hinek tişt hatine nivîsandin. Lê wek kurd divê em jî bo xwe lêkolînan bikin, wek dîrokzan, wek zîmanas, wekî etnograf.... Yanî nêrîna me ya li van nivîsan (belgeyan) çî ye. Rûs jî bo dewleta xwe tiştêkî xerab nanivîsin û nabêjin “dewleta me bi kurdan re xiyaret kiriye. An jî li kurdên Sovyetê wisa kiriye” Yekî ereb, yekî tirk, yekî rûs qebûl nake ku hinekî din dîroka wan binivîsin. Kurdnasên Sovyetê kelk jî serçaviyên, belgeyên kurdî wernegirtine. Ji

ber vê yekê em kurd bi xwe divê der heqê rap-erînên xwe de binivîsin û wek pirtûk belav bikin. Li Sovyet û Rûsyayê gelek kar hatine kirin. Lê ev xebat li Rûsyaya niha roj bi roj kêmtir dibin. Yên ku dixebitîn hinek jê mirin û yên mayî jî kal bûne. Kesên ciwan naçin di wan beşan de naxwînin. Rûsya li gor berjew-endiyên xwe tevdigere, ji bo lêkolînên der barê kurdan de pisporên xwe peywirdar nake.

W- Dewletên dagirker der barê welatên ku dê dagir bike de lêkolînan dikin. Lêkolînên etnografîk, aborî û hwd. Ev xebat jî bi piranî bi destê wezareta karên derve tên kirin. Ji bo berjewendiya xwe dikin. Li Rûsyayê jî der barê kurdan de piştî salên 1800'î heta niha gelek xebat hatine kirin û belge hatine berhevkirin. Cihê van xebatan di nav xebatên kurdolojiyê de, xebatên li ser kurdan hatine kirin de çi ye?

E. H.- Kêm û korîtî hebûn, şaşîtî hebûn. Yên ku ev kar dikirin hemû ne kurdolog bûn. Dixwestin gelek tiştan binivîsin lê siyaseta wan destûr nedida. Yekî wek Lazarov, ew mamosteyê min bû, gelek xebat li ser kurdan kirine. Berê di pirtûkên xwe de gelek tişt nivîsibû lê sansur kiribûn. Siyaseta wan destûr nedabû ku belav bibin. Wek ku min di serî de jî got kêmtir û korîtî hebûn lê di nav xebatên giştî de xwediyê cihekî diyar, berbiçav in. Gelek tiştên baş hatine kirin. Hem der barê ziman de û him jî der barê dîrok û etno-grafiyayê de. Cihê wan diyar e û xwedî nirx in û xebatên nirxdar in. Xebatên ku li Sovyetê û Rûsyaya berê hatine kirin ji tevahiya xebatên din zêdetir in. Partiyên siyasî yên kurd çepgir bûn û têkiliya wan a ligel Sovyetê baş bû. Lê serokên rêxistinên kurdan tu carî ji xwe nepirsibûn, negotibûn "çima mafên kurdên Sovyetê tune ne? Çima Kurdistana Sor hatiye hilweşandin?" Min di pirtûkên xwe de qala van tiştan tevan kiriye. Li Sovyetê gelek millet hebûn ku hejmara wan ji kurdan pir hindiktir bû lê xwedî komar û otonomî bûn. Lê çima li kurdan wisa kirin? Dibêjin bandora Stalîn an jî Baqirov (serokê Komara Azerbaycanê) hebû. Wisa be çima di dema Xuruşov de ew şaşîtî nehatin rastkirin. Ku Xuruşov nekir çima Brejnev nekir. Ez dixwazim vê yekê

bipirsim. Piraniya hêzên me yên siyasî çepgir bûn, Sovyet wek dostê xwe dizanibûn lê rastî wisa nebû.

W- Tu dibêji negotine "Sovyet mafparêz e lê çima mafên kurdên nav xwe naporêze?"

E. H.- Ne tenê ew. Wextê sirgûnkirinê ew kiribûn vagonên ajalan û biribûn Qirgizistanê. Di rê de gelek jin, kal, pîr û zarok mirine. Laşê wan avêtine ser berfê. Û çima nehiştin vegerin. Pirsar bingeşin ev e. Min bi gelek kurdnasên Sovyeta berê re qise kir. Û min got "we çima heta niha li ser kurdên nav xwe pirtûkek, gotarek nenivîsi?" Gava ku têkiliya wan û Sedam xera bûye piştgirî dane kurdan. Lê di hinek deman de rewşa kurdan pir xerab bûye lê Sovyetê piştgirî nedaye. Wek sala 1975'an Sovyetê dikaribû pêşiya wê pêvajoyê bigire. Lê nekir. Sovyet jî wek dewletên din li gor berjewendiyên xwe tevdigeriya û nedixwest kurd bigihîjin mafên xwe. Ji welatên sermayedar xerabtir tevgeriya.

W- Ez dixwazim Baqirov bipirsim. Di gelek kar û barên li dijî kurdan de navê wî derbas



dibe. Ev kî ye û derdê wî çî ye? Çima ev qas dijminahiyê bi kurdan re dike?

E. H. - Ez jî wisa difikirîm û min gelek tişt dîtîbûn. Lê em nikarin Baqirov tenê tawanbar bikin. Ew kesek bû. Moskovayê her tişt dizanibû. Serokê Azerbaycanê bû, endamê Komîteya Navendî ya Partiya Komunîst bû. Lê Baqirov bêtêr destûra Moskovayê nikaribû tiştêkî wisa bike. Karmendekî herî biçûk jî bêtêr destûra Moskovayê nikaribû tiştêkî bike. Der barê doza kurd de gelek tişt bêtêr Baqirov hatine kirin. Tenê di serdema Baqirov de nehatine kirin piştî mirina wî jî hatin kirin. Di lêkolîn û tehlîlên xwe de ez gihîştîm vê encamê; rast e bandor heye. Lê kurdên Ermenistanê hene. Karmendên ermenî bêtêr destûra Moskovayê dikaribûn van tiştan bikin? Li Gurcistanê gelek kurd li ser sînore Tirkîyeyê dijîn. Ew jî hatine sirgûnkirin. Ew jî bi destûra Moskovayê bû. Gelek milletên din jî hatibûn sirgûnkirin lê ew paş ve vegeherîyan. Wek mînak navê "kurd" jî pirtûkên Azerbaycanê hat derxistin. Ji îstatîstîkên serjimaran navên wan hat derxistin. Kurdan jî tirsan xwe li ser milletên din didan nîşandan.

W- Em dîsa vegeherî ser mijara kurdolojiyê. Xebatên ku heta niha hatine kirin çî li Sovyeta berê û Rûsyayê, çî jî li welatên din; di xebatên xwe yê îroyîn de em çawa dikarin sûtê jî wan werbigirin? Ji bo îro bîngeheke baş in gelo?

E. H. - Wek çavkanî em dikarin jê sûtê werbigirin. Wek ku min berê jî got ji ber ku dewleta me tune bûye arşîva me jî tune. Divê em biçin li arşîvên dewletên din; li Londonê, li Parîsê, li Washington, li New York, li Berlîn em bigerin. Çavkaniyên der barê kurdan de bibînin û berhev bikin. Em li encamên xebatên kurdnasên rûs, ewrûpî, Rojhilata Navîn



Efrasyab Hewramî

û welatên din binihêrin. Wan gelek tişt derxistine holê ew ji bo me tiştên baş in. Agahiyên me der barê wan tiştan de tune ne. Lê wan jî her tişt dernexistiye holê. Di arşîvên Rûsyayê de gelek tişt hene lê nadin kesî. Heta ew kes rûs be jî nadin. Li gor zagonên wan her belgeyek demeke wê heye hinek dibêjin 20 sal, hinek dibêjin 50 sal paşê dikarin bîr aşkerakirin. Lê nakin. Em bibêjin der heqê kurdekî de be dibêjin "niha kurên wî hene, torinên wî hene an jî kesên wî yê din hene" aşkera nakin. Ji bo lêkolîneke baş divê em tevahiya çavkaniyên ku li welatên din in vekolin da ku bikaribin bibêjin "filankes wisa nêz bûye, bîvane kes wisa nêz bûye".

W- Tu bi xwe li Rûsyayê dixebitî dikarî bikevî wan arşîvan. Lê kurdekî din ku ji Bakur an Başûr biçê dikare di heman arşîvê de bixebite?

E. H. - Divê mirov kutabîyan (xwendekaran) bişîne wan welatan da ku li wan deran bikaribin bixebitin. Arşîvên Rûsyayê gelek dewlemend in. 38 arşîvên wan hene. Yê wezareta derve hene, yê wezareta şer hene. Şeş, heft arşîvên leşkeriya wan hene. Hinek belge hene 100, 120 sal berê bi destan hatine nivîsandin. Hinek jî wan rîziyane, xera bûne. Rûsek ne mecbûr e ku bi salan jî şeveqê heta êvarê here di arşîvan de bixebite û dîroka

me vekole. Lê em kurd mecbûr in vê yekê bikin. Ku em dixwazin li ser dîroka xwe tiştekî binivîsin divê ji dil em biçin. Car hebû mehek du meh ez diçûm di arşîvê de dixebitîm lê min belgeyek tenê jî bi dest nedixist. Car jî hebû di rojekê de min 50 belge derdixist. Kurdên her welatî dikarin biçin wan arşîvan lê wisa ji ber xwe ve na. Divê bi riya zanîngehan biçin. Zanîngeh an jî enstîtu divê ji bo te nameyekê ji rêveberiya arşîvan re bişîne. Ew ê jî bersivê bidin bibêjin materyalên me hene yan jî tune ne paşê tu dikarî herî. Wisa ji ber xwe ve nabe.

Ez dixwazim di vir de tiştekî bibêjim, dewletên serdest çî kirine, kirine. Ez dixwazim qala şaştiyên hêzên me yên siyasî bikim. Gelek şaştiyên wan hene.

W- Di nav kurdan de nêzîkahiyeke heye; çî kurdekî/e ji rêzê çî jî rewşenbîr gava ku yekî biyanî der heqê me de tiştekî dibêje ew li ber çavên me pir mezin dibe. Em nabêjin wî/wê ji bo berjewendiya dewleta xwe ev kar kiriye. An jî ev gotin li ser kurdan gotine lê berjewendiya wî/wê di vê yekê de heye. Ev hişmendî bi me re tune. Em dibêjin qey her kes qenciya me dixwaze, em ê vêya çawa biguherînin?

E. H. - Sala 1979'an li Îranê şoreş bû. Paşê şer çêbû. Li herêma me Hewramanê der heqê kurdan de ne bi farisî û ne jî bi kurdî tiştek tune bû ku em bixwînin. Der heqê nifûs, etnografya û dîroka kurdî de tiştek tune bû. Lê pirtûkên farisî pir bûn. Tiştek li ser kurdan nehatibû nivîsandin. Yanî ez dixwazim tiştekî bibêjim, rewşenbîrên me, lêkolînanên me heta siyasîmedarên me divê em lêkolînan bikin. Divê haya me ji şaştiyên ku berê hatine kirin hebe. Serokên me an jî xebatkarên siyasî divê serdanên welatên dinê bikin. Gelek kurdên me qasî du milyon û nîvan li welatên derve dijîn. Divê nameyan bişînin ji zanîngeh û arşîvên welatên wek Rûsyayê re û bikaribin biçin li wan deran lêkolînan bikin. Yanî li derve 50 lêkolînerên me tune ne. Ev kêmasî ye. Niha jî tiştên ku li ser me tene nivîsandin divê bîr wergerandin. Heta divê bigihîje destê mamosteyên me û ew jî bidine xwendekarên xwe. Divê di radyo, kovar û rojnameyan de bîr belavkirin. Li nav farisan, tirkan û gelên din gelek dostên me hene. Em dikarin xwe bigihînin wan. Alîkariya wan dostên xwe bikin, çî aborî û çî jî wekî din. Divê em ji sifirê dest pê bikin. Me ev kar heta niha nekiriye. Ez gelek caran çûme Pirtûkxaneya Lenîn (niha jê re dibêjin Pirtûkxaneya Dewletê) mirov nikare 50 pirtûkên der barê kurdan de bibîne. Lê miletên din hene ji kurdan gelek kêmtir in bi sindoqan katalogên pirtûkên wan hene. Yekî rojhilatnas, yekî kurdnas, yekî lêkolîner gava diçe wê derê li ser kurdan tiştekî nabîne. Pirtûkxaneyên me tune ne. Niha li vir çend pirtûkxaneyên we hene?

W- Tune ne

W- Erê ji aliyekî ve em xwendekaran bişînin, lêkolîneran bigihînin. Lê em dikarin saziyên çawa ava bikin? Zanîngehên Başûr çî dikin, di van mijarên ku we rexne kirin de?

E. H. - Li Başûr destûr hebû gelek rojname û kovar hatin belavkirin. Piştî Peymana Adarê hiştin ku li zanîngehan xwendina me hebe. Piştî 1991'ê bi hezaran pirtûk derketine. Pîraniya wan jî ne bi destên partiyên siyasî, bi destên rewşenbîrên me, rêxistinên rewşenbîrî hatine çapkirin. Îro hêsantir e internet heye, werger heye. Gelek tişt bi pereyan tên kirin wek mînak li Rûsyayê digotin "Sedam sosyalîst e". Divê em rastiyê bidin zanîn. Rêxistina mafên mirovan hatibû li Başûrê Kurdistanê komkujiyên ku sedam kirine vekolabû. Wek pirtûk hat çapkirin û li gelek zimanan hat wergerandin. Min jî wergerand zimanê rûsî, gava ku Celal Telebanî hat Rûsyayê ew pirtûk wek diyarî da Pûtîn. Divê em tiştên wisa bikin. Rastiyê bidine zanîn. Ji bo ku nebêjin kurd derewan dikin û rastiyê nabêjin. Tiştên ku Mihemed Emîn Zekî Beg nivîsiye divê em wergerînin zimanên din heta ku mirov diçin ji kurdnasên rûs hîn dibin bila ji wî hîn bibin. Li welatên derve em nehêlin ku kes destên xwe bixe nav kar û barên me. Hizbên siyasî jî divê zêde destên xwe nexin navê, ku dikarin bila piştgiriya rewşenbîrên me bikin. Alîkariya madî û manewî bidin wan.

W- Gelo bernameyên zanîngehên Başûr

hene? Di demeke nêz de tu çûyî wê derê?

E. H.- Na di demeke nêz de neçûme. Xebatên gelek baş hene. Ev tiştên ku niha ez li vir dibêjim min ji wan re jî got. Min gelek caran nêrîn û ramanên xwe ji wan re ragihand. Ez dixwazim ji we re jî bibêjim. Gelek tiştên me li arşîv û pirtûkxaneyên welatên din in. Gelek rewşenbîrên me li wan welatan dijîn piştgiriyê bidine wan, pirtûkên wan çap bikin û bila ew jî li wan deran lêkolînan bikin. Divê di rojname û televîzyonan de cih bidine wan. Bi pêşandan û xebatên siyasî her tişt çareser nabe. Dinya ne dinyaya berê ye divê em xebatên bi vî rengî bikin. Divê em xwe bi gelên cîran bidin qebûlîkirin. Wek mînak ji tirkên re bibêjin “em xwedî dîrokeke hevbeş in. Xwediyê çandekê ne, daxwaza me aştî ye”. Gelek xebatên bi vî awayî divê bên kirin, pirtûkên der heqê kurdan de wergerînin tirkî.

Tevahiya kes û rêxistinên kurdan divê giraniyê bidin lêkolînan, gelek tişt hene xera dibin paşê nayên xwendin. Min bi xwe jî gelek belge dîtîn lê nedihatî xwendin. Çavkanî gelekî kêmtir in, ev çend sal in ez li ser dîroka dixebitîm lê pirtûkeke rast û durist ku mirov bixwîne tune. Wek mînak li Îranê li Xorasanê nêzî milyon û nîvekê kurd hene. Divê mirov lê bikole ka ew kîngê hatine wê derê, çima hatine, çima mane li wê derê? Kurdên bakurê Îranê dema ku rûs hatine reviyane çûne derên din. Nameyên fermanîdarê Rûs Avyarov ji bo serokhozên kurd we xwendiyê. Dibêje “em naxwazin bi we re şer bikin”, yanî wê çaxê li Qafqasyayê kurd xwedî hêz bûne, desthilatdar bûne. Desthilatdarê Erîvanê kurd bûye. Li Rûsyayê kurd ji hev perçe perçe bûne, her hinek li bajarekî ne, rewşa karên wan ne baş e. Lazim e em li wê derê jî lêkolînan bikin, divê ciwanên wan bixwînin. Divê rewşenbîrên me, xebatkarên me gelek hebin. Mînak, min ev pirtûk çap kir kesî nehat nestend û nexwend da ku em bi pereyên wê karibin yeke din jî çap bikin. Gelek jê min da dost û hevalên xwe. Hîç kitêbê naxwînin. Min çû pirtûka Prîmakov stend 80, 90 rûpelên wê li ser kurdan in. Min wergerand û şand Başûr. Di kovarekê de hat çapkirin. Kitêbek 30 \$ e. Salekê bi şev û roj dixebitîm pirtûkekê çap bikim lê kurd

naxwînin. Li Başûr pirtûkek 500 heb tê çapkirin, dîsa jî nivê wê nayê firotin. Nivê wê bê pere didin binkeyên rêxistinên siyasî. Li cem me xwînerên pirtûkan tune ne, divê gelek hebin.

W- Li bakur jî heman pirsgerêk heye.

E. H.- Mînak min li ser kurdên Sovyetê pirtûk nivîsiye li Başûr bi soranî hat çapkirin. Lê divê ez vê pirtûkê bi rûsî çap bikim. Ji bo ku kurdên Rûsyayê bikaribin bixwînin. Kes tune ye ku alîkariyê bike. Divê rêxistinên siyasî û civakî, kesayet di van karan de pey-wira xwe bi cih bin. Divê em li gelên din binêrin. Em jî weke wan pirtûk, kovarzêde bikin. Miletên din bi van xebatan gihîştine asta îroyîn. Min tiştêk ji bîr kir ez wê jî li vir bibêjim, ji bo kurdên Sovyetê heta niha pênc caran alfabe hatine guhertin. Ermenî, latînî, kirilî, rûsî û paşê dîsa vegeriya latînî. Rojnameyek bi navê “Riya Teze” li Ermenistanê derxistine lê ew rojname negihîştîye destê kurdên Azerbaycanê. Berê kurmancî/ê û soranekî/ê bi zehmetî ji hev fêhmî dikirin. Ev deh salên dawîn çûnûhatin zêde bûn, televîzyonan dest bi weşanê kir, bere bere ew tişt (fêhmîkirin) kêmtir bû. Ez nabêjim ji sedî sed ji hevdu fêhmî dikin lê ji sedî heştê, nod fêhmî dikin. Em nikarin wek sosyalîzmê bi zor çêbikin.

W- Spas ji bo ku te dema xwe ji me re veqetand û em hêvî dikin ku em ê hê gelek caran hevdu bibînin û dê pirtûkên we bi kurmancî û tîpên latînî bên weşandin. Ku qeweta me bigihê wek enstîtû em bi xwe jî dixwazin çap bikin.

E. H.- Serkeftin ji bo we û karên we. Ez hêvîdar im hûn ê bi kurdnasên ku li derve ne re jî tîkiliyan deynin. Bikaribin serdana wan bikin. Ez hêvîdar im em ê careke din hevdu bibînin. Mala we ava.

18 Rêbendan 2009

Lêkolînên kurdolojiyê li Fransayê

Salih AKIN

Em nizanin kîngê û li ku cara yekem peyva “kurdoloji”yê bi kar hatiye, ji aliyê kîjan lêkolînerî/an ve hatiye afirandin. Her çiqas em baş nizanibin ev peyv kîngê hatiye çêkirin jî, mirov dikare bibêje ku afirandina peyvê bi lêkolînên bi kurd û Kurdistanê ve girêdayî ye.

Guherînên siyasî yên ku di van çend salên dawîn de li Iraqê û Tirkîyeyê peyde dibin kurdolojiyê careke din dikin mijareke sereke ya rojevê. Piştî fermînasîna zimanê kurdî di zagona Iraqê ya 2005’an de, pêvajoya azadiyê ku di sala 1992’yan de li Başûr dest pê kiribû lêkolînên kurdî gihand qonaxeke nuh. Di piraniya zanîngehên Kurdistanê de, beşên lêkolînên kurdî hatin damezirandin. Kongre û konferansên kurdolojiyê ku berê li derveyî welat dihatin organîzekirin êdî li ser axa welat dikarin bîr sazînin. Konferansa Navneteweyî ya Lêkolînên Kurdî ku di îlona 2006’an de li Hewlêrê û bi beşdarbûna bi sedan lêkolîneran hat lidarxistin yek ji van nîşanan herî berbiçav a pêşdeçûna lêkolînên kurdan e.

Ji aliyê din ve, êdî li Tirkîyeyê jî qedexeyên li ser ziman û edebiyata kurdî hêdî hêdî radibin. Wek tê zanîn, Şaredariya Amedê ji sala 2003’yan û vir ve, her sal payîzê rêzêkonferansekê li ser ziman û edebiyata kurdî li dar dixe û gelek lêkolînerên kurd û biyanî beşdarî van konferansan dibin. Gotarên wan jî wek pirtûk çap dibin.

Bi vekirina TRT 6’ê, ku rojê 24 saetan weşana xwe bi kurdî dike, damezirandina beşên kurdolojiyê di zanîngehên Tirkîyeyê de jî ket rojevê. Wek tê ragihandin, zanîngehên Mêrdîn û Stenbolê dê yekemîn zanîngeh bin ku dê beşên kurdolojiyê vekin. Bêguman, ev pêvajoya dê rê bide ku lêkolînên kurdolojiyê geş bibin û bigihîjin qonaxeke zanistî ya berbiçav.

1. Kurtenêrînek li ser kurdolojiyê

Em dixwazin di vê nivîsê de lêkolînên kurdolojiyê yên li Fransayê bidin nasîn. Lê berê, hewce heye ku kurdoloji wek zanistiyek bê bervedan û ravekirin. Digel girîngiya lêkolînên kurdî, hêjayî gotinê ye ku li ser metod û epîstemolojiya kurdolojiyê xebat nehatine kirin. Ev kêmasî dibe sedema tevliheviyan ku em dixwazin di vê nivîsê de zelal bikin.

1.1. Gotina kurdolojiyê ji ku tê ?

Em nizanin kîngê û li ku cara yekem peyva “kurdoloji”yê bi kar hatiye, ji aliyê kîjan lêkolînerî/an ve hatiye afirandin. Her çiqas em baş nizanibin ev peyv kîngê hatiye çêkirin jî, mirov dikare bibêje ku afirandina peyvê bi lêkolînên bi kurd û Kurdistanê ve girêdayî ye. Ev lêkolîn di sedsala 18’an de dest pê dikin û di destpêka sedsala 20’an de geş dibin.

Kurdoloji, li gor avasaziya zimanê fransî hatiye çêkirin. Wek tê zanîn, peyva “kurdoloji”yê peyveke hevedudanî ye; ango ew ji du peyvên bi hev ve pêk tê; *kurd* û *lojî*. Peyva *lojî* (logos) ji zimanê yûnanî tê û gelek maneyên xwe hene: *Axaftin*, *lêkolîn*, *mentiq*. Her wiha, peyva *lojî* di afirandina navên zanistî yên wek *etnolojî*, *sosyolojî*, *biyolojî* de jî tê bikaranîn. Ji aliyê bîngeh û etîmolojiya xwe ve, kurdoloji dikare weke *lêkolînên kurdî* bê şîrovekirin. Em dikarin peyvên *kurdnasî* / *kurdzanî* yên ku li başûrê Kurdistanê tên bikaranîn wek sînonîmên *kurdolojiyê* qebûl bikin. *Kurdoloji*, bi peyvên *îranoloji* û *turkoloji* re dikeve nav eynî

paradîgmayê.

1.2. *Kurdoloji* di ferheng û ansîklopediyan de

Berî ku em lêkolîn û xebatên kurdolojiyê binirxînin, divê ku em maneya kurdolojiyê ya di ansîklopedî û ferhangan de diyar bikin. Bi qandî ku em dizanin, tu ansîklopediyan, di ravekirina peyvên de, cih nedane kurdolojiyê. Bêguman, tunebûna ansîklopediyên kurdî yek ji sedemên vê kêmasiyê ye. Lê di ansîklopediyên ku bi zimanê biyanî hatine nivîsandin de jî, deqa (madeya) kurdolojiyê tune ye. Wek nimûne, Ansîklopediya Îslamê, di cîlda xwe ya 5'an de, deqeke bi navê "Kurd û Kurdistan"ê çap kiriye. Ev deq jî aliyê kurdologên bi nav û deng yên wek V. Mînorsky, D. N. Mackenzie û T. Boîs ve hatiye nivîsandin. Deqa ku jî 48 rûpelan pêk tê, di çapa 1986'an de hatiye nûjenkirin. Lê, ne di deqê de û ne jî di tevahiya ansîklopediyê de navê kurdolojiyê derbas nabe. Her wiha, di *Ansîklopediya Universalis* (1996) û *Ansîklopediya Britanica* (2000) de jî, tu agahdarî der heqê kurdolojiyê de peyda nabe.

Her çend ansîklopedî cih nedin kurdolojiyê jî, çend ferheng wê didin nasîn. Dîsa jî ev ne ferhengên kurdî-kurdî, lê du ferhengên îngilîzî - kurdî û ferhengeke tirkî-kurdî ye. Ferhenga kurdî-tirkî û tirkî-kurdî ya Îzolî (1992) û ya Torî (1999) cih nadin kurdolojiyê.

Her wiha, di ferhenga J. Blau (1991) a bi kurdî - tirkî - fransî - îngilîzî de, deqa kurdoloji û kurdologê peyde nabe. Balkêş e ku lêkolînereke ku weke kurdolog tê nasîn, di ferhenga xwe de tu cihî nade kurdolojiyê.

Di her du ferhengên îngilîzî - kurdî de ku deqa kurdolojiyê heye, agahdariyeke girîng peyde nabe. Ferhenga Sadalah (2001, r.620) tenê wergera peyvên "kurdology" û "kurdologist"ên bi kurdî dide:

- ✓ Kurdologist. *Kurdzan, kurdnas*
- ✓ Kurdology. *Kurdzanî, kurdnasî*

Di ferhenga tirkî-kurdî ya Farqînî (2000, r.783) de jî, em tenê wergera peyvên "kurdoloji" û "kurdolog"ên bi kurdî dibînin.

- ✓ Kürdolog. *Kurdzan, kurdnas, kurdolog.*
- ✓ Kürdoloji. *Kurdzanî, kurdnasî, kurdoloji.*

Bi tenê ferhenga M. Chyet (2003, r.338), bi ravekirina deqa "kurdologist"ê, der heqê kurdolojiyê de agahiyan dide.

Kurdîzan 1. *Kurdish-speaking. Who knows or speaks Kurdish.* 2. *Kurdologist, one who studies the Kurds, their language, history and folklore.*

Bêguman, maneya ku bala me dikişîne, maneya duduyan e. *Kurdologist* (kurdolog) weke kesekî/e ku der heqê kurdan, ziman, tarîx û folklorê wan de lêkolîn dike tê nasandin. Kurdolog jî wek lêkolîner û pîspore vî karî tê pejirandin.

1.3. Lêkolîn û xebatên li ser kurdolojiyê

Weke ku em dibînin, kurdoloji di ansîklopedî û ferhangan de cihekî mezin nagire, ev yek bi serê xwe jî nîşan dide ku kurdoloji hîn jî negihîştîye qonaxa zanistîyeke gerdûnî. Her çiqas di ansîklopedî û ferhangan de agahdariyeke girîng tune be jî, em baş dizanin ku xebat û lêkolînên kurdolojiyê pir girîng in. Em niha jî dixwazin xebat û lêkolînên li ser kurdolojiyê binirxînin.

Hêjayî gotinê ye ku çavkaniyên me jî şeş lêkolînên di vî warî de pêk tên. Bi awayekî giştî ev lêkolîn peyva *kurdoloji* / *kurdnasiyê* di sernivîsên xwe de bi kar tînin. Em wan li jêr li gor rêza alfabetîk pêşkêş dikin:

- ✓ Bayrak M. 1994, *Açık-Gizli / Resmi-Gayri-resmi Kürdoloji Belgeleri*, Özge yayınları, Ankara, 602 r.
- ✓ Benningsen A. 1960, "Les Kurdes et la kurdologie en Union soviétique", *Cahiers du Monde russe et soviétique*, n°3, Paris, r.513-530
- ✓ Mihemmed H., Nebez C., Marif A., Kurdo Q. 1974, *Kurdnasî li Europe*, Korî Zan-yarî Kurdî, Bexda, 160 r.
- ✓ Mokrî M. 1963, "Kurdologie et enseignement de la langue kurde en URSS", *L'Ethnographie, Revue de la Société d'Ethnographie de Paris*, r.71-105
- ✓ Pirbal F. 1998, *Serçawekanî Kurdnasî*, Ge-

lawejî Niwê, Silemanî, 116 r.

✓ Rohat, 1987, *Kurdoloji biliminin 200 yıllık geçmişi (1784-1987)*, Komkar Yayınları, Köln, 217 r.

1.3.1. Kurdoloji wek lêkolîna dokuman-tasyonê

Di nav çavkaniyên me de, du pirtûk bala me pir dikşînin. Ew pirtûkên M. Bayrak û Rohat in. Ya pêşîn heviyeke mezin dide kesên ku li lêkolînên kurdolojiyê digerin û dixwazin, wek me, wan bixwînin. Lê dema ku mirov pirtûkê vedike û çend rûpelan jê dixwîne, hevîyên mirov ên destpêkê zû pûç û wenda dibin. Bêguman, em bikêrhatina pirtûkê înkarnakin, ew jî bo hemû lêkolîneran çavkaniyeke girîng a dokûmentan e. Pirtûk, bi lêgerîneke dûr û dirêj, gelek dokûment û belgeyên dîrokî, peyman, axaftin, gotar, nivîsên rojnameyan ku der heqê kurd û Kurdistanê de hatine nivîsandin pêşkêşî xwendevanan dike. Ev bi serê xwe xizmeteke mezin e. Lê mixabin, ji van belge û dokûmentan, mirov nikare yekê jî weke lêkolîneke zanistî nîşan bide. Pirtûk weke koleksiyona dokûmentên dîrokî dimîne. Xebatên wiha bi tenê dikarin rola arşîvê bilîzin. Loma, bi dîtina me, bikaranîna “kurdoloji”yê di sernivîsa pirtûkeke wiha de ne karekî di cihê xwe de ye û dibe sedema tevliheviyê. Her çiqas xebat û lêkolînên dokûmentasyonê heja û bikêrhatî jî bin, divê mirov berhemên wiha weke lêkolînên zanistî nîşan nede.

1.3.2. Kurdoloji wek zanistî

Pirtûka din, kurdolojiyê wek zanistiyekê destnîşan dike: *Paşeroja 200 saliya zanista kurdolojiyê (1784-1987)*. Vê pirtûkê bala me gelekî kişand, ji ber ku di lêgerîna me de, me lêkolîneke din nedît ku kurdolojiyê bi vî awayê zelal wek zanistiyekê bipejirîne. Pirtûk jî 15 beşan pêk tê. Beşa yekem destpêka kurdolojiyê û peywendiyên wê yên bi rojhelatnasiyê (orientalizm) ve pêşkêş dike. Beşên din xebat û lêkolînên kurdolojiyê yên li Îtalya, Elmanya, Fransa, Îngiltere, Awusturya, Holanda, welatên Îskandînavyayê, Rûsyaya Çarîtiyê, Yekîtiya Sovyetê, Irak, Îran, Sûriye û li Tirkîyeyê

didin nasîn.

Li gor Rohatê lêkolîner, kurdoloji bi xebata zimanasê îtalî Garzonî dest pê dike. Wî di sala 1787'an de pirtûkek bi navê “*Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda*” (Rêziman û peyvên zimanê kurdî) li Romayê çap kiriye. Rohat, kurdolojiyê wiha rave dike: “*Wek zanistiyekê, kurdoloji beşek ji zanistiya berfireh e ku li ser ziman û edebiyata kurdî, tarîx û etnografyaya kurdî û di gelek warên din de li ser kurd û Kurdistanê lêkolînan li dar dixê*” (r.9). Dûre, ev beşên din diyar dibin: *ziman, edebiyat, huner, tarîx, arkeoloji, etnografya, etnolojî, ol, coğrafya, ekonomî, sosyolojî, hiqûq, bîblîografya* (r.11). Wisa xuya ye ku Rohat zanistê û babet û mijarên lêkolînên zanyariyê tevlihev dike. Em dizanin ku tarîx, arkeoloji, etnografya, etnolojî, coğrafya, ekonomî, sosyolojî wek zanistên sosyal û mirovî tîr qebûl kirin. Ew xwedî metod û teoriyên gerdûnî ne. Lê ziman, edebiyat, huner, ol mijarên lêkolînan in. Wek nimûne, zanistiya ku li zimanê dikole zimanasî (linguistique) ye. Her wiha, mirov nikare bîblîografya, ku xebata berhevkerin û nirxandina çavkaniyan e, wek zanistiyekê bipejirîne.

Divê em li vir balê bikşînin ser zanistiyê bê çî ye û ne çî ye. Zanistî, tevahiya zanyariyên ku xwedî mijareke kifşkirî û nasyaragirtî û her wiha xwedî metodeke taybetî ye. Divê ku babeta zanistiyan hevrêkî (homojen) û xwedî taybetmendiyêke xweser be. Metoda zanyariyê, li ser peywendiyên objektîf ên esehbar binyatkirî ye. Encamên xebatên zanistî gerdûnî ne û ji van encaman teorî derdikevin holê.

Dema ku mirov li zanistî, babet û mijarên ku Rohat di çarçoveya kurdolojiyê de bi nav kiriye dinêre, bi hêsanî xuya dibe ku mirov nikare kurdolojiyê wek zanistiyekê qebûl bike. Weke ku me berê jî got, jixwe tarîx, arkeoloji, etnografya, etnolojî, coğrafya, ekonomî, sosyolojî zanistiyên serbixwe ne. Mirov nikare bibêje ku kurdoloji van zanistiyan hemûyan digire nav xwe. Ji aliyekî din ve, babet û mijarên kurdolojiyê ne hevrêkî ne. Em ê niha li jêr bibînin ku ziman, edebiyat, tarîx, ol, folklor, û hwd. wek babetên sereke yên kurdolo-

jiyê tîn nasîn. Lê zanistiyek bi serê xwe nikare li wan hemûyan bikole.

1.3.3. Kurdolojî wek zanistiyeke înterdîsîplîner

Weke ku em dibînin, sinorên kurdolojiyê pir fireh in. Kurdolojî bi gelek zanistiyên ve girêdayî ye. Ev peywendiyên xurt ên bi zanistiyên din re taybetiyeke înterdîsîplîner dide kurdolojiyê. Ev kesayetî, di çavkaniyên din de jî diyar dibin. Wek nimûne, A. Benningsen (1960), lêkolînên kurdolojiyê di çar beşan de rave dike:

1. Organizasyona perwerdeyê
2. Xebatên filolojiyê
3. Xebatên li ser edebiyat û folklorê
4. Etnografiya – Sosyolojî – Ekonomî – Ol – Tarîx – Polîtîka.

M. Mokrî (1963) jî, di bibliyografiyaya xwe ya lêkolînên kurdolojiyê li Yekitiya Sovyetê de, cih dide tevahiya van beşan û zimanasî û etnolojiyê jî li wan zêde dike. Di pirtûka xwe de, H. Mihemed, C. Nebez., A. Marif, Q. Kurdo (1974), giraniyê didin lêkolînên li ser ziman û tarîxa Kurdistanê. Ji vê jî eşkere dibe ku kurdolojî xwedî taybetiyeke înterdîsîplîner e. Lê dîsa jî ev taybetî nikare statuya zanistiyê bide kurdolojiyê. Metod û teoriyên ku zanistiyên ava dikin di warê kurdolojiyê de nîn in. Taybetmendiya hevbeş ên lêkolînên kurdolojiyê ew in ku ziman, edebiyat, tarîx, folklor û civata kurdî li gorî metod û teoriyên zanistiyên wek zimanasî, etnolojî, sosyolojiyê analîz dikin. Bêguman, mirov nikare metod û teoriyên ku di zimanasiyê de tîn bikaranîn li warê etnolojiyê jî tetbîk bike. Loma, kurdolojî, xwedî metod û teoriyên hevbeş nîn e.

1.3.4. Kurdolojî, wek tevahiya dîsîplînen lêkolînê li ser kurd û Kurdistanê

Em baş dibînin ku ravekirina kurdolojiyê wek zanistiyekê pir zehmet e. Lê rastiya heye ku gelek lêkolîn û xebatên zanistî der heqê kurd û Kurdistanê de, li ser ziman, tarîx, edebiyat û hwd. pêk tînin. Ev lêkolîn li gorî metod û teoriyên zanistî, li ser mijar û babatên jorîn tînin meşandin. **Loma jî, em dikarin kurdolo-**

jiyê weke tevahiya dîsîplînen lêkolînê yê li ser gelekî ku zimanekî hevbeş diaxive rave bikin. Ev dîsîplîn, bi zanistiyên sosyal û mirovî ve girêdayî ne. Ango, lêkolînên fizîkî yan kîmyayî di kurdolojiyê de cih nagirin. Weke ku li jor jî eşkere bû, dîsîplînen ku mirov dikare di warê kurdolojiyê de destnîşan bike ev in: zimanasî, filolojî, etnografya, coğrafya, etnolojî, sosyolojî, antropolojî, ekonomî, tarîx, polîtîka, psîkolojî.

2. Destpêka kurdolojiyê li Fransayê

Piştî zelalkirina naverok, armanc û mijarên lêkolînên kurdolojiyê, em ê niha bibînin van xebatan li Fransayê kîngê û çawan dest pê kirin û niha di kîjan qonaxê de ne. Li Fransayê, pêngava lêkolînên kurdolojiyê piştî Şerê Duyemîn ê Dinyayê hat avêtin. Di pêşveçûna lêkolînên kurdî de, em dikarin sê cihên taybet destnîşan bikin: INALCO, Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û zanîngehên fransî.

2.1. Lêkolînên kurdî li INALCO yê

Di sala 1945'an de, li INALCO yê (Navenda Nawneteweyî ya Ziman û Medeniyetên Rojhilatê), ku bi Zanîngeha Sorbonne ya Parîsê ve girêdayî ye, yekemîn dersê zimanê kurdî vedibe. Mamosteyê vê dersê Roger Lescot e, ku berê jî li Sûriyeyê di bin mandaya fransî de, bi birayên Bedirxaniyan re li ser ziman û edebiyata kurdî xebitiye. Piştî ku di sala 1947'an de Roger Lescot diçe sefirxaneyê Fransayê ya paytexta Kahîre ya Misirê kar bike, Kamûran Bedirxan ku wê demê li Beyrûtê dijî, cihê wî digire. Roger Lescot û Kamûran Bedirxan ku berê di kovara *Hawarê* de jî bi hev re xebitîbûn, li Parîsê bi zimanê fransî, yekemîn *Rêzimana kurdî* (*Zaravayê kurmançî*) çap dikin¹. Kamûran Bedirxan dê heta sala 1970'yê li INALCO'yê bixebite. Di bin rêvebiriyê wî de, gelek xwendekarên kurd û biyanî li ser ziman û edebiyata kurdî lêkolîn dikin û Parîs dibe paytexta Ewropayê ya lêkolînên kurdî. Piştî K. Bedirxan teqawit dibe, Joyce Blau ku yek ji wan xwendekarên wî ye, di sala 1973'yan de cihê wî digire û heta sala 2000'î li wê dersê dide. Joyce Blau teza xwe ya dokto-rayê di bin rêvebiriyê K. Bedirxan de, di sala 1972'yan de bi sernavê *Le kurde d'Amadiya et*

de *Djabal Sinjdar* (Kurdiya Amadiyê û Cabal Sîncarê) diparêze. Di kariyera xwe ya lêkolîner de, J. Blau gelek berhemên din diweşîne ku di lêkolînên kurdî de û di perwerdeya ziman de îro jî wek referans tên bikaranîn². Ev dersên ziman ku tenê bi zaravayê kurmançî dihatin dayîn, ji sala 1973'yan û vir ve bi zaravayê soranî jî tên dayîn. Niha, Îbrahîm Aydogan û Halkawt Hakim dersên kurdî bi her du zaravayan di asta lîsansê de didin.

2.2. Lêkolînên kurdî li Enstîtuya Kurdî ya Parîsê

Ger gelek xwendekarên kurd li INALCO'yê û li zanîngehên din karî xwendinên xwe fînanse bikin, ev yek bi alîkariya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ye ku di sala 1984'an de li paytexta Fransayê ava dibe. Ji avabûna xwe û vir ve û piranî jî piştî ku di sala 1993'yan de ew statûya Weqfê distîne, Enstîtu ji 300'î zêdetir burs da - û niha jî dide - xwendekarên kurd ên her çar perçeyan. Ev burs îmkân dide xwendekaran ku heta doktorayê di mercên aboriyên baş de, bikaribin lêkolînên xwe bimêşînin. Gelek ji wan xwendekarên bursiyer ku xwendina xwe bi serkeftî temam kirine, îro li her çar perçeyên Kurdistanê û her wiha li Tirkîyeyê jî mamoste ne. Ji dehan zêdetir xwendekarên bursiyer jî li zanîngehên fransî de îro wek profesor û doçend kar dikin.

Bêguman, xebatên Enstîtuyê tenê bi dayîna bursan nayê sînorkirin. Ew bi xwe wek navenda lêkolînên kurdî ye. Ji bilî alîkariya penaber û karkerên kurd ku li Fransayê û Ewropayê dijîn û ji bilî xebatên agahdariyan li ser rewşa kurdên her çar perçeyan, Enstîtu li ser ziman û edebiyata kurdî gelek weşan û lêkolîn çap kirine. *Studia Kurdica* (Lêkolînên kurdî) yekemîn kovar e ku di sala 1984'an de derdikeve. Ev kovar bi beşdarbûna gelek lêkolînerên kurd (I. Şerîf Vanly, Malmisanij, Siyamend Othman, H. Bozarlan, hwd.) û biyanî (G. Challiand, M. Van Bruinessen, J. Blau, hwd.) bi zimanê kurdî, erebî farisî û fransî çap dibû. Kovara *Hêvî* ya çandî ya gîştî di sala 1988'an de dest bi weşanê dike. Kovar piranî lêkolînên li ser ziman û edebiyatê dide nasîn û bi zaravayê kurmançî û soranî heşt

hejmar derket. *Studia Kurdica* û *Hêvî* êdî der-nakevin û di cihê wan de kovareke nuh, bi navê *Etudes kurdes* (Lêkolînên kurdî) xwerû bi zimanê fransî derdikeve û ji aliyê weşanxaneyê fransî *L'Harmattan* ve tê çapkirin û belavkirin. Ev kovar giraniyê dide ser lêkolînên akademîk û hemû weşan bi beşên zanistiyên mirov û civakî ve girêdayî ne (civat, çand, tarîx, ziman, edebiyat, hwd.). Ji bilî lêkolînên nuh (9 hejmar), kovar her wiha çavkaniyên nivîskî yên kevn careke din diweşîne. Heta niha sê hejmarên taybet bi vî awayî hatine çapkirin. Wek mînak, pirtûka Giuseppe Campanile, ku bi serenavê *Storia della Regione del Kurdistan* (Dîroka Herêma Kurdistanê) cara pêşîn di sala 1818'an de li Îtalyayê derketibû, di sala 2004'an de wek hejmareke taybet hat çapkirin³.

Di warê weşanan de, divê mirov ji bîr neke ku Enstîtu ferhangan jî diweşîne. Ferhenga Salah Sadalah bi serenavê *Ferhenga Îngilîzî-Kurdî ya Selahedînê* di 2001'an de bi 72 000 peyvên ji aliyê Enstîtuyê ve li Stenbolê hat çapkirin. Niha xebat heye ku berfirehtirîn ferhenga kurdî - fransî, ku berhema lêkolînên bîst salan zêdetir e, tewaw bibe û di dawîya vê salê yan jî di sala were de derkeve.

Xebatên ku bi navê *Komîsyona Kurmançî* tê nasîn yek ji van xebatên herî balkêş ên kurdo-lojiyê ye ku ji aliyê Enstîtuyê ve 22 sal in tê birêvebirin. Wek tê zanîn, ev komîsyon li ser pîrsgirekên termînolojî û yên standardîzekirina zaravayê kurmançî dixebite û salê du car dicive. Berhemên her civînê di rojnameya taybet a *Kurmançî* de tên belavkirin. Komîsyon hemû peyvên ku di çavkaniyên nivîskî û devkî de hene berhev dike an jî yên ku ew bi xwe diafirîne, bi zimanê fransî, îngilîzî û tirkî dide nasîn. 20 hejmarên pêşîn (1987-1996) di cîldekê de di sala 1999'an de derket. Ev xebat, ku ji aliyê gelek nivîskar, rojnamevan, lêkolîneran û avahiyên neteweyî ve tê bikaranîn, bandoreke erênî li ser pêvajoya standardîzekirina kurmançî dike⁴.

Pirtûkxaneya Enstîtuyê jî roleke gelek mezin di pêşveçûna lêkolînên kurdî de dilîze. Ev pirtûkxane mezintirîn navenda çavkani-

yên li ser kurd û Kurdistanê ye (8000 zêdetir pirtûk, kovar, rojname, teza doktorayê, nivîs, hwd.). Gelekî lêkolîner ji welatên biyanî tîn çavkaniyên pirtûkxaneyê ji bo lêkolînên xwe bi kar bînin. Niha, girûbek xebatê nêzî hezar pirtûkan dijitalîze dike û di demeke nêzik de ew dê bikaribin li ser malpera Enstîtuyê di formata PDFê de bînin daxistin.

2.3. Lêkolînên kurdî di zanîngehên fransî de

Ji bilî INALCO'yê, ku piranî li ser mijarên ziman û edebiyata kurdî pîspori heye, gelek zanîngehên fransî cih didin lêkolînên kurdî. Wek tê zanîn, gelek xwendekarên kurd ku li welatên xwe nikarin bi serbestî bixwînin, an jî li ser gel û welatê xwe lêkolînan bikin, neçar dibin herin derveyî welatê xwe. Fransa ji sedema vê tradîsyona kevn, her tim ev lêkolîner pêşwazî kirine û niha jî bi sedan xwendekarên kurd di zanîngehên fransî de dixwînin. Li gor lêkolînên me, ji 30'yî zêdetir tezên doktorayê li ser civat, tarîx, ziman, edebiyat, çanda kurdî di zanîngehên fransî de hatine parastin.

Em dikarin van tezan di çend beşan de parve bikin: zimanasî (Afzal Vossough, 1977, Ahmed Hasan, 1981, Îsmail Fattah, 1989, Sergio Bassols, 1995, Salih Akin, 1995, Îbrahîm Aydoğan, 2006, Sandrine Traidia, 2007) ; edebiyat (Abdullah Mohammed Ahmed, 1987, Ferhad Pîrbal, 1994, Omer Mohsen, 1996, Nazand Begikhani, 1997, Lucine Japharova-Brutti, 2001, Christine Clavier, 2003, Clémence Scalbert-Yucel, 2005) ; tarîx (Behrouz Motamed Haşemî, 1989, Sayan Celal, 2000, Olivier Aymar, 1995, Narmen Ali Muhamed Amen, 2001, Akihiko Yamaguchi, 2005, Najat Abdulla-Ali, 2006), sosyolojî (Parviz Amini, 1972, Siyamend Othman, 1985, Şirin Azadpour, 1988, Sabri Cigerli, 1999, Şirin Mohseni-Sadjadi, 1999) ; zanistiyên siyasî (Mohamed Ali Babakhan, 1991, Seywan Barzanî, 2006), hiqûq (Abdul Monem Al Kadhi, 1978, Muhamed Rafe Fattah, 1984), ol (Hakim Halkawt, 1983, Birgûl Açıkyildiz, 2008)⁵.

Mirov dikare baş bibîne ku Fransa di warê lêkolînên kurdî de roleke gelek mezin listiye. Hem ji aliyê perwerde û lêkolînên li ser zi-

manê kurdî û hem jî di warê hemû zanistiyên mirovî û civakî de, Fransa bûye navend û referansa lêkolînên kurdî. Gelo ev rewş heta kîngê dê bidome? Çawa me di destpêkê de jî got, di hemû zanîngehên başûrê Kurdistanê de beşên lêkolînên kurdî hatine dameziran-din. Êdî merc hene ku ev beş li zanîngehên Tirkîyeyê jî vebin. Hêvî heye ku lêkolînên kurdî ku bi deh salan ji neçariyê li derveyî welat hatin birêvebirin vegerin nav civata kurdî û bibin xwedî dezgehên neteweyî.

Bibliyografya

- BAYRAK M. 1994, Açık-Gizli / Resmi-Gayrresmi Kürdoloji Belgeleri, Özge yayınları, Ankara, 602 r.
- BENNINGSSEN A. 1960, "Les Kurdes et la kurdologie en Union soviétique", *Cahiers du Monde russe et soviétique*, n°3, Paris, r.513-530
- BLAU J. 1991, *Kürtçe / Türkçe, Kürtçe / Fransızca, Kürtçe / İngilizce Sözlük*, Sosyal Yayınlar, İstanbul, 341 r.
- BLAU, J (2007) 'Une perspective historique sur les études kurdes. Entretien avec Joyce Blau', *European Journal of Turkish Studies, Thematic Issue N°5, Power, ideology, knowledge - deconstructing Kurdish Studies*, URL : <http://www.ejts.org/document797.html>
- CHYET M. 2003, *Kurdish-English Dictionary – Ferhanga Kurmancî-Înglîzî*, Yale University Press
- 846 r.
- FARQÎNÎ Z., 2000, *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, Enstîtuya Kurdî ya Stembolê
- MOKRI M. 1963, "Kurdologie et enseignement de la langue kurde en URSS", *L'Ethnographie, Revue de la Société d'Ethnographie de Paris*, r.71-105
- SAADALLAH S. 2001, *Saladin's English-Kurdish Dictionary – Ferhenga Înglîzî-Kurdî ya Selahedîn*, Institut Kurde de Paris – Avesta, 1477 r.
- ⁶ Çapa dawîn a vê rêzimanê di sala 1991'an de ji aliyê weşanxaneyê Maisonneuve ve hat çapkirin. (371 r.). Lê ew xebat di salên 1960'î de hatiye nivîsandin. Wergera wê ya bi kurdî û tirkî li Fransayê û Tirkîyeyê çend caran hatiye çapkirin.
- ¹ Méthode de kurde soranî (Metoda kurdî – zaravayê soranî, 2000), Méthode de kurde kurmanjî (bi Veysi Barak re, Metoda kurdî – zaravayê kurmanjî 1999), Kürtçe/Türkçe, Kürtçe / Fransızca, Kürtçe / İngilizce Sözlük (Sosyal Yayınlar, 1991), *Mémoire du Kurdistan (Mejûyê Kurdistanê, 1984)*,
- ² Ji bo zêdetir agahîyan, binîhêrin http://www.institutkurde.org/publications/etude_kurdes/
- ³ Ji bo zêdetir agahîyan, binîhêrin <http://www.institutkurde.org/publications/kurmanci/>.
- Hemû hejmar di formata PDFê de, dikarin bînin daxistin.
- ⁴ Ji bo berfirehtirîn agahdariyan li ser tezan, binêre : <http://www.anr-theses.com/fr/> û <http://www.sudoc.abes.fr>

Sedsala ku em tê de dijîn sedsala bîst û yekan e. Di vê sedsalê de gelek nûjenî çêbûn. Bi arava van nûjenîyan referansên mirovan guherîn û mirov ji serdemekê derbasî serdemeke din bûn. Di her serdemekê de referans û mebestên mirovan li gorî konjonktora heyî diguherin. Serqise di serdemên ewilî de referansên mirovan bidestxistina ax û erdnîgariyên fireh bûn. Li dû vê serdemê, serdemeke nû hat û referansên mirovan bûn bidestxistina çek û

Kurdolojî: Zanista hesta netewî

Mihemed RONAÎ

Li gorî min dîrok nayê jiyîn tê çêkirin. Çend giregir li hev rûdinên û dîrokê çêdikin ji nifşên li dû xwe re.

bombeyên mezintir. Niha jî referansên hemû neteweyan bidestxistina zanîn û zanistê ne. Zanîn û zanist di destê kê de be hêz jî di destê wî/ê de ye. Ji ber vê yekê hemû neteweyên cîhanê yên pêşketî, di pêşbaziyeke zanistî de ne. Zanîngehan ava dikin û di van zanîngehan de zanyaran digihînin. Bi arava raman û xebatên zanyarên xwe pêşve diçin. Lê hezar mixabin neteweya kurd ji ber ku bi tevahî negihaye statuya dewletê di warê van xebat û lêkolînan de şûndemayî ye.

Belê lêkolînên zanistî, huner û wêje bi destê dewletan nayên afirandin. Mirov van xebatan li dar dixin, lê gava li pişt van mirovan hêzeke mezin an dewletek tune be, mirov dikarin heta derekê xebatên wisa bikin. Ji ber vê yekê jî, îro kurd di warê zanistên civakî û lêkolînan de bi awayekî netewî di cîhanê de bê nav û deng in. Ez bawer im ku wêjekarên kurdan ji wêjekarên cîhanê yên din ne hindiktir in, dîsa muzîkjenên kurdan ji muzîkjenên cîhanê ne hindiktir in. Lê ji ber ku parastvan û piştgirekî wan î hêzdar tune ye îro di cîhanê de navê wan nayê bikaranîn. Ev rewş ne tenê di wêje û hunera me de, di her warê jiyana me de wisa ye. Lê ev nayê wê wateyê ku em ê nikaribin bê dewlet biş pêş bikevin û navê xwe li dinyayê bilind bikin. Ji bo vê yekê pêdiviya me bi çend xalan heye. Xala yekemîn li dîroka xwe varqilîn e. Ya duyemîn jî li zimanê xwe varqilîn e. Lewra netewetî bi van her du xalan bilind dibe. Yekî/e ku bi dîroka xwe zanibe zû bi zû nakeve dek û dehfên desthilatdaran. Di pergal û sîstema wan de cî nagire. Ziman jî wî ji neteweyên din vediqetîne û kirasê xwe li


bejna wî dike, wî bi rengê xwe dixemilîne. Lewma xebatên kurdolojiyê ji dîrokê heta îro, bi taybetî li ser van her du xalan hatine lidarxistin.

Ne kurdolojî tenê hemû neteweyan, zanista netewî li ser van mijaran hûr kirine û xebatên xwe herî zêde li ser van mijaran li dar xistine. Wek mînak tirkî dema komara xwe ava kirin, zimanekî wan î hevpar tune bû. Tîrkiye wê demê bi zimanê osmaniyan diaxivî. Ev ziman wek germiya gavanan bû, di nav de ji hemû zimanan peyv hebûn. Lê Atatürk bi şoreşên zordestî ziman da nûjenkirin û zelal kir. Di 1932'yan de Saziya Zimanê Tirk ava kir û bi xebatên wê saziyê ziman ji peyvên biyanî xelas kir û zelal kir. Niha mirov dikare bibêje zimanê tirkî di her warê jiyana de têra xwe ye. Di heman demê de ji bo dîrokê jî xebat wisa li dar xistibû. Di 1931'an de Saziya Dîroka Tirk ava kiribû. Ev sazî jî dîsa ji bo lêkolîna dîroka xwe ava kirin û bi arava wê saziyê ji xwe re dîrokeke berovajî çêkirin. Li gorî min dîrok nayê jiyîn tê çêkirin. Çend giregir li hev rûdinên û dîrokê çêdikin ji nifşên li dû xwe re. Lewra mirov gava bi awayekî objektîf li dîroka tirkî binihêre mirov dê bibîne ku kitêbên wan ên dîrokî ji sedî heştê derew in. Lê her çiqas derew be jî wan ji wê derewê bawer kiriye. Di çavên wan de xwediyê dîrokê ew in û hemû gel û neteweyên cîhanê jî xulamokên wan bûne. Sedema wê quretiya wan li dîroka xwe xwedîderketina wan e. Dîrokek çêkirin û niha jî bi hemû baweriya xwe wê dîrokê diparêzin û hêza xwe ya netewî ji wê yekê digirin. Wek ku pûtperestên kevnar çawa pûtên xwe ji

helawê çêdikirin û di birçîbûnê de hêdî hêdî ew dixwarin, tirkên jî dîroka xwe kirine pût û hêdî hêdî jê kedî dibin.

Em dîsa vegerin rewşa kurdan. Gelo kurd di vî warî de li ku derê ne? Gelo hê çiqas rê li ber wan heye? Gelo dê çawa karibin zanista xwe ya netewî bi pêş bixin û bi arava vê zanistê hişmendiyeke netewî damezirînin di nava gel de? Birastî digel ku kurd nebûne xwedî dewlet û li cîhanê di qada navnetewî de nehatine naskirin jî, zanista kurdan a netewî ji zanista gelek neteweyan pêşketîtir e. Gelek netewe digel ku xwedî dewlet û xwedî hêz in jî wek kurdan di warê ziman û dîrokê de ne pêşketî ne. Mirov dikare bi dehan dewletan bijimêre ku digel ku xwedî serfirazî û aleke cuda ne jî zimanekî wan î navxweyî û dîrokeke wan a bi esil û fesil tune ye. Heta ne tenê dewletên biçûk di cîhanê de dewleta herî mezin Amerîka jî wek Kurdistanê ne xwedî dîrokeke kevnar e. Îro yekî ku bixwaze dîroka amerîkiyan fêr bibe jê re demeke kurt bes e. Lê dîroka kurd û Kurdistanê digel ew qas lêkolînan hê jî bi temamî nehatiye zelalkirin. Di warê dîrok û çanda kurdan de gelek kurdologên navdar xebat li dar xistine lê hê jî dîroka kurdan bi tevahî nehatiye naskirin. Em dikarin bi dehan navên giranbuha yên ku ji welatên cuda xebat li ser dîrok û zimanê kurdan kirine lê dîsa jî ziman û dîroka kurdan wek behreke bêbînî li benda naskirinê ye. Ji van nava hinek ev in:

Zanyarên ûris, A. Jaba, V. Mînorsky, Peter Lerch, F. Cheref, Velyamînov-Zernov, Z.A. Zhukovkîj, A.Orbellî, N.J. Marr, Vilçevsky, Bazîl Nikîtîn, Bartholemy D'herbelot, P.I. Lerx, A. Chodsko, S.A. Egîazarov, M.B. Rudenko, V.A. Gordolevskî. Zanyarên brîtanî, E.B. Soane, C.J. Edmonds, D.N. Mackenzîe, ji zanyarên Fransî Ernst Chantre, Roger Lescot, ji Amerîkayê S.A. Rhea, ji elmanan Albert Socîn, Peter Sîmon Palas, Eugen Prym, E. Rödiger, A.F. Pott, Theodor Nöldek, F.justi, O. Mann, Karl Hedank, Morîtz Wagner, ji îtalyanan Maurîzio Garzonî, A. Bianchî, M. Galettî, ji awusturiyan Hugo Makas, F. Muller û hê bi dehan navên biyanî em dikarin



Qanadê KURDO

bijimêrin ku di warê kurdolojiyê de xebat li dar xistine. Van kurdologan hemûyan bi heman armancê xebatên xwe nemeşandine ji van zanyaran hinekan bi hişmendî xebatên xwe li dijî berjewendiya kurdan diyar kirine wek Mackenzîe û hê çend navên din. Ji ber vê yekê bi ya min pirsgrîrêka kurdolojiyê ya herî mezin ew e ku, lêkolînerê wê bi piranî biyanî bûne û ji ber ku biyanî bûne jî yan kurd fehm nekirine yan jî bi zanebûn dîrok û zimanê wan şaş dane nîşandan. Bi rastî ji van kurdologan hûn berê xwe bidin kîjanî hûn ê rastî gelek şaşî û çewtiyan bînin. Ji ber ku zanyarên ku li ser kurdolojiyê xebat kirine bi tevahî ne bi armanca lêkolînê xebatên xwe meşandine, di bin xebatên gelek de fen û deken sîyasî jî hebûne. Jixwe gava hûn li kurdologên biyanî dinîhêrin bi taybetî sê beş in: Beşa yekem beşa akademisyenan e. Ew beş ji aliyê dewleta xwe ve hatiye piştgirîkirin û wan jî ji bo dewleta xwe der barê gel û neteweyên din de zanîn û agahî berhev kirine û ev zanîn xistine xizmeta

dewleta xwe. Beşa duyem beşa leşkeran e ku bi rastî gelek kurdolog ji leşker bûn weka Soane û Edmonds û hê gelek kurdologan. Ev jî bi armanca leşkerî hatine û di heman demê de li ser kurdan lêkolîn meşandine. Beşa sêyem jî beşa misyoneran e, ku ev beş jî ji bo belavkirina ola xwe xebat li dar xistine. Ango her çiqas di nava xebatên van kurdologan de xebatên hêja û giranbuha hebin jî mirov nikare bi temamî baweriyê bi lêkolînên wan bîne.

Me di warê kurdolojiyê de navê kurdologên biyanî anî ziman û ji aliyekî ve behsa keda wan a bikêrhatî, ji aliyê din jî behsa lêkolînên wan ên bi xetere kir. Lê kurdologên ku li ser vê qadê xebitîne ne tenê biyanî bûn di heman demê de ji nava kurdan jî gelek kurdologên giranbuha derketin û ji wan gelekane wek rojê pêşiya neteweya xwe ronî kir, niha em ji wan navê hinekan jî bidin: Tewfîq Wehbî, Nûrî Elî Emînî, Dr. A. Hacı Marûf, Cemal Nebez, Her sê Bedirxanî (Kamûran, Celadet, Salih), Xelîl Xeyalî, Zera Yûsiv, Qanadê Kurdo, Reşîdê Kurd, Î.M. Resûl, Osman Sebrî, Kemal Badilli, F.H. Sagniç, Maksîmê Xamo, Kerîm Eyûbî, Îsak Sukerman, Sadiq Safîzade, Çerkes Bakaev, Erebe Şemo, Mehmet Bayrak, Şamilê Selîm Esgerov, Qadirî Fetahî Qazî, Hemîd Ferec, Tahir Sadiq, Şêx Merdûxî Kurdistanî, M.E. Hewremanî û hê gelek navên din jî di warê kurdolojiyê de reş belekandine û ked rijandine.

Îro zanînen me yê der barê ziman û dîroka kurdan de bi piranî ji van kurdên dilsoz gihane me bi keda ji hezar kurdî tenê kurdekî keda van kesan bida niha îro kurd di rewşeke din de bûn. Wan jî bo gel û neteweya xwe keda herî pîroz dan. Divê em îro li keda wan xwedî derkevin û karê ku wan daye destpêkirin bidomînin. Em dikarin bi hêsanî bibêjin digel ku kurd ew qas salên dirêj bê dewlet û fermiyet jiyan, xwedî li ziman û dîroka xwe derketin. Sedema vê yekê çanda kurdan a kevnar e. Heke kurd ne xwediyê çandeke wisa kevnar û dewlemend bûna heta niha zû de têk çûbûn û asîmîle bûbûn. Lê hê jî li ser piyan in û ji gelek neteweyên xwedî

dewlet bêtir çand û hunerê diafirînin. Vê afirîneriya xwe ji rehên xwe yê dîrokî digire ev netewe. Ji zimanê xwe yê serketî digire. Ji bo baş têgihîştina vê dîrokê û vî zimanî pêdivî bi xebatên zêdetir heye. Divê xebat bêtir werin lidarxistin. Wek ku me li jor jî anî ziman mixabin ê me wek tirkane dewletek tune ye ku em saziyên zimên û dîrokê ava bikin û di van saziyan de di her warî de piştgiriye bidin zanyarên xwe û xebatên wan mezintir bikin. Lê divê em xwe nesipêrin vê yekê jî. Her çiqas dewleteke me tune be jî rewşenbîrên me dikarin xwe bidin hev û gelek xebatan li dar bixin. Wek mînak em dikarin kovareke bi navê KURDOLOJÎ derxin û di wê kovarê de her meh hinek mijarên dîrokî û yê rêzimanî bigirin dest û rewşenbîrên xwe li ser van mijaran bidin xebitandin. A duyemîn em dikarin kitêbxaneyeye mezin a netewî ava bikin û ji dîrokê heta niha çî kitêb li ku derê di warê kurdan de hatibe nivîsandin an kopî bikin an jî mîkrofilmên wan ji kitêbxaneyên cîhanê yê din bigirin û di vê kitêbxaneyaya xwe ya netewî de bicivînin. Wek mînak gava ciwanekî kurd an lêkolînerekî kurd bixwaze di warê mijareke kurdewar de bixebite dema ket kitêbxaneyê divê hemû agahiyên ku pêdiviya wî pê heye li wê kitêbxaneyê bibîne. Ev ne karekî dijwar e. Kes nikaribin vê yekê bikin jî dê şarederî karibe tiştêkî wisa bike. Jixwe niha kitêbxaneyek ava kirine, daxwaziya min tenê ji wan ew e ku vê kitêbxaneyê bi vî rengî jî binirxînin. Ev yek dê ji bo zanîna kurdewar ango kurdolojiyê bibe behreke bêbinî.

“Rahîb û zordest, hestên keserkûr diçînin bi hev re; ‘tîrs’ û ‘nefret’, lê di heman demê de ‘hêvî’, ‘pêbawerî’ û ‘xwezîpêanîn’...”

Felsefeya **Spînoza** ya pirhêl ku pirhêliya wî di heman cihoka wêjeyê re digihîje hevdu, ji **Şener Ozmen** re jî bûye fersenda nivîsandina romaneke balkêş. **Benedictus de Spînoza** ango **Bento d’Espînoza** digel **René Descartes** û **Gottfried Leibnîz** di felsefeya sedsala 17’emîn de yek ji **rasyonalîstên** herî li

Di romana kurdî de pêngaveke pirhêl: Rojnivîska Spînoza

Yaqob TILERMENÎ

Romana **Rojnivîska Spînoza** ku bi **Vegera Yasîn** a bajarê Zexê dest pê dike û Yasînê dijpergal bi me dide naskirin, bi rojnivîska Yasîn bi mirov dide sehkirin ku niha leheng li serê çiyayê Kurdistanê ye

pêş tîn qebûlkin. Spînoza jî weke gelek feylesofên ku di dema xwe de nehatine famkirin, ew jî hem nehatiye famkirin û hem jî çewt hatiye famkirin; hem weke dijminekî oldariyê hatiye tawanbarkirin hem jî çavkaniya berhema wî bi hezkirina Xwedê ve hatiye girêdan. Digel van nakokiyên berbiçav, Spînoza weke zanayekî jiyaye û ev zanebûn di berhema xwe ya bi navê **Ethîca** (Etîk=Sinczanî) de bi cih kiriye.

Malbata Spînoza xwestiye ew weke hahamekî cihû bigihê û ji bo perwerdeya di vê gihandinê de hemû derfetên xwe serf kirine. Spînoza jî ber van sedeman di temenê xwe yê biçûk de li dibistanên cihûyan û li kenîştayan (sînagogan) hînî zimanê îbranî bûye, xebatên teologên cihû û ereb xwendine. Ev perwerdehiya wî, rê li ber lêpîrsîna ramanî ya laîk vekirîye û taliyê bûye sedema cezakirina dezgehên oldariyê.

Çawa ku feylesof Spînoza serê xwe bi felsefeya Descartes re êşandiye, nivîskar **Şener Ozmen** jî serê xwe bi lehengê romanê Spînoza re êşandiye û pêwendiya leheng a bi evînê ya ku şikê ji her tiştî dike û vêya bi ramanên Descartesî ve rave dike re datîne: “**Şikê ji her tiştî dibim heke mesele evîn be, ...**” (rûpel 120). “**Li ser hesûdiyê ramiya, gotinên Descartes hatin bîrê, ‘Hesûdî’ digot feylesofê mezin, ‘cureyê tirsekê ye ku ji daxwazên parastina tiştên ku tu xwediyê wan î, pêk tê.**” (rûpel 116). Û ev referansa nivîskêr ku pêwendiya di navbera deqan de bi xwîner dide hisandin, dixwaze haya xwîner jî berhema Spînoza **Rêbazên Felsefeya**

Descartes çêbike.


Descartes bi pirtûka xwe ya bi navê **Der Barê Rêbazê De (Discours de la Methode)**, rêya lêgerîna rasteqîniyê li ber mirovan dixê. Wî bi gumankirina li hemberî giştîkirinên kevneşop ên **Skolastîsîzmê** dest pê kir. Û jî dêlva giştîkirinê, ramandin derxist pêş; weke formulekirina **Cogito Ergo Sum (Diramim ji ber ku heme)**. Li gora vê formulekirinê; dibe ku her tişt xapînok be, bihîstyarî, cerebe, zanînen felsefî, bawerî, heta bi Xwedê jî. Tiştê herî aşkera, tiştê ku dê jê neyê gumankirin, zanîna vê gumanê ye. Fikirîna li vê gumanê ye. Ev fikirîn sedema ‘min’ê ye, sedema hebûna egoya ‘min’ê ye.

Romana **Rojnivîska Spînoza** ku bi **Vegera Yasîn** a bajarê Zexê dest pê dike û Yasînê dijpergal bi me dide naskirin, bi rojnivîska –ango vegotina ji Simko re- Yasîn bi mirov dide sehkirin ku niha leheng li serê çiyayê Başûrê [Kurdistanê: Y. T.] ye û weke pêşmergeyekî ligel lehengên din ên romanê Simko û Peymanê ye. Spînozayê ku bi eslê xwe Yasîn e, di bin bombebarana firokeyan de li hêviyê ye ku zûzûka bi Peymanê re bizewice. Di ‘Vegera Yasîn’ de mirov nas dike ku leheng li Zanîngeha Deştê Kûr [Çûkûrova: Y. T.] xwendekarê beşa wêneyê ye û jî ber evîneke têkçûyî dev ji zanîngehê berdaye û li Zexê vegehiyaye; veger tenê ne jî ber têkçûna evînê, bi armancên lixwegehiyê û çûyîna ber bi diyarekî dîtir ve ye. Di serî de Yasîn jî gotina li dijî bavê xwe –**Serwet Begê** ku her meh bi rêya Bankeya Zîraatê pere jê re dişand-

danaxwe û bi guhnedêrî bi ser wî de radibe. Helwesta xwe bi **"kaxizek li jorê deriyê odeya mêvanan ve zeliqandibû û bi tîpên reş î stûr, rewşa xwe ya neasayî, deq bi deq anîbû zimên"** (rûpel 16). Kaxiza 10 xal weke manîfestoyekê arasteyî pergala bavî dike. Ew ji civaka Zexiyan jî hez nake û dijraberiya xwe li ruyê **Fîrazê Sertirûmbêl** diqîre, **"Te got Nûriyê Çaycî? De here û jê bipirse bê heya îro wî çend makerên bêguneh lewitandine? Hema ku te got Nûrî, divê ez di cî de dev ji karên xwe berdim û bi lezûbez berê xwe bidim çayxaneyê wî ya bêhnpeketî."** (rûpel 13). Û ew guhnedêriya xwe didomîne, **"Nûrî kî ye lawo?"**. Yasîn rewşa demê ya Zexê jî di rexneyê re derbas dike, **"Zexiyên ku gelekên wan jî bo şoreşê berê xwe dabûn çiyê û piştî kurtedemekê paşpaşkî vegeriya bûn malên xwe û di Çağdaş Yaşamı Destekleme Derneği de cî bûbûn"** (rûpel 12) û bi vêya jî nayê ser, rika xwe ya li dijî leşkerên kirintarî weke gef bi ser pisîka xwe, **Tûtî** de dibarîne, **"Bi Xwedê ez ê te bikujim! Çi karê te li sergoya leşkeran heye qehpik!? Ma tu nabînî bê çi bi mirovan dîkin?"** (rûpel 14). Mirov jî vê tê digihîje ku pisîk be jî, ku çavên wê li deriyê leşkeran be, dê rojekê bi mirîti bi ser xwediyê de were şandin.

Û Yasîn hey direngîne, hey dinivîse, hey dixwîne; bê wext xwarinê dixwe, heta derengê şevê hişyar dimîne, xewa berdestê nîvro dike; vedireşe, vedireşe, vedireşe... Bi rengên xwe yên sereke reş û sor portreyên **Arthur Rimbaud** û **Sylvia Plath** çêdike, cobirekî mirî nîgar dike; li ser pêşniyara **Ozdemir Ince** helbestên dijber dinivîse; pirtûkên **Marks** û **Lenîn** û **Sozcuqlara Sartre** dixwîne. Û tew di nameya ku ji keçeke xama re dişîne de çêlî **Brecht** û **Sartre** dike. Ji bo wî pirtûkên hunerî û felsefî xwedî wateyên cihêreng in: Mirin û huner, kuştin û felsefe. Mirov jî van taybetî û livbaziyan lehengê sereke tê digihîje ku, ew ji bo hebûneke xweser ew qasî çalakger e, weke feylesof **Heidegger** destnîşan kiriye, Yasîn jî **Şivanê Hebûnê** ye.

Jê û pê ve roman di sê beşên sereke de hatine dabeşkirin. Di serê her beşekê de



gotinên nivîskarên nemir ên kurd bi naveroka beşan re pêwendîdar kiriye. Di **Beşa Yekem** de gotina **Qedrî Can**, **"Gava meriv ji halê xwe ne razî be û ji pêşiya xwe bi guman be, dizîvire li rojên xwe yên derbasbûyî dinêre."** Û ji rojên rabirdûyê yên lehengan em wan nas dîkin; di **Beşa Duwem** de gotina **Celadet Alî Bedirxan**, **"Xwendevanino! Guh bidine min, hûn ê bibînin ku di van gotinan de tu mibalexe, zêdekirin nîn e û ev xwerû rastî, rastiyeke rût û tazî û dijwar e."** Û mirov dibîne ku li her parçeyekî Kurdistanê bûyer, qewam û serpehatiyên bi vî awayî her kêlikan tene jiyîn; di **Beşa Sêyem** de gotina **Cegerxwîn**, **"Gotinên wê serê min dagirtin û min êrîş bire koma wan û agir bi ser wan de hilor kir. Bi mêranî em ji nav dijminan derketin, dijmin ma rûreş û em mane dilgeş. Çîroka min jî ji we re xweş!"** Û leheng bi ser dijminên xwe de diherin, bi çeka felsefeyê dikujin û ji bo azad bibin berê xwe didin çiyayên Başûr.

Beşa Yekem ku li çar beşikan hatiye dabeşkirin, her yek bi navê bajarekî parçeyekî Kardoxê [Kurdistanê: Y. T.] û lehengekî hatiye

binavkirin:

Yasîn (Zex)= Hezex= Bakur

Peyman (Xo)= Zaxo= Başûr

Simko (Bad)= Mahabad= Rojhilat

Helbest (Dê)= Amûdê= Başûr Rojava

Ev formulêkirin diyar dike ku tu gotinek ji romanê ne belasebeb hatiye nivîsandin û honak bi hesab û pîvan hatiye sazîkirin; ne ku jiyanên berbelav û çîrokên parçebûyî hatine honandin:

a-) Ji beşika **Zex** em tê digihîjin ku **Yasîn** para xwe ji gefxwarina serleşkerê bajêr wergirtiye û di ezabxaneya polêsan de têra xwe lêdan û êşkence xwariye. Û ramana çûyîne ya ber bi qiblegeha warê azad, Başûr distewe.

b-) Di beşika **Xo** de em **Peymanê** nas dikin. Peymana ku bavê wê Mele Ehmed digel neh kesan hatibû kuştin, digel dê û xwişk birayan koçî bajarê Xoyê kiribûn. Peyman li Zanîngeha Dayê [Bexda: Y. T.] beşa ziman û wêjeya îngilîzî dixwîne. Dema li cem malbatê ye ew û xwişkên xwe pevdîçin û her du bira Mîran û Mîral tadeyîyê lê dikin. Peymana ku li gora şayesandinê bê qisûr e, di bîst û du saliya xwe de ye, li dû xewn û xeyalên cihêreng e. Ligel ku pêwendîya wê bi xortekî ereb -Ehmed- [navê bavê wê jî Ehmed e] re heye jî, ji xewneke xwe şiroveyan distîne û hêvî dike rojekê li xortekî kurd ê bakurî rast were. Peymana ku li bajarê Dadê dihere zanîngehê û bi sê hevalên xwe yê nêzik re di malekê de dimîne, piştî demekê hevala wê Asola, yarê wê Ehmed û lawê cîranê malbavê wê Silêman di heman şebekeya sîxuriyê de dixebitin û failên teqîna mîhrîcanê ne.

c-) Di beşika **Bad** de em li kurdê rojhilatî **Simko** rast tên. Simko li Zanîngeha Azad a Badê roja xweqeydkirinê di dorê de li keçîka azerî, **Bala** rast tê. Ku rojtira din di dora xwaringirtinê de pêrgî hev tên, dil didin hev û li **evîngeha** xwe di nava hevşabûnê de li hev sor dibin. Bavê Simko ji pençeşêrê, dêya wî ji qezaya motorpisqilêtê mirine û birayê wî, Azad alîkariyê pê re dike ji bo xwendinê. Bala ji ber rewşa xwe ya taybet -qehpikî- rojekê be

xatirxwestin nameyeke veqetîne li dû xwe dihêle. Balaya azerî ya yara Simko ligel ku xwendekara zanîngehê ye, li derve karê fihûşê dike. Ne qehpîka ber destê tu qewadan e û vî karî bi serbixweyî dike ligel hevala xwe Naztamamî. Dema ku Bala dixwaze biçe Almanayê, ji ber pêwendiyên cinsî bi nexweşîya **enfeksiyona pelvîk** dikeve.

d-) Di beşika çaran a bi navê **Dê de Helbestê** nivîşkan -kulek- ê li Başûr Rojava derdikeve pêşberî me. Helbestê ku lingekî wî ji yê din kintir e û serîmezî e, xwe dide ser gopal û dimeşe, di civatan de bi pevçûnên navbera xwe û Mamo balê dikişîne. Helbestê binxetî ku mirov dibêje qey yek lehengê ji nava çîrokên **Helîm Yûsiv** pekiyaye nava romanê, **bîrxistinên navbera deqan** ên wêjeya kurdî û **pêwendîya di navbera deqan** de bi bîra mirov tîne ku ev hewldaneke zîrekîyê ye. Helbest dersên ziman, wêje, huner, civakzanîyê dide zarokên Dêyê. Weke giyanewerekî di nava nal û bizmar de mayî, hem ji mixaberatê gefan dixwe ji bo ku propagandaya Başûrî neke, hem jî rastî gefxwarinên çiyageran tê ji bo ku di civakê de çêlî Başûrî neke. Di rojêke ji rojên wiha de li mala şagirtê xwe ya bi navê Newroz ku dilê wî tê de ye, dibe mêvan. Derbasî odeya mêvanan dibe, diponîje, pirtûka **Nietzsche, Zerdûşt Wiha Ferman Da** dixwîne, helbestan dinivîse -fena Yasînî-. Û daxwaza çûyîna ber bi Başûr ve -fena Yasînî- di giyanê wî de pêl dide. Helbestê ku hevalê wî yê herî nêzik Mamo bû, ew bi tenê hiştibû û çûbû bajêr. Mamo şoreşgerekî ji ber cûntaya 12'ê Îlonê daketibû Binxetê. Rêxistina wî dev ji destpêkirina şerê çekdarî berdabû û ew jî li 'Dê' bi cih bûbû û dersên kurdî dida zarokan. Helbestê ku dersan dide Newroza şagirt, di nava evîneke veşartî de digevize û bûhranan dijî. Haya Newrozê ji vê daxwaza wî tune ye û wê jî dil daye xortekî yewnan. Newroz û xortê yewnan ji ber nebûna hevşabûnê pevdîçin û xort heqaretan li tirsên wê û çanda kurdan dike. Dema ku Newroz vedigere malê, tê digihîje ku dê roja dîtir xwazgîniyên wê werin.

"Gava ku min rahişt qedeha çayê û ji nişkê

ve ji destê min filitî û ket erdê, çirrînnk! Û min bêhemdî xwe qîrînek veda, peyva "dejavu" ji devê min derket, a niha xweş têt ber çavên min, em di menzela te de bûn, piştî hevşabûneke ji derewan... Qedeh ji destê min filitîbû û li erdê ketibû, çirrînnk, ez behitîbûm di ciyê xwe de." (rûpel 104).

Di du bûyeran de heman tiştên ku pêk tên (ketine qedehan) ku weke 'dejavu' yekê ye, ji bo tevdeka romanê derbasdar e û ciwanên ku li parçeyên cuda yên Kardoxê di heman demê de dijn.

'Marekî reş î biqiloç' tê xewna Simko yê li 'Bad'ê û heman mar hatibû xewna Peymanê jî. Nivîskar ji bo ku seqaya romanê ya 'dejavu' yê xurt bike, di heman demê de du xewnên fena hev dixê jiyana du lehengên xwe yên li bajarên cuda.

Hem meseleya bûyera dejavu, hem jî dîtina marê reş ê biqiloç, nîşan didin ku lehengên li çar parçeyên Kardoxê bi benekî zexim hatine girêdan û çiqas ji hev qut xuya bin - jiyânên berbelav bin- jî, ew qasî jî pêwendîdar - ne çîrokên parçebûyî ne- in.

Ji berê de berhemên nivîskarên ku pêwendîya wan bi her çesnên hunerê re hene, bala min dikişînin û ji bo ku der barê wan de tiştina binivîsim û bi nixandîne re hin tiştan ji xwe re hîn bibim, dicehdînim. Ji lewre ev şêweberhem pirhêl in û xwîner -me- ber bi diyarên curbecur ên deryaya hunerê ve dikişînin. Hem ji kaniya felsefeyê av kişandine (Nietzsche, Spînoza, Descartes, Marks, Lenîn), hem şêwekarî û muzîk têtîlhev (Hesen Şerîf, Ciwan Haco, Şivan Perwer, Îbrahîm Tatlis, Nejat Yavaşogullari) kirine, hem referansên

xwe yên wêjeyî (Sartre, Brecht, Sîlvîa Plath, Rîmbaud, Harold Robbîns) radestî mirov kirine, hem dîmenên sînematografîk hewandine, hem di cîhana hunera aktuel de xwedî gotin in û hwd. Îcar dê çawa xwînerêk ji ew qas afirandinên bêhempa bêpar bimîne û serê xwe bi berhemên wiha re neêşîne. Di wexta îro de ku her tişt bi bayê bezê dikeve bergeha çavên me û dîsa bi heman bezê ji bîr û hişê me dûr dikeve, tiştê mayînde berhemên hunerî yên asaxurt in; ne pirtûkên ango hilberînên ser sergoyekî. Çinku gelek mirovên ku xwe erbabê karên hunerî nîşan didin, berçavka hespî li ber çavên wan e û ji bilî çesna hunerê ya pê mijûl in, haya wan ji dîsîplînen dîtir tune ye. Xwe weke çîroknûs dihesibînin û hemîn e ji çîrokê pê ve nizanin qala dîsîplîneke dinê bikin. Dema ku pîrs ji wan tê kirin jî, kesên pirhêl weke kesên berbelav dihesibînin; ne weke mêşên hingiv ku ji gulekê xwe li ser gulekê datînin.

Îcar **Şener Ozmen** ji bilî cehdên xwe yên di warê helbest, nivîsên der barê hunera aktuel, wêne, nîgarkirin, dîsîplînen curbecur ên ji cîhana hunerî rabû romanek bi kurdî nivîsand û ji hezar gulan nişa berhev kir û di kewara wêjeyê de nanikeke biçêj diyarî me - xwîneran- kir. A çê mirov bikaribe vî nanikî bi aramî û zanebûn biserifîne.

Qûç û rêç di kurdî de têgehên hebûnî ne. Qûç berhevanîn, danhevî û xweybûn e û rêç jî stratejî, taktîk, azîne ye. Me jî di vê hejmarê de Bi Rênas Jiyan'ê ku bi rêça Kovara Rewşen û dînamîzma 1990'î de qûçên helbest û fikir û pêlan ava kiriye re hevpeyvînek li ser Janya, Mexzena Xwîne, Di Tuwaletê De û Ji Şevê re Çend Têgehên Dera Hanê re amade kir. Di vê hevpeyvînê de gelek fikirên ku mirov dikare li ser wan bifikire û biftire derketin holê. Em zêde dirêj nekin û guh bidêrin Rênas

DERIYEKÎ DIN LI HUNERA PEYVÊ VEBÛ!

WEŞANÊN
AVA

Înönü caddesi magül iş merkezi

Kat: 1 no: 108.

Dağkapı/ DİYARBAKIR

wesanava@hotmail.com.

avayayinlari@hotmail.com.

Rênas Jiyan: Helbest derb e

Hevpeyvîn: Elîxan LORAN

Me berê jî gotibû, divê helbest “dirb”ê tiştekî nedê, divê „derb“ be.

Helbest û hêma ne “dirb” e, “derb” e. Ew tiştên ku tu dibêjî jî ew derb in. Divê derbek lê biketa. Jixwe kesê ku „Janya“ nivîsandibû jî derb xwaribû; bi awayekî sosyolojîk, psîkolojîk derb xwaribû, civaka ku jê hatibû, sîstema ku di nav de bû gişan derb lê xistibû

Jiyan

W- Ez bi pirseke klasîk û bingehîn dest pê bikim. Tu ji bo çi û ji bo kê dinivîsî?

Rênas Jiyan: Têgeheke ku niyeta min heye ku ez hinekî guh bidimê, berê jî min guh dabûyê, li ser wê hinek xebatên min jî çêbûn, “bîr”. Vê dawiyê ez bi xwe hesiyam ku di “bîr”a min de problemek heye. Yanî çawa? Tiştekî wisa, ji ber “bîr”a min di têkilî û di jiyana min de problem derdikevin. Hinek tişt ji bîra min narin. Nizanim bê bîra min çawa mişt dibe? Vê dawiyê ez pê hesiyam, gava ku ez dinivîsim bîra min êdî pasîf dibe. Çawa pasîf dibe? Tişt nayên bîra min. Bîra min ditevize. Min nihêrî, gava ku ez nanivîsim tim tişt tîn bîra min, ez aciz dibim, yanî normal wekî kesayet jî ez kesayetekî aciz im. Gava ku ez dinivîsim ez ji bîr dikim, bîra min disekine, tişt nayên bîra min, wê çaxê jî kêfa min tê, ez rihet dibim êdî. Te dît me li ser “bîr”ê wiha gotibû dema ku di trajediya Sofokles de, Oedîpus gava ku nehata bîra wî ku bavê xwe kuştîye û



dest avêtiye diya xwe, wê tiştek ji wî re xem nekira. Gava ku neyê bîra mirovî problem tune, her tişt li ser asasê bîrê disekine. Yanî girêdayî wê bîrê kûrbûn, kurdbûn, em bibêjin kurdî dîsa di wê bîrê de ye.

Gava ku hinek tişt tîn bîra min, bindestiya me, bêhişiya me, psîkolojiya me, kêmanî û xetayên min bi xwe û tiştên wekî din, problemên wekî din ku me eleqedar dikin tîn bîra min, ez pir li ber dikevim û dêşim. Bîra min tu carî nasekine. Min pir aciz dike. Gava ez dinivîsim ev tişt nayên bîra min. Bîra min êdî nafûre. Weke sedemeke bingehîn ez dikarim bêjim ku

ez ji bo vê dinivîsim. Lê pê ve girêdayî faktorên din jî hene. Ez dixwazim ku ev ziman xurt bibe, ez dixwazim ku kurd serbest bibin, ez dixwazim ku kurd êdî rihet bibin, ji bo vana jî ez dinivîsim.

Ji bo şexsê xwe ez bibêjim ez dinivîsim ji bo ku ez ji "bîr" bikim, hemû neyînîyên xwe yên şexsî û yên civaka xwe. Gava ku ez dinivîsim ez xwe ji bîr dikim ev jî min rihet dike. Lê li aliyê din, ji ber ku ez dinivîsim "bîr" a min kûrtir û xurtir dibe; û îcar gava ku ez ji ser nivîsê radibim ji ber ku bîra min kûrtir û xurtir bûye û ji ber ku ez bûme xwedî "bîr" eke kûrtir û xurtir îcar ez bêtir diêsim. Lê di bingeha xwe de ji bo ku min ji bîr bikira min dinivîsî, lê encam "bîr" eke hîn çalaktir û erjengtir e. Ez dikim û nakim ez ji bîr nakim.

W-Dema janyayê dixwînim, yekser teqandin tê bîra min. Wekî teqandina pêdiviyekê yan jî tiştê herî qedirgiran em dikarin mînak "yadê, gotina ewilîn a zarokan" bidin, bo teqandina eşqê "efara evînê", bo teqandina ol û mezheban "şeytan şehîd ketiye" "zava Xwedê, berbû Hz. Îsa, Hz. Mihemed", bo teqandina hal û rewşan "birayên min wisa xweşik mirin hûn bibînin hûn ê ji kêfan bimirin" bidin. Ev teqîn an jî ev meqamên teqînê; benderên çî ne?

R. J.- Jixwe ev hinekî benderên wê bîrê ne, weke "şehîdketina şeytên" û hwd hêma... Dema ku "Janya" derket berî niha bi deh salan bû, carinan tê bîra min ez dibêjim dema ew derket gelo alternatîfên wê tune bûn wê cihê xwe girt? Lê na, îroj ligel ku alternatîf pir in jî "Janya" pirtir tê xwendin. Janya weke pirtûkeke serkeftî, weke fênomenekê cih ji xwe re çêkir ev do jî wiha bû îroj jî wiha ye. Deh sal berê hinek tişt bi gotinên sivik bi nîqurçdanên sist nedibûn, a rast îroj jî ev wiha ye. Weke "şehîdketina şeytên". A niha jî divê mirov carinan "kufir" bibe. Dema ku mirov kufir nebe, "teşqe" yeke pir mezin dernexe hinek kes bi ser xwe ve nayên. Tu zorê nediyê, tu peyvê neteqînî, tu kurdî ranekî ser tapanê nabe. Hingî em di xeweke wiha genî de ne, ji bo ku mirov hişyar bibe û hişek pê re çêbibe divê peyv biteqîn. Gava ku em li Foucault di-

nihêrin çî dibêje? Foucault, hiş û zanîne tîne li asta peyvê disekîne. Peyvek te hebe tu dikarî bifikirî, peyvê te hebe tu dikarî pê hişyar bibî. Mecbûr bû ku peyv biteqîya, firtoneyek derketa, yekî/ê tiştên gelekî ecêb û bi derb bigota, tehrîkbûyî bûya û tehrîk bikira.

Me berê jî gotibû, divê helbest "dirb" e tiştê nedê, divê „derb“ be. Helbest û hêma ne "dirb" e, "derb" e. Ew tiştên ku tu dibêji jî ew derb in. Divê derbek lê biketa. Jixwe kesê ku „Janya“ nivîsandibû jî derb xwaribû; bi awayekî sosyolojîk, psikolojîk derb xwaribû, civaka ku jê hatibû, sistema ku di nav de bû gişan derb lê xistibû. Wexta ku tu van gişan dixî ser hev mecbûr e ku tu jî derbekê daweshîne.

Min jî bi navê „Janya“ yê derbek daweshand. Wê derbê bi sedan kesên ku ew jî derban biavêjin afirand, zarokên bi navê „Janya“ yê welidand, ez wê çaxê dibêjim ku ev derb vala neçû, vê derbê cihê xwe girt. „Janya“ derbeke mirinê bû.

W-Di Janyayê de jixwe ji navê beşan jî diyar e daqulî kul, êş û janan bûyî. Dema te kul û êş û janên xwe û yên civaka xwe deşîfre kirin gelo te hîç fedî kir?

R.J.- Ez tiştê bibêjim, min fedî bikira min berhemeke weke "Di tuwaletê de" nedinivîsand. Ji ber ku navê wê jî argo ye, navê wê jî falso ye, navê wê jî absurd e. Heke tu yê wê jekariyê bikî û tu yê hinek tiştan di xwe de veşêrî, ev dibe ku birînen te bin, ev dibe ku fikrên te bin, ev tişt tune ye. Tu yê derkevî her tiştî eşkere bibêji û bikî, wêje ev e, ne „kayîn“ kirin e. Lixwemukirhatinek e jixwe. Tew di helbestê de tu carî ez wî tiştî nakim. Helbesta serkeftî ew helbest e ku mirov çiqas „jîdil“ ew nivîsiye. Jixwe ne wisa be hêmayeke baş a helbestê, karaktereke baş a helbestê dernakeve. Tu mecbûr î ku tu hinekî serbest bî.

Carinan tiştên wisa bi me hemû nivîskaran re çêdibin, gava tu û kaxiz bi tenê dimînin mirov li tiştên gelekî ecêb difikire. Wê çaxê mirov ditirse. Dibe ku ev trajediyek be, dibe ku ev bobelatên mezin bin, mirov naxwaze li

wan bifikire. Tu naxwazî ku wan binivîsî. Piştî demekê ez fêr bûm ku her tiştê ku tê nivîsîn ne mecbûr e ku biweşe. Lê berê berê divê nivîskar hewl bide ku binivîse, dibe ku ew tişt ecêb bin, xeternak bin, eyb bin, sûc bin, guneh bin... Divê nivîskar wan binivîse bê ka wê jê çi derkeve, bê ka wê li ser kaxiz çi jê xuya bibe.

Em ji civakeke wisa hatine ku me peyvên xwe weke sûret li ser rûpelan nedîtîye, ji ber ku me perwerdehî nedîtibû, hew me peyvên xwe bihîstibûn, me ew „nedîtibûn“. Carinan hinek tişt tîn bîra min, hinek peyvên ku berê min ew qet nenivîsandine, ez derhal kaxizên mezin derdixim li ser wan kaxezan bi tîpên mezin wê peyvê dinivîsim û ez li wan, li wêneyê wan peyvên bi heyranî û bi xemgînî temaşê dikim. Tiştê ku min berê bihîstibû îcar ez “dibînim”. Hinek peyvên me yên ku di quncikan de mayî, yan jî peyvên herêmi, yan jî hinek peyvên din, ên îlegal, ez dibêjim hela ka ez vêya binivîsim bê ev çi ye, çawa xuya dibe, sûretê wê çi ye?

Weke wêjekarê fransî Roland Barthes dibêje ev tîpa “a” yê ji ku derket, yan jî serboriya nivîsê çawa ye? Ji bo min jî wiha ye, dema ku ez hinek peyvên meraq bikim, bi taybetî ez wê peyvê li ser rûpeleke mezin dinivîsim, ez dibêjim hela bê ev peyvê min çi ye. Mesela ji van peyvên ku a niha tîn bîra min ên weke „xwîn“ê û hwd, li ser kaxezekî mezin dinivîsim “xwîn” dinivîsim, “ba” dinivîsim û lê dinihêrim. Ji ber ku me nedît, me bihîst lê me nedît. Sûretê peyvên me jî xweşik in, delal xuya dibin. Wan û hibr û kaxizê li hev dikirin. Yanî ji ber ku nehatibûn bikaranîn, nehatibûn dîtin, piçekî jî niyeta min ji wêje û helbestê ew e ku ez hinek peyvên me yên ku nehatibûn dîtin û me ji malbatê bihîstibûn, ji hevalan bihîstibûn bidim dîtin. Berê ez li wan binihêrim û bi dûre di serî de kurd, ez wan nîşanê dinyayê bidim.

W-Mexzena Xwînê xwe li ser wêne, mekan(otogar, bêrî, mizgeft, bêrî), rojên taybet (îda qurbanê) bajar (bêrî êvarî amed û zivistanî qoser) ava kiriye. Em li gorî van daneyan dikarin bibêjin ku mexzena xwînê bêtir li ser profil û demografiyan xwe ava ki-

riye û ew bi “tehm” û bi “bêhn” jî kiriye ango ev ji hev veçirandiye jî. Ez dixwazim vê bipirsim di helbestê de û nemaze di mexzena xwînê de fikra te ya li ser “di helbestê de karên civaknasî û civatnasî” çi ye?

R.J.-Ji bo qonaxa ku îroj kurd tê de dijîn mecbûr e ku nivîskar hinekî civakparêz be, ji ber ku hêzeke nebaş heye ku dixwaze wê civakê ji kokê de tune bike û biqelîhîne. Koleksiyonan bala te kişandibin, koleksiyonên civaknas in. “Dengbêjekî zimanjêkirî”, “ba û baran bû tîr nebariya çû” “mejî bejî bû”... di konjoktura îroj de mecbûr e tu civakparêz bî, lê bêtir ku tu aliyên xwe yên takekesî bikujî.

Bi rastî bindestiya kurdan min gelekî diêşîne. Ez dizanim ku hinekî enerjîya min a wêjeyî jî ji vê qehra bindestiyê diafire, lê... Êdî bindestî gelekî li pêş e. Berê ne ew qas bû. Gava ku ez derbasî dikanekê dibim û lê peyv û hestên kurdî nabînim, marketeke ku rojname û kovareke kurdî lê nabînim ez pir pê diêşim. Dinya weke ku em tune bin dîzayn bûye, ez dipirsim „heger em tune bin em çawa tîn kuştin?“, ji bo ku mirov bê kuştin divê hebe. Êdî ez di xwe de derdixim ez ê bêtir jî biêşim. Û ez baş dizanim ku perçeyekî ev êşandina min jî ji wê ye ne ji tiştêkî din. Ez 5 salên xwe yên berê û yên îroj didim ber hev, ez dinihêrim ku ez îroj bêtir diêşim û ji lew re jî ez bêtir dişixulim. Heger ji destê min bihata min ê nîrê bindestiya kurdan bi gû biseyanda. Ji ber ku serbestî tiştêkî gelekî xwezayî ye. Mirov hinekî hêsrê serbestiya xwe ye jî. Gava ku tu li dinyayê binihêrî û çavên te jî hinekî mikroskobîk bin hinek tişt te tehl tîn. Tu dibêji “wiha nabe”. Mehdê te li hev dikeve.

Li rewşeke wiha bifikire ku „onbaşî“yên xelkê jî „qral“ê te bêtir xatir dibînin. Ez bi taybetî peyvê “onbaşî” bi kar tînim, ji ber ku di lugata tirkî de jî heye, jixwe jî wê hiyerarşiyê tê. Em serdestên xwe yên ku di pozisyona „onbaşî“yan de ne ji xwe re dikin „qral“. Em mamoste bin û gava ku em çav li onbaşiyekî serdest bikevin, em helbestkar, hunermend, siyasetmedar bin û gava ku em çav li onbaşiyekî serdest dikevin em dev ji „qral“ê xwe yê wekî Mîr Celadet berdidin û em ji bo wan

onbaşiyên em dê, weledê xwe diavêjin. Bifi-kire yekî weke Celadet Bedirxan hebe, xebatên wî yên rewşenbîrî bide aliyekî, yekî weke Celadet ku mîr-prens bû ku karê wî li hev bi-hata wê bibûya qral. Em dev jê berdidin, em wî naxwînin, em diherin xulamtiyê ji onbaşiyên serdestên xwe re dikin ku kes nizane bezê bin guhê bavê wî ji ku ye. Dev ji peykerê wî berde dev ji wir de û wê de berde û me gişan dê weledê xwe avêtiye me daye dû onbaşiyên serdest. Ev xezebek e. Di dema ku kes nikaribû nêzikî Nietzsche bibûya Celadet ew şîrove dikir, xebatên wî yên gramêrê, sazîrîna ala kurdan, Xoybûn, zanîna 6-7 zimanên biyanî, prenstiya wî... Me dev ji gişan berdaye me daye pey onbaşiyên serdest. Ev çawa tişt e, çawa dê mehdê mirovî li hev nekeve? Em çawa ew qas erzan bûn? Em çawa ew qas hatin kirêtkirin? Ev çi mesele ye? Divê ev giş ji hev bê veçirîn. Mecbûr e ku nivîskarê kurd vê mîsyonê bilîze. Divê vana derxe. Heger hewce bike bipeyve, hewce bike kufir bibe, hewce bike sixêfan bike. Çi hewce bike divê wê bike. Divê mîsyona xwe, mîsyona ku lê hatiye fesilandin, li her derê dinyayê rewşenbîrê kurd wê mîsyonê bilîze.

W-Di pêşgotina Mexzena Xwînê de tê gotin ku "heta ji min hat min nehişt qalib, teknîk, teşe, tîma û ehenga kevn a kurdî ya bi zimanên din tevî vê berhemê nebe". Baş e, lê em lê dinîhêrin ku di hemû koleksiyonan de cih, war, dem, demsal, bêhn, tehm, şibandî hene. Di nûbûna ku te dixwest de, cih an jî rola 22 qalibên esasî çi ye?

R. J- Min bi « Mexzena Xwînê » xwest ku ez tiştekî ji helbestê wêdetir çêbikim. Min xwest ku ez û kurd di qada navneteweyî de li ser piştê wê karibin kaban biavêjin; ji lew re di warê formê de weke « nivîşt » min bi her her koleksiyonekê ve, nasnameya wê, tehma wê, cihê wê û agirê wê diyar kirin, min rengên wê kişf kirin û heta ku kezêba min bipe-rite min pîfî « çirûsk »ên wê kir. Ji lew re di warê harmoniyê de min peyvên weke "mejî-bejî", « bask-birûsk » « fêrik-fîrik », « behr » û « jehr »ê li hev banandin. Ji lew re di warê temayê de min temayên weke « tuwalet » û « sergoyan » hilbijartin. Ji lew re di warê ve-

gotinê de min ji « xwîn »ê « mexzen »ek çêkir û « Mexzena Xwînê » kir « mehînek » û got, « li nav pirêzeyên beriyê tu mehîneke xweşik î, dîn û şîn....», ji lew re min «Mexzena Xwînê» kir «bîrek» û min got, «di binê bîreke birîndar û bêbinî de tu kes nikare bi qasî te xweşik bigirî û binale jî», lê peyveke klasîk heye, tê gotin "di binê rojê de tiştekî nû tune ye".

W- Dema mirov li Mexzena Xwînê dinîhêre, mirov dikare bibêje ku teatral-helbest e ku 22 perdeyên wê hene?

R. J.- Erê dikare bê gotin. Girêdaneke wan a organîk heye. Hevdu temam dikin. Wêneyek ji wan çêdibe. Wêneyekî ku ji benderên çavekî afirî. Tiştê ku ji çavekî tî der, ji çavên helbestkêr. Jixwe wênesaz Ehmed Ronîar wêneyê wan çêkiribû, di yek wêneyî de hemû wêne bi hev ve girêdabûn.

W- Te di hevpeyvînekê de gotibû ku "ji bo ku camên şikestî dîsa karibin bi kêr werin divê cam hûr hûrî bibin, bibin mîna xweliyê" em ji vir jî dagerin ser "aşên êşan". Di vir de ez vê bipirsim, pêşniyaza te ya der barê heyat û edebiyatê de qeraşî û qeşartina êşan e?

Divê «aş» «êş»an bihêrin, hûrik hûrikî bikin. Meseleya min a cincoqan jî ji wêya hanê dihat, camên şikestî û parçebûyî, em bibêjin ku goştê te şikest, te dît ew hinekî termînolojîya helbestê ye, em bibêjin ku xewna te derizî û her wiha, gava ku tiştên wiha şikestin tu yê çi bikî, tu yê wan çawa bicebirinî? Şikestin heye divê em vê qebûl bikin. Weke welat em şikestî ne. Di maneya neyînî de ez nabêjim, ev eşkere ye, Kurdistan şikestî ye. kesayetên kurd şikestî ne, em şikestine. Evîndariya kurd şikestî ye. Malbata kurd şikestî ye. Weke qewmekî ji bo ku tu tiştekî pêk bînî divê pênasayek hebe. "Erê em şikestî ne". Ez dibêjim qey kes zû bi zû wê li hemberî wêya hanê dernekeve, her kes wê bipejirîne ku em şikestî ne. Tiştê ku hat şikestin û pê ve, ka îcar wê çawa çêbibe? Ji bo ku tu karibî wê çêbikî, divê tam çêbibe, ez qala çêbûneke tam dikim, ji bo ku çêbibe divê ew tişt hûr hûrî bibe. Bibe ax, bibe arvan, ji bo ku dûre tu karibî bistrêyî. Ew tişt ku hûrik hûrikî bû, şikest û şikest û şikest... Yanî heta niha yê min ez bi xwe, li ser navê

xwe bibêjim, ez li ber şikestinên xwe dikevim lê ez ew qas zêde poşman nebûme; lê belê ez dişikê û dixwazim ku bêtir bişikê, ji ber ku çiqas bişikê wê ew qas malzemeyên strandinê ji te re çêbibe. Em bi koka camê dizanin hûr hûrî ye, binyada camê ji qûmê ye. Kurd jî ji bo ku serbest bibin, bi giştî ji bo ku şexs serbest bibe û ava bibe divê heta ji destê wî/ê tê xwe ji şikestinan re veke û bihêle ku perçeperçe bibe. Divê xwe perçeperçe bike, bişikê û hey bişikê. Dûre ew ê karibe xwe ava bike. Yanî ji bo avabûneke baş heta dawiyê şikestin.

W - Te di hevpeyvîneke xwe de diyar kiriye ku "Mirov dikare çirûskîzmê wisa diyar bike, bi kurtî di tariyê de hêmaya roniyê û di roniyê de hêmaya tariyê ye. Aliyên wê yên neyînî hatine erênîkirin, ji bo ku azad bibe çavkaniyên pêwîst jê re hatine pêşkêşkirin an jî wê bixwe ev çavkanî peyde kiriye, qonaxa civakîbûnê derbas kiriye û bi awayekî gelekî cihê xwe ferdî kiriye (xwe wekî takekes destnîşan dike)". Îcar ez werim ser pirsên xwe. Çima di tariyê de li roniyê û di roniyê de jî li ser tariyê daqûl dibe? Aliyên wê yên neyînî çi bûn û bi çi û çawa hatine erênîkirin? Mebest ji çavkaniyên pêwîst çi ye? Bo çi yekser qonaxa civakîbûnê derbas dike/dişewitîne û xwe ferdî dike?

R.J.- Berê em bibêjin ku pêvajoya çirûskîzmê berdewam e, ji ber ku ji bo ekoleke hunerî-felsefî çend sal ne tiştek in. Armanca me jî çirûskîzmê ev e, ekoleke felsefîk û hunerî; ne bi tenê felsefe an jî huner, her du bi hev re. Di dinyayê de mînak wiha ne, ekol an ramanî an jî hunerî ne. Ji bo ku mirov karibe baştir fehm bike em mînaka surrealîzmê bidin; surrealîzm aliyê xwe yê hunerî heye lê aliyê xwe yê felsefîk tune ye. Helbesta surrealîst, wêneya surrealîst, şanoya surrealîst heye, helbest, wêne, şano ev giş lewnên hunerê ne, lê xebatên xwe yên felsefîk tune ne. Ekola Frankfurtê aliyên xwe yên felsefîk, sosyolojîk û hwd hene lê îcar aliyê xwe yê hunerî tune ye. Lê me di çirûskîzmê de xwest ku em her du rehan (rêyan) bigihînin hev. Em huner û ramanê bi hev ve girêbidin, yekê bêtir ya din nehesibînin. Helbest, wêne an jî şanoya çirûskîst helbet wê hebe, heye, lê li aliyê din struktura wê

ya felsefe, sosyolojî û hwd jî heye û çêdike.

Çirûskîzm, «bîr»ek e, «krîz»ek e, «agir»ek e. Ji çand û dîroka kurdan ne dûr e. Çirûskîzm, xwe jî «agir»ê xwe ava dike ku ne dûrî tiştên kurdî ye û jixwe nikaribû dûr bûya jî.

Meseleya teferûata tarî û roniyê wiha ye; ev ji prensîbên dualîst cudatir, dikare ji têgeha «yên din»ê bê hesibandin. Heger tu li Afrîqayê mirovekî spî bî, tu yê «yê din» bî, tu yê biêşî. Em dibêjin divê ew neêşe. Divê xatirê wî hebe. Divê hebûna wî qebûl bibe. Heger îcar tu yekî reş derbasî Ewropa yan jî Skandinavyayê bikî heman rewş îcar ji bo «yê reş» derbas dibe, ew li wir dibe «yê din» Ev teferûata tarî û roniyê ji bo ramanan, ji bo bawerîyan, ji bo zayendan tevan dikare weke pîvan qebûl bibe, ev teferûateke "yên din" e. Di felsefeya çirûskîst de ev bi tenê hûrgiliyek e.

W- «Di tuwaletê de» Xwekuj li ser trajediya xizanî û feodalîzmê ava bûye, Girîvan li ser trajediyeke evînî ava bûye, Bixwexweşanî li ser trajediya bindestbûna gelekî ava bûye, Fikirdar li ser "pêgirtin"ê ava bûye ku ev jî trajediyeke şexsî ye û ji ber nelihevîkirina civakê ava bûye. Dema em li daxuyanîyên çirûskîzmê dinîhêrin, em dibînin ku çirûskîzmê xwe li ser şerpezebûn, pêgirtin, bêcihûwarbûn, qirkirin û bindestbûnê, krîzan ava kiriye. Bi tarîfeke kurt, di çirûskîzmê de trajediya kurdan li ku dilûse?

R.J.-Trajediya kurd li ser «agir»ê çirûskîst dilûse. Divê ji têgeha êgir hem wateya erênî û hem jî wateya neyînî bê fehmîkirin.

Di meseleya çirûskîzmê de tiştê herî zêde serê min diêşîne ev e; mesela gelek kes, bindest-serdest ferq nake, di binhişînê xwe de vê hevokê dermale dike, "Ev bindestê dera hanê, çawa rabûye û karekî wiha ku aydî serdestan e dikare bike?". Ez gelekî bi vê binhişînê rûbirû mame. «Çawa yekî bindest dikare qala ekolekê bike». Ango li gorî wan jî bo ku min karibûya qala ekoleke hunerî-ramanî bikira, divê ez jî «serdest» bûma, divê ez jî neteweke serdest bihatima. Belê, ez bindestekî dera hanê me, û ez qala ekolekê dikim, minet

û serdestiya her kesî li dera hanê. Ji bo ku mirov qala ekolekê bike nabe ku mirov serdest be, mirov mirov be bes e. Hinekî bawerî, em jî dikarin azad bibin, ji bo Xwedê! Hinekî bawerî...

Li gorî serdestan û li gorî bindestan jî ez pir ji ser xwe çûme. Ji ber ku hem serdestan û hem jî bindestan ji bîr kiriye ku bindest jî „mirov“ in...

Mirov li her derê mirov e. Weke ku Marx dibêje «tiştê ku aydî mirov be ez ne biyaniyî wan im». Em qala „Madame Bovary“ û Flaubert bikin. Dema ku em bala xwe didin „Madame Bovary“ yê û pêvajoya wê, em dibînin ku çawa Flaubert weke dînan xebitiye, çawa nivîsiye û ew nivîs xeritandiye û ew nivîs weke kêrê tûj kiriye. Dûre ez pê hesiyam ku ji bo kurdî jî heman tişt dikare bibe, ji bo hemû xebatên kurdî. Mirov bindestekî dera hanê be jî dikare vê yekê bike. Flaubert ne bi fransî lê bi kurdî binivîsiya jî ji ber xebata xwe wê „Madame Bovary“ ek çêbikira. Gelek kes bindestên dera hanê ne. Divê vêya hanê jî em zanibin. Mesela Goya bindestek bû li Spanyayê, Hegel bindestek bu li Almanyayê di dema Napoléon de. Dema ku ez li pêşeroj û paşerojê dinihêrim ez vêya ji xwe re nakim kompleks. Gelek bindestên min jî hebûn, ez xwe di vê demê de teng nehêlim. Pers jî bindestê Medan bûn û ji bo ku cil û bergên kurdan li xwe bikin bi ser hev de direilîn. Divê em di demê de xwe kuştî nehêlin. Hay ji me heye ku wê hema tim wiha be.

Min dixwest ku di warê çîrûskîzmê de hêma çî ye, wêne çî ye û hwd. pirsên din ji min bihatana pirsîn, la nayê pirsîn. Li Rojhilata Navîn ji ber ku xebatên ekolî kêman jî tune ne, her kes weke modela ku li Rojhilatê heyî û pir meseleyê weke meseleya şêx û murîdan şîrove dike. Mirov bi van diêşe.

Em bîn li ser krîzê bisekinin. Gava ku em bala xwe didin xebatên hunerî, wêjeyî tev piştî krîzan derketine. Em bînin bîra xwe bê di navbera her du herban de çî bû û çî nebû. Di warê ekolên ramanî de, ekola Frankfûrtê, ekola Analê, strukturalîzm, egzîstansiyalîzm... Di warê ekolên hunerî de ekolên



dadîzm, surrealîzm, ekspresyonîzm, konstruksiyonîzm... Îroj kesên ku em wan dişopînin tegez berhemdarê wan krîzan in.

Ê min ez naxwazin dinya ew qas rihet be, dinya ew qas baş be. Çima? Ji ber ku derdekî min heye, ji ber ku ez bindest im. Tu bala xwe bide psîkolojiya kesên ku halên wan xweş, civakên halên wan xweş, kesên halên wan xweş naxwazin ku pêl biavêje û pel bilive. Naxwazin, ji ber ku ji wan re her tişt baş e. Ji bo kurdan her tişt ne baş e. Dîsa jî divê teql hebin, divê derb hebin. Heke ji me re jî hinek tişt li hev bihatina me yê jî bigota erê rast e divê krîz tune be. Îroj ji me re naserife. Heta ku ji min bê ez ê pifî vî agirî bikim, gur bikim. Ez ji viya re tehamul nakim, ev tiştêkî nayê tehamulkirin e. Bi giştî em bibêjin ku ev têkoşîna kurdan, azadiya kurdan, azadîxwaziya kurdan giş ji ber vê ye.

Kes kesî nexapîne, gava ku em li diyalektîkên din dinihêrin, em dibînin ku kesî kes ramedaye qulan, kesî kes veneşartîye. Wiha zû bi zû kes kesî nikare tune bike. Tiştêkî wisa tune ye. Em dîsa bîn li ser bîran bisekinin, em ê tim ji bîran bifûrin. Vê dawiyê bîrên Botaşê jî derketin. Hay ji wan hebû ku bîra kurdan bî-

reke hedimî bû. Em jê fûriyan. Ji bîrên Botaşê jî em ê bifûrin. Yanî wê kes nikaribe me bixwe û hezm bike. Bi kayînekê re em ê ji devê wan derkevin. Ev wiha ye.

W- Em rewşa karakterên “Di tuwaletê de” piçekî veçîrînin wê tabloyeke wisa derkeve holê. Xwekuj xwe li ser kîrê xwe kiriye(seks), Girîvan ji bo mîrê xwe digirî (bivê nevê bê-riya hembêza wî kiriye), Bixwexweşanî ji bo seksa bi Girîvan re dikeve xeyalan (seks) û Fikirdar jî ji serî heta binî nebe jî li ser evîne diponije. Gelo em dikarin bibêjin ku „Di tuwaletê de” mehrûmbûna hemû karakteran ya bingeîn seks û pevşabûn e?

R.J.- Na, ya herî hindik seks an jî zayendî ye, tu dizanî çawa? Ez mecbûr bûm ku ez zayendê bixim pirtûkê ji ber ku pirtûk ji serî heta dawiyê li ser tundiye disekinî û tundî bê zayendî nabe, jixwe zayendî bi xwe tundî ye. Karakterê ku weke herî yê bi ser zayendiyê de direile „Bixwexweşanî” xuya bike jî di wî de jî zayendî hindik e. Jixwe di karakterên bi navê Xwekuj, Girîvan û Fikirdar de ne zayendî, têgehên din hene. Di esasê xwe de tiştê ji Bixwexweşanî an jî ji binhîşîna wî derdikeve ne zayendî ye „qesasî” û „êşkence” ye, ji ber ku wan di lêpîrsîneke hov de mejiyê rojnamegerêkî belav kiriye û ew qesasî di bi-xwe-xweşanîna wî de deşîfre dibe.

Lê rast e, hemû karakter bi lewnekî orgazm dibin; bi ramanê, bi girî, bi (xwe)kuştin, bi êşkencekirin û hwd; lê orgazm û seks ne heman tişt in. Bi xwe di wê berhemê de demên gelekî krîtîk û bi « krîz » tîn vegotin. Jixwe ji wê pirtûkê ji armancan armancek jê jî zeftkirina demên „orgazmî” ne. Lê divê em hinek tiştan tevlihev nekin.

Jixwe di pirtûkê de, xerabî, tundî, zayendî, ensest, êşkence, kuştin, xwekuştin, argo, sixêf, mehdxelandin û hwd. têgehên neyînî tune bûna ji pirtûkê wêneyekî lihevkişî wê nikaribûya derketa. Têgehên bi hev ve movikîrî mecbûr bûn giş xelek bi xelek li dû hev rêz bibûna, yan na wê pirtûk, pirtûkeke qop û pînekîrî bimaya.

Di pirtûkê de orgazm heye, Arîstoteles jî,

Platon jî ji bo ramanê qala xweşiyê (orgazmê) dikan. „Hez” a Epîkurî heye. Ev nikare bê înkarkirin. Lê ne mecbûr e ku ev xweşî-orgazm weke zayendiyê bê hesibandin. Di wir de raman jî hezeke-zewqeke wê ya orgazmê heye. Gava tu ramanê baş derdixî, tu fikreke baş derdixî ev derdikeve holê. Ango ev demên krîtîk, demên krîzî demên çirûskîst in jixwe.

Di girtîgehê de serê yekî tê perçekirin, mejiyê wî tê rijandin. Ew wî gelekî diêşînin. Yanî li yekî pir tehde tê kirin. Weke mînak ev ji aliyan aliyekî pirtûkê yê civakî ye. Mesela çima di tuwaletê de? Tuwalet warekî « hez » ê-zewqê ye, çûna tuwaletê jî, « rîtin » jî orgazmek e.

Em bîrên ser karakterê « Xwekuj » û hevoka wî ya bi jêkirina penîsê wî dest pê dike. Ew tişt « falûs » e. « Falûs » a ku ji Grekîyan ku derbasî psîkanalîzê bûye, di bingeha xwe de « xwestin »ê, « vîndarî »yê sembolîze dike. Di Grekî de peyva falûsê tê wateya penîsê. Lê falûsa ku di disîplîna psîkanalîzê de tê bikaranîn ne tenê ew tişt e ku ew zayendî ye. Ew daxwaza mirovî ye.

Mêrik yanî karakterê Xwekuj ji ber ku trajedyeyeke wisa jiyaye, ji ber ku çewtiyeke wisa mezin kiriye dixwaze xwe ji hezên-zewqên xwe yê dînyayê, ji falûsê bêpar bike. Ango divê ew tiştêkî wiha bike, di xwe de xwestinê îptal bike, daxwazan biqurmîçîne. Ev jî kuştina « mîrtî »ya wî ye angî jêkirina falûsa xwe (kîrê xwe), ji ber ku destavêtiye xwişka xwe ancax wiha dikare xwe ceza bike. Di vir de mêrik dixwaze falûsa xwe jê bike, ji ber ku qebahetekî wisa mezin kiriye, ancax bi jêkirina falûsa xwe dikare wê keferatê bide. Di wir de falûs bi tenê sembolek e. Jêkirina penîs sembol e. Divê mirov vê yekê weke falûsê fehî bike. Yanî xwe ji her tiştî bêpar hiştin. Di wir de kuştina falûsê heye. Freûd û Lacan li ser falûsê gelekî sekinîne. Falûs daxwaz e, falûs hez (zewq) e, falûs raman e, falûs derxistina ramanê ye, falûs xwarin e, kuştin e, çûna tuwaletê ye, girî ye...

W- Di « Ji şevê re-çend têgehên hanê » de hûn dibêjin ku “ji bo nivîsîna helbestê kişwera

herî îdeal û guncaw civakên bindest in” wekî civaka kurdan. Ya din jî dîsa hûn dibêjin ku bo helbestê peyvên rast “xebat” û “çêkirin” e û hûn cih didin jêwergiranên mîna “helbest karê endezyarî û matematîkê” ye. Gelo em kurd bi peyvên sereke, bi hevokên basît, bi fikrên yektebeqeyî, bi sêwirandinên klîşebûyî û bi muzîka “delîlo”yî em ê çawa helbestan binivîsin?

R.J.- Ew jî kulturek e. Divê mirov ji kultura xwe hinekî bistîne lê divê mirov ji hinekan re jî bibêje bisekine. Heger ji çanda me jî be tiştekî wê yê çewt hebe divê mirov wê bisekinîne. Yanî bi zimanê gel mirov bibêje “hopppp!”. Mesela ji bo sempozyûma Ehmedê Xanî Martin Van Brunessen hatibû Amedê digot “bi helbestên Ehmedê Xanî hatine lîstin”. Kê pê listiyê? Yekî wek Celadet Bedirxan pê listiyê! Mêrik çima wiha dibêje, angî çima bi destê Celadet Bedirxan Ehmedê Xanî dike? Ji ber ku nasyonalîzma ku di Ehmedê Xanî de heye, divê tune bûya, ew tişt gava ku Celadet « Hawar » derdixist lê zêde kirine. Angî divê patenta wê ji Ewropayê bûya. Mêrik Ehmedê Xanî bi destê Celadet Bedirxan dike. Celadet ne zarok e. Wê çaxê divê em bibêjin hoppp bisekine! Ew qas jî nabe. Tu bi destê kê kê didî kuştin?

Mîn di pîrsa din de qala Celadet û rewşenbîriya wî kir, Celadet ne zarok e bi qasî ku bi deqên klasîk bilîze, ji bo ku mirov bi deqên klasîk nelîze nabe ku mirov ji Ewropayê be. Ev Oryantalîzmeke çawa ye?

Jixwe dema ku tu li tevehîya « Mem û Zîn »ê dinihêrî, bi giştî ew ruh tê de heye. Ruheki nasyonal tê de heye. Ehmedê Xanî jî wê xezebê nivîsandiye jixwe. Tu yê vê metnê jê derxî, yê din jê derxî, nosyonalîzm di temamiya berhemê de heye. Gava cejneke hebe ew cejn Newroz e, Newroz cejneke nasyonal e, ne cejn tenê berhemê giş bi vî awayî ye... Di vir de wê çaxê divê em bibêjin hopp bisekine! Ew qas pêş de nerin, temam hinek tiştên me kêmin, ez nabêjim ne kêmin. Mirov ew qas jî najo ser.

Çawa me ji hinek tiştên çanda xwe re û ji kesên ku heqaret li me dikir re got tu li vir bi-

sekine, ji bo helbestê jî em ê ji helbestkarê nebaş re bibêjin bisekine.

Temam çanda mirov girîng e lê mirov ne mecbûr e ku her tiştê çanda xwe qebûl bike, çanda me „bindestî” ji xwe re kiriye çand, ma divê mirov vê çandê qebûl bike? Divê mirov xwe ji hinek tiştên çandî-civakî yê kirêt îptal bike, ji hinek tiştên klîşe, ji hinek tiştên ku jirêzê, ji hinek tiştên ku tu tişteke ji wan dernakevin, bi dûr bikeve. Hinek tiştên ku ne alav û argumanên vê rewşenbîriyê û nivîskariyê ne. Tu yê xwe ji wan kesan bikişînî. Dibe ku hinekî tehl be jî divê tu xwe bikişînî tenêtiyê, taritiyê, ji bo avakirina helbesteke ronî.

Çima ji bo helbestê xaka herî guncaw Kurdistan e? Helbestek bi çi tê nivîsandin? Ew krîzên ku em qala wan dikin, ew êşên ku em qala wan dikin çi ne? Gula herî baş li ser sergoyan şîn tê.

Hinek kes derdikevin dibêjin ku “helbesta me bi çarpîkan diçe”, çarpîkên çi, halê çi? Ez ji bo xwe jixwe qebûl nakim tew ji bo helbestkarekî weke Feqiyê Teyran ez ê çawa qebûl bikim? Feqiyê Teyran ma bi çarpîkan diçe? Nikarim vana qebûl bikim, ev nayên qebûlkirin, kesên ku wiha dibêjin ew bi xwe bi çarpîkan diçin. Li vî erdî tradisyona me ya wêjeyî jî heye. Ji ber ku êşên me jî hene. Di siyasetê de, di sîstemê de çawa Amerîka hêzeke super be, ev erd jî di warê helbestê de super e. Helbesta kurdî pir bi pêşketî ye. Ji ber ku ev erd di warê helbestê de gelekî bi bereket e. Ji ber ku potansiyela wê ya êşê heye. Ji ber ku “do” li Amarayê mejiyek perçe bû, ev erd jî bo helbestê bi bereket e. Ji ber ku kolan dikin biteqin, ji ber ku li vir hest heye, dil heye, ev helbest baş e.

Ji ber ku armanceke me heye, teşqeleyeke me heye, daxwaz, xewn û xeyalên me hene. Ji bo wiha ev erdekî baş e. Erdekî avî ye, bi adan e. Helbestkarê kurd ji ber ku şîrîkê van êşan e, bi wan êşan hesiyaye, divê xwe gelekî bi şans bihesibîne. Ev erd zû bi zû bi destê helbestkaran nakeve, li her derê peyda nabe.

W- Di “Ji şevê re-çend têgehên hanê” de tu gelekî diajoyî ser bindestî û serdestiyê. Gelo

di meseleya bindestî û serdestiyê de divê pêşiyê em li “dest”î nepirsin? Yanî çawa ku dibêjin binê sifirê û ser sifirê. Em jî dest wekî “sifir”ê bikar bînin û wekî krîter destnîşan bikin. Ji bo dest tu nabêjî çi, di wateya krîtera serdest û bindestiyê de?

R.J.- Di vir de “dest”, “serbestî” ye, ji serbestiyê bi berjortir serdestî û jê bi berjêrtir bindestî ye.

Armanca kurdan divê ne ew be ku xwe bişibînin serdestên xwe û bibin ji wan, jixwe ji ber wê dilbijandina serdestiyê gelek kurdan xwe bi destê xwe asîmîle kir. Armanca jî têkoşîn û şerê kurdan divê ne serdestî be, divê serbestî (azadî) be, ji ber ku serdestî jî û bindestî jî jehr e. Lê em qebûl bikin, qebûl nekin jî şerek her tim di navbera bindest û serdestan de heye. Min bi vê dizanibû, min dizanibû ku di şeran an jî herban de leheng jî derdikevin, tirsonek jî; min dizanibû ku di herban de bînamûs jî derdikevin mîrxas jî; min dizanibû ku di herban de berjewend jî derdikevin fedekar jî; min dizanibû ku di herban de pêûsên stewr jî derdikevin, pêûsên ducanî jî; min dizanibû ku di herban de nivîskarên kirêkirî jî derdikevin û yên heta dawiyê bixwebawer û azadîxwaz jî; min dizanibû, lê min nizanibû ku di van herban de ji ber van tiştan wê ji qehran kezêba helbestkaran di devê wan re derketa, min nizanibû...

W- Te serê xwe gelekî bi bindestiyê re êşandiye. Vê mîrata bindestiyê ma qey tu avantajên wê tune ne?

R.J.- Avantaja wê, helbestên baş in. Avantaja wê « armanc » e. Gava ku tu sibehê zû radibî edî armancake te ya xurt heye. Çi ye ev armanc? « Serbestî ». Serbestî ne têgeheke ew qas sivik e. Ê me armanceke me heye. Hegel jî dibêje, “kesê serdest bi qasî yê bindest di jiyanê de tu wate ji wî re tune ye, dixwe, vedixwe, tu armanceke wî tune ye. » Lê yê bindest mecbûr e ku bişixule. Divê xwe bigihîne qonaxeke baş. Ji bo serdestan jiyan rûtîn e, lê ji bo bindestan ev ne wisa ye. Armanc... Armanca azadiyê, avantajên wê ev in, jixwe dezavantajên wê jî pir in.

W-Yanî mesela dema ku mirov bindest be, mafê xweşasîkirin û xeletkirinê ji me re nabe tecrubeyek jî. Ji ber ku bindest çiqas xelet tevbigerê jî tiştekî wî nake.

R.J.- Erê ma çawa! Jixwe filozof jî dibêjin. Meseleya “windakirina zincîran” . Ji zincîrên zingarî pê ve tu tiştekî ku em wî nake bikin tune ye. Jixwe tu ketî yî, tu êşiyayî û riziya yî, tiştekî ku tu jê bitirsî tune ye. Yanî mirovekî ku heta qirîkê pê de çûbe, te dît hinek jê dibêjin heta çongê, hinek jê dibêjin heta navê, hinek dibêjin heta qirîkê. Mirov li çongê be belkî bitirse û bibêje ku ez heta navê pê de nerim, li navê be belkî bitirse û bibêje ku ez heta qirîkê pê de nerim. Jixwe bindestî çûna heta qirîkê ye.

W- Gelo Rênas Jiyan hê jî helbestan dinivîse?

R.J.- Erê ez helbestan dinivîsim. Lê tu dizanî çawa? Carekê ji Ehmed Huseynî hatiye pirsîn “ma tu helbestan nanivîsî?” gotiye ku “ez nikarim binivîsim”. Lê ji bo min ne wisa ye, ez qala endezyariya (muhendîsiya) helbestê dikim, ez dibêjim ku îlham-henase di helbestê de tune ye. Ez kengî bixwazim ez dikarim helbestê binivîsim. Bila kes ji min hêviya vê peyvê neke “ez nikarim helbestê binivîsim”. Heta ku ez ji xwînê û ji goşt bim ez ê karibim binivîsim. Te helbest baş şopandibe, te dabe dû peyvekê, xewên şevan li te herimîbin temam e. Ê min ez her dem, li her cihî dikarim helbestê binivîsim. Ji bo min ferq nake. Ji bo min tiştê zor ne ku ez ê nikaribim helbestê binivîsim; tiştê zor ez nexwazim helbestê binivîsim ez karibim nenivîsim an na?

PORTRE

Fewzî BÎLGE

Destê min tenê li deriyê dilê te dixê
 Serhildanên serjêbûyî rengên min tev sor kirine
 Xezaleke spehî ji çeka xwe pêv bi tu kesî re ranezaye
 Li peravên xeyalên xwe bi ramûsanên ji xwe re welatek ava kiriye

Ez wênesazekî şet
 Li dû serhildanên serjêbûyî
 Bi dû şopa delaliya te ketime
 Çirûskên çavên te yên kesk mirarkî ji sihî bihurîne
 Xeyalên te utopîk ên min spartakusekî qelender bi xaçê ve çarmîx bûne

Ez wênesazekî kêrnehatî
 Di fona wêneyê te de min welatê te newênandîye
 Li min bibihure
 Di rûyê te yê rojhilat de çav li ava ne
 Şara te ya kesrewan û deqdeqî de firçeya min gurrî bûye
 Dest bişkê, firçe ji min bimîne, tenê rûyê te diwêne

William Shakespeare; bi listikên xwe yên trajîk û komîk ve, bi 154 soneyên xwe yên dijwar û bilind ve, ku sînemdeftera evînê ne, bi çendek helbestên xwe yên dirêj ve, firehtirîn gerdûna zimanê Îngilîzî û *dikhejê* dikên şanoya cîhanê. Em ê payîzê, di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê *Hemû Soneyên William Shakespeare* de, dûr û dirêj qala şert û mercên serdema Shakespeare yên civakî, wêjeyî, polîtîk, aborî, şanoya wî û helbestkariya wî bikin. Bi tenê, ji niha ve dikarim bibêjim, ku bi vê xebata xwe ya wergerê ya 64'an ve, nêzik e ez xewneke xwe ya nêzikî bîst salan bikim rastî û wekî wergêrekî kurd î belengaz, *golden shot* (derba zêrîn) a xwe ya pêşîn bikim. (A duduyan, *Ulysses* a James Joyce e!) Bi vî awayî jî, mezintirîn şaxa kurdiya me, kurmanciya me ya delal, ew ê pariyekî dergêhen pola yên ku li vî bedewtirîn zimanê cîhanê dadane bişikêne, wê gelek nifş bikaribin tê re derbas bibin, herin ser gencîneyên xwe yên

Ji William Shakespeare

Çend Sone

(Ji translation in progressên salên 1993 – 2009'an)

Werger û amadekirin: Kawa NEMIR

Bahçelîevler – Stenbol

Kawa Nemir

ku yên me bi xwe ne, lê hê me bi xwe ew bi çavên
serê xwe nedîtine.

Li ser bextê van wergerên xwe dikarim wiha
bibêjim: Mezintirîn awata min ew e, bi hezaran
xort û keçên kurd î evîndar, ên ku bi zimanê bav û
kalên xwe ji hev hez bikin, bijîn û li Kurdistanê
xwe ya mezin bimirin, bila ew van gewherên
xweşik li hev bifetilînin. Heke ev werger bikaribin
rê li vê yekê vekin, ez ê bi tenê ji ber vê yekê
bextewar bibim. Bila zarokên Ehmedê Xanî vê
yekê bikin, ez û zehmetkêşên vî zimanî yên dilsoz
dê bizanibin keda me bi avê de neçûye, me heta
niha li avê nekolaye!

Û têbîniyek: Min guhertone van wergerên xwe
cara pêşîn, di havîna sala 1997'an de, di kovara
Jiyana Rewşenê de, wekî dosyeyeke biçûk çap
kirin, ku ew werger ji vê rewşa xwe ya niha gelekî
dûr bûn. (Baş tê bîra min, ji *ehlê şiletê* Yekbûn
Bozarslan, ku wê hingê li Zankoya Stenbolê,
xwendekara Para Dermanasiyê bû, wê hingê hatibû
navenda kovara ku ez gerîndeyê giştî bûm, min
çend nimûne ji Shakespeareê bi kurmancî dabûnê.
Kurd gotinan û kirinan ji bîr dikan, ji ber vê yekê jî,
ez ê bi berdewamî ji binê piyê xwe bi axivim, heta
ku ya heq û helal zelal bibe!) Paşê, pak nayê bîra
min, bawer im sala 2004'an bû, çend sone tevî
çend stranên ji listikine Shakespeare di hejmareke
kovara *Tîrojê* de derçûn. Jê û pê de, min ev
wergerên xwe careke din çap nekirin, heta ku
dawiya sala par ez rastî Pinarê hatim, wê piştî
demeke dirêj kir, ku ez vegerim ser soneyên
Shakespeare yên nivcomayî û heta payizê wan
hemû sêwirandinên wergerê yên li ser kaxizên zer
mayî kuta bikim. Lewma jî, min dil heye vê xebata
mezin diyarî wê bikim. Heke qiyametê ranebe...

18 Adar 2009

Sone 12

Gava ku di jimêrim katên ku demê dibêjin,
Dibînim noqî şeva sik dibe roja cilgeş;
Gava dibînim binefş ji pîrtiyê derdbêj in,
Zîvaviya spî digire ser hemû biskên reş;
Gava ku dibînim darên bilind, mane tazî,
Berê stara kerîpezan bûn li ber germê
Û mîrgên havînê giş dirûtine gurgurzî,
Rî spî, gij, li erebeyê bar in berî sermê,
Hingê bedewiya te didim ber pirsîyaran,
Tê, tê jî bihedimî bi kavlên demê re,
Lew delal û bedew, didin ser riya diyaran,
Dimirin bi dîtina geşedana yên din re;

Tiştê li ber kêlendiya Demê xwe ranagire

Ji tov pê ve, xwe dikuje, gava bi te digire.

Sone 14

Ne ku ji stêrkan darazên xwe diçinim, ne;
Stêrkenasî be, cila xwe'j avê derdixim,
Lê ne berbêjê bextê çê an jî neçê me, ne,
Di bobelat, xelayan, an jî werzan dernaxim;
Nikarim bibêjim wê xêlekê şûn de çi be,
Para kê be birûsk, baran, ba, naşêm nîşan dim,
Bibêjim bê bextê mîrzayan çê be, çê nebe,
Li sêla esmanî bibînim jî pîrr tiştan tim:
Lê hew ji çavên te dadirêjim zanîna xwe,
Ji wan bircên zexm, digirim hunereke wisa
Rastî û rindî tê de pêk ve didin geşa xwe,
Qet û birra xwe yek kî, çêkî zareke wisa;

An na der heqê te de ev e berbêjiya min:

Mirî, wê rastî û rindî bimire, bi ya min.

Sone 15

Ku hizir dikim her tiştê werar dibe çawa
Kêliyeke kin geş e mîna emrê gûlikê,

Cîhan ji dikekê û pê ve ne tiştek e, wa,
 Li wê stêrk bi hêza xef dikin giliyekê;
 Dibînim mirov mîna riwekan mezin dibin,
 Ev esmanê stêrkgir xweş dike, geş dike wan,
 Bi şîrêza xwe fortan dikin, pê re dikevin,
 Kes bi bîr nayne dewrana şikûdariya wan;
 Hingê fikara vê cîhana bêwefa pê re
 Tîne ber çavên min wê rewşa xortaniya te,
 Ku Dema rûxîner şer dike bi Rizînê re,
 Bike şeva kaltiyê, roja xortaniya te;
 Di ber evîna te bi Demê re her şer dikim,
 Ew çendî ji te bibe, ew çend te bi ber dikim.

Sone 16

Lê ji çi re riyeke hêzdartir peyda nakî
 Da şer bikî li gel vê Dema xwîndar î zordest?
 Ji çi re ranabî rizîna xwe nakî baqî
 Bi rêne pîroztir, lê' b helbesta min a bêhest?
 Tu niha li ser lûtkeya katên bextewar î,
 Gelek baxên dûşîze yî hê kes neketî de
 Kulîlkên te yên geş didin bi pakviyanbarî,
 Ji qelpê te yê qelpezan bêtir ew in wek te.
 Wiha, bes jiyan e rast dike xetên jiyanê,
 Ne pênuşa Demê, ne xameya min a xama,
 Nikare nîrxê navxwe, rindiya tê xuyanê,
 Te, di çavên mirovan de bijîne, dibe ma?
 Ku hebûna xwe şabaş bikî, tu yê her hebî,
 Bijî tu bi xeta hunera xwe, bê par nebî.

Sone 17

Ku roj bê, dê kî bawer bike bi helbesta min,
 Heke mişt bibe bi bilindtirîn payeyên te?
 Her Xwedê zane dimîne gorekê besta min,
 Jîna te tê de, nîşan nade nîvê layên te.
 Heke bo rindiya çavên te bibim nivîskar,
 Hemû zerîfîyên te bijimêrim bê westan,
 Roj bê, dê bibêjin, 'Viran dike ev helbestkar;
 Xwedê rûyên fanî nepelandine çu wextan.'
 Dê bi belgeyên min ên bi demê re zer bibin
 Qayîl nebin, wekî virên kalên zimandirêj,
 Şêtiya min bin, dê heqê te ji xwe re bibin,
 Dê bibêjin, ev çi straneke kevn î pîrbêj.
 Lê ku zarokekî te bigihîje wan rojan,
 Bi wî û helbesta min, tê bijiyî du caran.

Sone 19

Heylê Dema Dehaq, te bivê, pencên şêr ko bik,
 Te bivê, cîhan bixwe çêlikê xwe yê şêrîn;

Te bivê, qîlên tûj ji çena pilingê har rak,
 Bi xwîna wî bişewitîne sîmirê dêrîn;
 Bi bayê leza xwe şên û axkêş bikî werzan,
 Çi bikî, bi kêfa xwe yî, heylê Dema şanpaz,
 Cîhanê bik dêran, hemû delalên wê erzan.
 Lê nebî bikî tawana jê re nîn e daraz:
 Medî rindeniya yarê min nîşana katên xwe,
 Bi pênuşa xwe ya dêrîn xetan lê mekişîne;
 Bila her xort bimîne her tu bikî dewrên xwe,
 Da rindiya Mem bo mirovên ku bîn bimîne.
 Hey Dema pîr, ji yek duduyê xwe nemînî jî,
 Yarê min ê bi helbesta min her timî bijî.

Sone 21

Ez das, ew çi ne? Karê'm nîn e bi wan Hozanan,
Hesari'l ber *filikayê* digirin pênuşê,
 Ewr û esmanan wer dikin xeml û xêz, xizanan,
 Her rindê'b rinda xwe dipîvin bi nûzenûzê,
 Beytik in beytan lê dikin, pesnan wer çêdikin,
 Bi ro û heyvê, bi gewherên erd û deryayê,
 Bi kulîlkên avrêlê, tiştên nadir, kurt û kin,
 Ku dipêçin hewayê ve bihuştê dinyayê.
 Lo ez dildarê dilsoz, bi dilsozî dinûsim,
 Bi min bawer bikin, hezkiriyê min bedew e
 Wekî zarê her dayikê, nebe jî bi zimzim
 Mîna qendilên zêr î li esmên, hema ew e.
 Bila wer gotegotên xwe bikin, tişt nabe, wey!
 Pesn çu ne karê min e; ez ê bifiroşim qey?

Sone 22

Awêneya min nikare min qaneh bike pîr im,
 Hingî xortî û tu, çêlkewên hêlînekê ne;
 Lê li qermîçekên Demê dayî te dinêrim,
 Hingê çavên min li mirinê, hewarekê ne:
 Hingî hemû rindiya ku te dinixumîne
 Ne tişt e ji bilî cilê dilê min ê şayan,
 Hingî dilê di singê te de ye, dilê min e,
 Ça' dibe ji te pîrtir bim, qey dibe eva han?
 Lew lo delalo, hişyar bî, nebî bibî kalo,
 Nabînî ez ça' ne ez im, ku li te nenêrim?
 Dilê te landika min e, dê kil bikim halo,
 Wekî dê pitikê bihêvîşîne'b dilê nerm:
 Nebî bibêjî, "dilê wî bikujim, dê bijim";
 Te ê xwe da min, da ku hîç nedim, bo te bêjim.

Sone 23

Wekî lîstikvanekî naşî yê'l ser sehneyê,
 Ku ji ber tîrsa xwe rola xwe tevî hev bike,

An jî yekî şet î hêçketî, bi zefî neyê,
 Mîrata zor û hêza wî dilê wî mehf bike;
 Ez jî, ji tîrsa dudiliya xwe, ji bîr dikim
 Bibêjim kelmên ayîna evînê yên saz,
 Li ber zora evîna xwe naşêm debar bikim,
 Duta ji barê hêza evîna xwe ya awirbaz.
 Lo nexwe bila pirtûkên min bibin rewanbêj
 Û berbêjên dilikê min ê dengbêj ên bêdeng,
 Bila doza evînê bikin, bibin dermanbêj,
 Bêtirî zarê ku peyivî jî, wînda kir ceng:
 Lo *îqra*, bê çi nivîsiye evîna bêdeng;
 Bi çavan bihîstin; raza evînê ye ev reng.

Sone 24

Çavên min bûn nîgarkêş, rahiştin bi zêr kêşan
 Nexşê rindiya te' l kevala vî dilê dergeh;
 Gewdeyê min çarçove bo vê berhema pirşan,
 Bi hunera baştirîn nîgarkêşî bû bergeh,
 Da bi vî nîgarkêşî bibînî çi ye huner
 Bi wêneyê rûyê xwe yê yekrû nîgarkirî,
 Hilawîstî ye di kargeha singê min de her,
 Pencereyên wî' b çavên te geş dikin agirî.
 Binêr çavan çi çakî ji hev çinîn, dan çavan:
 Çavên min kêşan şeweyê te, ên te ji min re
 Bûn pencereyên dilikê min, tê re tava han
 Bi şadî ditele, ji wir de li te binêre.
 Çavên fêlbaz bivên ji hunera xwe şox bikin,
 Çi bibînin, hew wê çêdikin ew, dil nas nakin.

Sone 25

Bila yên ku sahibrewac in, bi xeml û xêzan,
 Bi text û tacan, nîşanên fêzan fortan bikin,
 Bext textekî wiha nedabe jî min ê xizan,
 Şad im bi şanên pê re min şadê şadan dikin,
 Perîmîr vedidîn perên pelên xwe yên bedew,
 Lê wax gidî, wekî mexmorkan in li ber tavê,
 Di wan de wer xef dimîne kawiya wan û hew,
 Te dî rû tirş kirin, mirêsa wan çû ji navê.
 Şervanê zor î navdar î di şêr de pêşikêş,
 Ku piştî hezar serkeftinan te dî bû Şemo,
 Navê wî' jî sinemdeftera rûmetê dikin rêş,
 Ji keda wî çi mabe, tê jibîrkirin hemû.
 Nexwe şad im min ê ku evand, hatim evandin,
 Bi war, bê war, ne diqedim, ne jî tîm qedandin.

Sone 26

Serwerê evîna min, va bûm bende ji te re,
 Xûypakiya te kir hişkeçin erkdariya min,

Vê reşbelekê dişînim, qasid e ji te re,
 Nîşana erka min, ne nîşana jîriya min:
 Wisa berz e erk, jîriya mîna ya min ê jar
 Dibe raneke bar, peyv negihên wê viyanê.
 Lê ew pakiya te ya berz bide min ê hejar,
 Hêvîdar im, bi hizra giyanî, yeka hanê,
 Da ew kîjan stêrk be rêbera bextê min be,
 Destî li ser piştê min be, bo min bibe heval,
 Bo evîna min a qîş û qelaş wergirtin be,
 Min nîşan bide hêjayî rêza wan a delal:
 Hingê biwêrim fortan bikim ji evîna te,
 Ta hingê ez ê xwe vedizim ji azmûna te.

Sone 27

Ji kar westiyayî, dilezînim nivînê xwe,
 Ew e bo laşê' jî rê mandî, xweşkoşka vîsanê;
 Lê wê hingê bîra rêwî dide ser riya xwe,
 Karê lês safî dibe, hiş dikeve bilanê:
 Lew hingê hizrên min ên dûrî nîşîniya min
 Divên ber bi te bibin hecî bi coş û peroş,
 Palikên min ên xayîs wer vekirî digirin,
 Li tariyê kîp, mîna kil û koran dibin doş:
 Baş e çavê aşopî yê bi giyanê min ve
 Sîtava te berçavî çavê min ê kor dike,
 Mîna gewherekî dardayî bi şeva hov ve,
 Şeva tarî dinikîne, rûyê wê nûr dike.
 Lo, ji ber wê, bi roj laşê min, bi şev hişê min,
 Heywax, tu aram nabin, ne ji te, ne jî ji min.

Sone 28

Ka çawa dikarim vegeirim bi rewşa dilgeş,
 Ku bê par mabim ji sûda bêhnvedanê, çawa,
 Girtibe roj tepeser kiribe vê şeva reş,
 Şevê roj, rojê şev, hev bindest kiribin wiha,
 Her yekê, mîna dijminên dirr rik kutabin hev,
 Lê li ser şikenceya min bazar yek kiribin,
 Yek gazinan bike, ya din kar bike reverev,
 Kêferat bikim jî, çawa dûr nebim, yarê min?
 Bo dilê rojê xweş bikim, dibêjim, yar geş e,
 Ew e çira, dema ewr tarî dikin esmanan;
 Şelafiya şeva erdesmer dikim wer xweş e,
 Dibêjim, stêrkên geş reş bin, yar e şevsaman:
 Lê roj bi roj janên min hê dirêjtir dike roj,
 Şev şev bi şev kovana min xurt dike, dibe doj.

Sone 29

Rûreş nebim li ba Bext, bidî çavên mirovan?!
 Tikîtenê digirîm li ser zebûniya xwe,
 Partaf dike esmanê kerr bi giriyên hovan,

Dibim gumgumok, nifiran dikim li jiya xwe,
Xweziya xwe bi kesê hêvîdewlemend tînim,
Zarî wî dikim, xwezî dostên min jî hebûna,
Dibêjim, mîna vî hunermend, mîna wî jîr bim,
Dibêjim lê, ku ev daxwazên min jar nebûna;
Hêşt, bi van hizrên ku dîkin min rûreş bikin,
Te dî ketî hizra min tevî rewşa ne tu rewş,
Hizir dibe zîrzîrka berbangê, tîşk geş dîkin
Erdê zîz, lawîjan li esmanan dîkin direwş:

Yada heza te dewlemendiyeke wer tîne,
Bibêjin, ha textên keyan, dibêjim, ew kî ne.

Çar sal berê min bi awayekî rêkûpêk dest bi
nivîsandina romana xwe ya ewil, *Nameyek Ji Xwedê Re*, kir. Berî wê demê bi salekê jî hewldanên
min ên netekûz ku ez digevizandim çêbûn.

Weke ku ji nav û tevna wê ve jî dê xuya bibe, min
jî wek yek ji sedemên nivîsandinê vegotina tiştên
di hîna xwe de nehatine gotin didît. Piştî têbinîki-
rina ku ez ê cardin vegerim vê babetê, min divê
derbibim ku di dawîya pêvajoyeke behirandinî,
bi qasî du salan, de pirtûka ku min dixwest pêk
bînim û bi tîrahiya rengên ku min tê dan were
xwendin, bi encam û xelas bû. Û bi dû de jî pirsên
nivîsandin û xwendinê bi şideke boş ez mijûl
kirim. Lê awa û cureyê xwendinê li ba xwende-
van e, her çiqas gelek caran şîroveya wî û mebesta
nivîsevên li hevdu neguncin jî. Di wêjeya kurdî
de jî gelş û pirsgerêka mezin ji vir dest pê dikir, ev
jî piştî demekê diyarî bala min bû.

Her çiqas ez ne dilxwazekî dabeşkirinên tûj

JI WEŞANXANEYA LÎSÊ 6 PIRTÛKÊN NÛ



MIRIYÊ HERAM
Buvê Nazê



MÎŞEXTÎ
Adil Zozani



DENGÊ XWÎNÊ
Têmûrê Neffî



ÇILKÊN PÊNCSE
Dîlawer Zeraq



DEQÊN QESAS
Lal Laleq



ZAREMYA
Îrfan Amîda



Koop. Mah. 4. Aşkoyunlu Sokak
Fevai Apt. No: 1 / 1 Yanışehir - Diyarbakır
tel-fax: 0 412 228 97 76
wesnenlis@yahoo.com

Di neynika pirtûkê de

Yunus EROGLU

bim jî, hin riyên ku şopa xwe xurtir dîkin û bi ser xetekê de -nemaze- dibanin li bala min dilikumin. Hin pirtûk hene bextê wan çê ye. Nivîskar û xwendevan bêpirsgirêk digihîjin hevdu. Awayê xwendin û asta xwendekariya wan çî dibe bila bibe, ji aliyê piraniya xwînerên xwe ve tîen ecibandin û weke pirtûkeke “xweş” miradê xwendekar û nivîskarê xwe dîkin. Wateyên cuda û dîtir ne xem in, zewqa ku ji wan tê stendin xwîneran par par nake. Bi gumana min her nivîskarek li gel ên bi dilê xwe û tenê ji bo qîmanîna xwe, dixwaze ku bi kêmanî berhemeke wî ya xweş jî hebe.

Hin pirtûk jî hene ew bi serê xwe xwendineke ariziyî xwe pêwîst dîkin. Û dema ku vî awayê xwendin û têgihiştina xwe bi dest naxin bi serê xwe dimînin. Gelek berhemên bi serê xwe û serfiraz hene. Evana jî xwendevanan dineqînin. Ên ku van berheman li aliyekî dihêlin jî rojekê rêzê ji wan re digirin û yên ku dişên bi awayê xwendina wan herin jê re dibêjin pirtûkeke “baş”. Ne “xweş” bin jî, hostehiyeke wan î bilind heye. Ma pirtûkên “baş” ne “xweş” in jî qey? Carina kêfa mirovan zêde ji wan re nayê. Jixwe ya ku nivîskar li hêviyê ye jî ne ev e, gelek caran. Ew jî dilê xwe rihet dike. Weke ku tê gotin, hunereke bilind kêf û zewqê jî ji nav lingan derdixe li bilindahiyên asê dilîsîne. Ax ew berhemên mezin... erê di cîhana wêjeyê de nimûneyên ku xweşiya xwe ji başiya xwe girtine ne hindik in. Em jî wan re jî bibêjin berhemên “mezin” gelo?

Berhemeke ku bi xwendevanê kurd hem baş hem jî xweş tê û mezinahiya xwe ji ta û rengên estetîk û kalîteya van hêmanan digirin ku xwendevanê/a me hem pê hijmetkar dibe û hem jî kêfa wî/ê jê re tê heye gelo? Gelo ev hêman ji nivîskar re çiqas dikarin bibin egerên nivîsandinê û her wiha ji xwendevan re çiqas bûne egerên xwendinê ne? Ez dizanim ku bersiveke jidil ji bo vî pirsîyarê jî nivîskêr re jî ji xwendevan re jî çetin e. Lewra îro di wêjeya kurdî de awayekî din ê xwendinê pêşî li awayê ku nîrxekî radestê van cureyan dike girtiye û serî ji wan stendiye. Ew jî awayê xwendineke zargotinî û zimanzanî ye ku di nav xwîner û nûseran de bi hevbeşî berbelav e.

Dibe ku hûn bi dengekî hêlî ragihînin ku di wêjeya zimanekî ku piraniya xwendevanan jî bo hînbûn an pêşdebirina wî, serwextbûna li nîrx û paşma û kelepûra binaxmayî pirtûkên bi wî zimanî dixwînin de ev tiştekî xwezayî ye; peydebûna reng, dirûşm, dilxwestinî û geryanên folklorîk li gorî armancê ye. A ku min ecêbmayî dihêle, çawa ev weke qeyd û qeydeyekê li dora wêjeyê tê jidandin. A ne xwezayî jî, tevî hemû tiştî, ev çend ew e ku pirtûkek jî zexmbûna aşop û xeyal û derbirîn û hûnaka xwe bêhtir bi nîrxên xwe yê peyvok û hevoksazî û babetên din ên zimanperwerî tê wezinandin. Her ku bendewariyên nûser û xwîner li ser vî babeta ku ka ziman û folklor di berhemê de çawa bi kar hatiye tengav dibe, sêwîr û aşop jî tengav dibe. Bêşik, ger alava wêjeyê ziman be û alaya zimên jî folklor be divê bikaranîna van jî girîng be. Bes ku radoka ziman û zargotinê derî li ser wêjeyeke esasî ya afirîner û gerdûnî dada, divê nivîskar bi hêzeke xurtir bide ser hunera xwe û xwendevan jî pêwîst e karibe ne tenê bijartina peyvekê ji dêvla ya din, giranî an sivikiya zimên an metelokeke di berhemekê de, her wiha vegotin û dîmeneke herî serkeftî jî ji berhemekê bi bîr bîne. Ma ne kelepûra nivîskar jî wê îro-sibê bîra xwendevanan be? Pêwîst e bîra xwendevan bi berhemên nîgaşxurt û jîndar were kûrkirin da ku mafekî wêjeya kurdî li ser siberoja kurdan hebe.

Vêca em di derîkê vî kurtegufta çend awayên xwendinê re derbasî menzela xwe ya nivîsandinê bibin.

Pirtûkeke ku hîna qet nehatiye nivîsandin heye. Li dîwarê menzela nivîskar wiha nivîsî ye. Nivîskarek jî, bi raya min, ne çaxa berhema ku dixwaze were xwendin lê çaxa berhema ku wî dixwest bixwîne dinivîse bi ser dikeve. Di ya xwe ya pêşîn de û di ya di pey re de min ev hîsa “ku hîna nehatiye nivîsandin”ê kir û ji bo ya ku ez ê binivîsim jî ez van hîsan dikim. Ji bo ku ew berhema yekta di heman demê de yeke xweş, baş (ziman û zargotineke tekûz pileya van herduyan radikin, ne ku cureyekî din ava dîkin) be pêwîstî bi aghadarbûna kêmaniya wê berhemê di nava rêz û koman de heye. Ev jî rêz û koma cîhana wê-

jeyê ye. Ji bo vê pêhesînê agahdarbûna ji vê cîhanê û serwestbûna li vê hunerê diyardeyeke herî kartêker e. Loma kêfa min her ji vê gotina Sartre re tê, ku dibêje “Pirtûka min a herî baş a ku ez hîna dinivîsim e.” Hunera vegotinê bi hunera xwendineke bidisiplîn hêzê digire. Wê hingê kuçeyên Dûblînê û kuçeyên Amedê dertên heman meydanê. Wê hingê siya pênuşê nivîskar bi terhekî durist li qermîçekên rûyan, destikên deriyan, giregira li nav hewşan, teperepa lingên li kolanan, dengê fîrfîrka erebeyan a ku yekî di nav ciyên wî yên xwêdandayî de zivêr dike, pencereyên bi peşkên baranê lewitî, toza bi ser darên li ber tirimbeyên bajaran ketî, hoqhoqa kenê zarokan, kêlên li goristanan, kevî û pêlên şolî yên çeman, hevdeyên spî yên bi nav poran ketî, dev û çavên bi xebardan û galgalê dilivlivin, serên ji xeyalan bi hewa ketî, dilên raz û kul veşartî digere, rastiya rast û xeyala bibingeh pevdikevin, jiyana ku tê jiyîn bi nav behra aşopên berhemê dikevin. A rastî, tam ji wê hingê xwendevanên Arjantînî êdî ji zimanê me fehm dikin. Ku ne ew hing be û ne werê be, xwene ew ê xwendevanê kurd rojekê ji kursiya ku pala xwe dayê û berhemê me dixwîne xwe di derekê de bibîne, vê dinya nas û nû bi çavên dil û mêjiyê xwe bibîne? Jixwe, çaxa ku ev yek dît, ne bi awayê ku weke gelek caran di pirtûkekê de ji rûyekî pel rûyê din têderdixe û acis dibe, dê beşdarî vê aferidê bibe. Yan na, berhema ku piştî ku yê ku ew afirandî ji hew dikare bibe xwendekarê wê, belê hew dikare, dê beravêtî û beravçûyî bibe.

Îcar em vegerin pêşiyê, hinekî ji em li ser benê sedema nivîsandinê ya ku min di serî de behs kir bisekinin. Bêşik, nivîskarek pêşî dixwaze tişteki binivîse, dûre ji dixwaze ev tişt biserketî be. Ji bo min jî, vê gotina kurdan pir watedar e: “Heya ku aqilê paşî hat, ê pêşî çû.” Ker zirî, bişkul firî. Hûn bi vî halê derûnî dizanin. Gelek caran tişta ku mirov diviya di hinga wê de bigota, paşê diyarî hişê mirov dibe. Ev hesteke liberketin û keserê ji bi mirov re çêdike. Lewra ew gav, ew kêlî, ew pêl hew vedigere. Jiyan dubareya kêliyên jiyana mirov nade. Heye ku wê derbirîna J. J. Rousseau ku di bîranînên xwe de vedibêje û sedema nivîsandina wan bîranînan “mîkurhatin” dibêje ew ji weke poşmaniya ji wê kêliyê, kula di dil de mayî rave dike, di bîra we de be. Weke hisa poşmanî û sûcdariya Rousseauyî ku hişt ku wê berhema qerase binivîse, ez jî carina ji xwe bi

guman im ku hisên ji pêkneanîn, cegernekirin û negotina tiştan a di wextê de têkelbûyî av birin bizrên min ên nivîsînê. Aqilê pêşî çûbe, bişkul firiya be jî, derfeta nivîsandin, bi nivîsandinê rastkirin, tekûzkirin û geşkirinê dikare me ji hisên me yên çewisîn, bêhnçikîn û dîlgirtinê xelas bike. Pêwîst e nivîskar bipê, sed carî birame û bihise û hîna bibêje. Yan na ku xwesteka hema-vegotinê kete pêşiya xwesteka geşepêdana di huner û şeweyê wê vegotinê, vê carê ya negotî an jî neafirandî çî derfetan dide çî yekan distîne ez dibêm eşkere ye.

Gelo ez ji bûm xwendevanê ya ku min dixwest pêk binim? Min tiştên ku min dixwest bikim û bibêjim hemû bi cih anîn di wê pirtûkê de? Ji van pirsan re bersiveke min î yekser û hevgirtî tune. Xwendekariya pirtûka qedandî ji bo nivîskarekî tişta herî dijar e. Nivîskar gava ku pirtûka ku wî dixwest ku karibûya weke xwendekarekî saf û hayjê tune bixwenda û ji bo afirandina wê gelek dek û dolab û hîle ji tê de gerandin û şarezatiyek ji tê de ye, diqedîne, êdî pêvajoya ku hew dikare bibe xwendevanê pirtûka ku dixwest bixwîne dest pê dike. Vê rewşa jihevqetîn û beravêtina nivîskar a bi berhema wî re ye ku hişt ku Marquez agir bi prova û pêşnûmaya berhema xwe yî herî navdar bixe û şopên xeratî, necarî û hedadiya xwe hinda bike. Lê ev şop her dimînin di serê nivîskêr de. Loma hêviya nivîskar dimîne bi wê yekê ku hinin din wê pirtûkê bixwînin û ji nû ve binivîsin.

Civîna bi xwendevanan re

Roja 11'ê avrêla 2009'an Kovara W bi xwendevanên xwe re civînek li dar xist.

Di civîna bi xwendevanan de gelek pêşniyar, daxwaz û rexneyên balkêş ji edîtorîya Wyê re hatin. Edîtorîya kovarê jî li gorî van rexne, pêşniyar û daxwazan dê tev bigere.

Xalên ku ji aliyê xwendevanan ve hatin diyarkirin:

✓ Di kovarê de divê beşeke bi rengê “FER-HENGOK” hebe da ku lîteratora kovarê jimar bi jimar bê zanîn û gencîneya peyvan ya kovarê

çêbibe.

- ✓ Di derveyê nivîsên wêjeyî, çandî û hunerî de nivîsên li ser rêziman jî hebin dê baştir bibe.
 - ✓ Kovar divê bi tenê li nava xwendekaran belav nebe, divê ku esnaf, karker, karmend û hwd. jî belav bibe.
 - ✓ Nivîskar xwendevanên kovarê ne. Ev ji bo kovarê valahiyeke mezin e, divê ku kovar li girseyê ve bibe.
 - ✓ Her mamoste dikare bibe xwendevan, belavkar û nivîskarê kovarê. Divê ku kovar xwe teqez bigihîne mamosteyên kurd.
 - ✓ Kovar kovara zaravayê kurmançî bi tenê nîn e. Divê ku bi zaravayên din jî (wekî kirmanckî, kurmançiya jêrîn û wd.) nivîs, pexşan, helbest û wd. hebin.
 - ✓ Zimanê kovarê giran e.
 - ✓ Xwendevanên ciwan kêr in, divê li ser bê sekinandin da ku xwendevanên ciwan zêdetir bibin.
 - ✓ Divê beşek ji bo (rûpelek du rûpel) nivîskarên ciwan bê veqetandin. Wekî beşa amatorî be, tê de berhemên wan bîr weşandin û jê cesaret bigirin.
 - ✓ Mijarên dosyeyan hin jê ne baldar in, hin jê ne mijarên kovarê ne, hin jê jî gelek baş in.
 - ✓ Hinek mijar zêde têkildarî wêjeyê nîn in lê di sa wekî dosye tên weşandin. Ev ne rast e. Êzîdîtî, koçer ne mijarên wêjeyî ne lê we weşand ne rast e.
 - ✓ Divê ku jin jî bibe mijara dosyeyê. Mesela wêjevanên jin, yên dirokî bibin mijara dosyeyan baş dibe.
 - ✓ Divê ku hin berhemên alim û seydayên oldar jî tê de cî bigirin. Ji aliyê olî ve jî kovar mijaran bigire dest baş dibe.
 - ✓ Nivîsên girtîgehan bîr weşandin baş dibe. Bala girtîgehan li ser Wyê ye. Divê W bi baldartir nêzikê girtîgehan bibe.
 - ✓ Di kovarê de heman nivîskar hene, ev ne rast e.
 - ✓ Ji bo wêneyan beşek bê veqetandin.
 - ✓ Rûpela rexneyê hebe baş dibe.
 - ✓ Hejmar bûye 25 ev ji bo Wyê serkeftinek e û hêvî ew e ku her domdar be. W bûye şop, rûniştîye ji xwe re rîyek di nav qada kurdî de vekirîye.
 - ✓ Dosyeya 'Edebiyata Zarokan' bê amadekirin dê baş be.
- Wekî edîtor û amadekarên Kovara Wyê em ê li ser van rexne û pêşniyar û daxwazan baldar bin û heta ku ji me bê em ê Kovara W bi rêkûpêktir û baştir bimeşînin û hêviya me ew e ku bi hêzdayîna xwendevanan dê Kovara W xurtir û her domdar be.
- Lê çend xalên ku divê em bibersivînin hene. Ji ber ku em kovareke wêjeyî, çandî û hunerî ne û konseptên naverokê jî diyar e em ê cî nedin hinek tiştan. Wek ferhengok, rêziman û xebatên bi vî rengî... Lewre ev ne li gor konseptên me ne. Bi taybetî jî ferheng divê di kovareke bi vî rengî de tune be. Gelek ferheng di piyasayê de hene xwendevan dikarin ji wan sûde werbigirin. Ya din, her çî qas em giraniyê bidin wêjeyê jî kovar di heman demê de kovareke çandî û hunerî ye jî. Ji ber vê yekê em carina jî cî didin dosyeyên çandî û hunerî jî. Ev ne li derveyê konseptên me ne.
- Ji bo giraniya zimanê kovarê jî em dikarin wiha bibêjin; nivîs û dosyeyên ku em bi xwe amade dikin heta ji me bê em bi zimanekî hêsan amade dikin. Lê em nikarin zêde dest bidin nivîsên nivîskaran. Bi bawerîya me ku xwendevan hinekî zêdetir dema xwe ji xwendin û nivîsandina kurdî re veqetînin dê ev pîrsgirêk jî ji holê rabin.
- Heta ji me tê em cî didin wêjeya me ya klasîk. Lê rasterast dayîna mijarên olî ne karê me ye û ne li gor konseptên kovarê ye. Ji ber vê yekê ku nivîs wêjeyî, çandî û hunerî nebin em cî nadin wan. Lê di berhemên wêjeyî û çandî de em cihêkariya 'olî' yan ne 'olî' nakin.